



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

Kovara Dumehane
Sal: 6 Hejmar - 31
Adar - Avrêl 2010

Xwedî û Berpirsiyariya Nivîsaran
Mehmet Aydın ALÖKMEN

Edîtoriya û Redaksiyon
Serwet DENİZ - Elîxan LORAN

*Ji bo redaksiyonê spas ji bo
Semra OZBEY û Omer FİDAN*

Mîzanpaj û Berg:
Enstîtuya Kurdî ya Amedê

Wêneyê Berga Pêşîn
Nauras Sadiq Aad

Şewirmendê Hîqûqê
M. Nuri DENİZ

Çapxane: Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan
Kalem Sk. No: 32 / 4 Huzurevleri
Kayapınar/DIYARBAKIR
Tel & Faks: (0412) 237 43 16

E-Mail
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB: www.kovaraw.com

ISSN: 1309-1476

Şertên Abonetiyê
Nava Welat, salek: 30 TL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Banqe & Nimroya Hesabê IBANê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakır

TL: TR190006400000183002114889

EURO: TR420006400000283000737070

USD: TR520006400000283000737084

Nimroya Hesabê PTT'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
590 24 36

- Ji edîtor / 2
- Dylan Thomas, *Amadekar*: **Kawa NEMIR** / 3
- Pirseke bi êş e her jînenîgarî - **Berken BEREH** / 6
- Meydana kûçikan - **İsmail HACANÎ** / 7
- ? - **Janbijan AR** / 9
- Giyanek ji beybûnan - **Bilind MIHEMED** / 10
- Hivdeh - **Mem BAWER** / 11
- Dûrî - **Dilşer BÊWAR** / 11
- Rexnegiriya wêjeyê - **Adar JIYAN** / 12
- Praga Kafka - **Munewer AZÎZOGLU** / 14
- Ji deftera serihildanê- **Hesen SILÊVANÎ** / 16
- Nêz hatiye - **Sîpan XIZAN** / 21
- Sirûda stranan a Silêman - Pirtûka Pîroz; Tewrat / 22
- Nan nan nan - **Migirdîç MARGOSYAN** / 27
- Dawiya temenê defterê - **Cihan ROJ** / 31
- Dolên Ristemî - **Xecê OMERÎ** / 33
- Diwaneke avangard - **Fewzi BÎLGE** / 34
- Kolan û kalan, Mehabad - **Şengul OGUR** / 35
- Dosye: Romana Kurdî -II-
- Nîfşê bêjî, qeyikên romana kurmancî di nav pêlên siyasetê de - **Helim YÛSIV** / 37
- Çend dîmenên reşbîn / çend dilopên ji romanûsiya min / pirdengiya hewldanekê - **Yaqob TILERMENÎ** / 46
- Roman navê guhertinê ye - **Medenî FERHO** / 49
- Ber bi romana kurdî ve - **Hesenê DERWÊŞ** / 57
- Muzexaneyê kulan û vegotina banî - **Yunus EROGLU** / 61
- Çiroka zarokî - **Charles DICKENS** / 66
- Kevoka bi toq - **Cemil KAVÛKÇU** / 69
- Lîngûîstîk - **Hilde DOMIN** / 70
- Ji zilamekî mirî re - **Carl SANDBURG** / 70
- Hîrê birayî û sayerê - **İsmail GUVEN** / 71
- Têkiliyên helbest û felsefeyê - **Kamran Simo HEDİLÎ** / 74
- Rondikên qerisî - **Mistefa TÛNCYUZLU** / 77
- De rabe - **Omer FİDAN** / 79
- Xêz - **Ahmet BÎLGE** / 80

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin, li xwediyên wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji edîtor

Di vê heyama ku ji bo me kurdan êdî dişibe qiyaman de filozofê frenewî Mîchel Foucault dibêje ku “Desthilatdariya modern destgîrkirina mezin e.” Ji serê avrêla sala borî û heta vê gavê, destgîrkirina *dergîstiyên azadiyê* niqteyeke reş e li ser rûyê *açilimciyan* ku tenî li ber vê niqteyê ne tiştek e jî!

Wêje û siyaseta *dizên* neqebekê ne. Ji ber vê hindê jî Kovara W kovareke çandî, hunerî, wêjeyî be jî, em wek *altaxên* wêjeya kurdî, di heman katê de û di hemû lat û felatan de, hevalbendên siyaseta ku divê kosteka xwe ya bi kurdî biqetîne û bi zar û zimanê bav û kalan pîkolyê bike nin. Wêje xebateke mîkroîst e bo civaka kurd. Bo nimûne, kravêta gardiyanê girtîgehê, biriqîna bota fermanbarekî, çoyê mamosteyê dibistanê *-heta ku mamosteyekî/e dibistanê di darsa xwe de qala Wê neke dê dilê peyva kurdî nekeve cih-* ji bo wêjeya kurdî *hedefên* esasî ne, ligel ku girtîgeh û leşkergeh û dibistan *-Desthilatdarî mekanîst bin, kurd û kurdî jî mekapîst in, jixwe Foucault porê xwe li ser van girtîgeh, leşkergeh û dibistanan weşandibû!* - ji bo azadî û serbestiya kurdan *hedefên* siyaseta be jî, di heman katê jî bo wêjeya kurdan hin *hedefên* serbestiyê ne jî. Li ser girtin û destgîrkirina ku di rengê aşîtan de bi ser me kurdan hatin de, divê mirov guhên xwe ji gotinên E. M. Cîoran re bel bikin ku, Cîoran dibêje “Hesreta barbariyê gotina dawîn a şaristaniyan e.”

Di “Roja Zimanê Zikmakî ya Cîhanê de” bi pêşengiya Tevergera Ziman û Perwerdehiya Kurdî (TZPKurdî) me dît ku kurd li gelek navçe û bajaran ji bo zimanê xwe daketin meydana û ligel vê yekê her ku diçe şaxên Kurdî-Deran jî zêde dibin. Ev nûçeyên xêrê ne ku em dizanin “kurdî” dê nekeve ber dest û piyan.

Di hejmara borî de ji ber problemeke teknîkî nivîsa Bavê Nazê ya bi navê “Roman” li ser navê Omer Dewran derketibû. Em ji Bavê Nazê, ji Omer Dewran û ji xwendevanên xwe lêborîna xwe dixwazin

Me hejmara berê jî dabû xuyakirin ku dê “Romana Kurdî” di du dosyeyan de were pêşkêşkirin. Di vê hejmara bihara giyancivîn de em beşa duyemîn pêşkêş dikin. Û dosyeya hejmara bê *-ango hejmara gul û pûşpera 2010'an-* niha didin diyarkirin ku, dosyeya hejmara bê helbeskarê ku ev sî salên qut û gilover in ku nobedariya ala kurdî dike, ango **Arjen Arî** ye. Kesên ku dixwazin beşdarî dosyeyê bibin herî dereng heta **15.Avrêl.2010**’an nivîsa xwe bişînin em ê kêfxweş bibin

Em dixwazin dîsa dubare bikin ku, em her dem di warê dan û stendin, rexne, pêşniyazan de li benda name û peyamên we ne, lê bes deng ji kozika we xwendevanan nayê.

Di vê hejmara nû de em hêvîdar in bi pêngavên 8’ê Adarê jinên ku darên şikestî ne, sax vedin, hil bibin, mirovayetiye li dêtî û mêtîya jin û civakê vegehrînin

Û Newroz e, qanûn û bahoz e. Qewmê agir û xweragir! Newroza we pîroz be

Di hejmara nû de em û gul, em ê bi hev re bibîşkin. Di Gulanê de!...

Dylan Thomas

Ji Îngilîzî werger û amadekar: Kawa NEMIR

Helbestkarê bi eslê xwe ji herêma Galê ya Îngilistanê, ku bi helbesta xwe ya afirandî di navbera pêla Romantik û Nûxwaz de pireke giyanî ya qewîn ava kir, helbestên xwe pîrî caran sparte hêmayên ji xwezayê parzûnandî û di temenekî xort de, tam bi awayekî ku babetî helbestkarekî helbestkar be, ji ber alkolheziya xwe ya ku ketiye ser zar û zimanan, li ciyekî ji welatê xwe dûr û dûredest mir. Di helbestên xwe de, hezkirina ku ji bo bedewî û bizavbariyê, dihevgera kêş û vekêşa seqaya zindî hest dike, peywendiya ku bi şeweyekî razber di navbera jidayikbûn û mirinê de hatiye bestin, bi rîtm û teqlên zindî û geş, bi hêmayên ku mirov matmayî dihêlin û bi peyv û ravekên ku bi xwe darêtiye derbiriye. Ji ber vê çendê, Thomas her çend karibûye pir kêr binivîse jî, bûye yek ji mezintirîn helbestkarên sedsala çuyî.

Navê wî yê tam Dylan Marlais Thomas e. 27'ê Kewçêra sala 1914'an, li Swansea ya herêma Galê ji dayîk bû. Bavê wî mamosteyê îngilîzî bû. Vî helbestkarê ku di demeke ber-

wext de dest bi nivîsandinê kiriye, hê di dibistana navînî de ji bo rojnameya dibistana xwe kar kiriye, nivîs nivîsîne, di şanzdeh saliya xwe de ji dibistan cî bi cî hiştiye. Di pey vê re, ji bo rojnameyekê dest bi peyamnêriyê kiriye û bûye rojnamevan. Di sala 1934'an de, hê di bîst saliya xwe de çûye li Îngilistanê bi cî bûye.

Thomas heman salê yek ji berhemên xwe yên hezkirî, dîwana xwe ya bi navê 18 Poems (18 Helbest) da weşandin. Piştî wê bi sê salan, Caitlin Macnamara nas kir, pê re zewicî, li Laugharneê bi hev re bi mal û hal bûn, ku wî di zewaca xwe de gelek caran bêbextî li wê kir, wê jî bêbextî li wî kir. Di heyna Şerê Cihanê yê Duyemîn de, Thomas bo kurtedemekê li Londonê ma, di televîzyona BBC'yê de, di bernameyên helbestan de helbest xwendin, bi helbestên xwe û awayê xwendina xwe ve gelekî deng veda. Piştî ku şer kuta bû, vegeriya mala xwe, Laugharneê.

Dylan Thomas, wekî helbestkarekî, ji ber destengî û pêsîrtengiya ku ji ber bêperetiyê berdewam lê radibû, çend caran ji bo dayîna konferansên li ser wêjeyê û xwendina helbestan çû Emerîkayê. Cara pêşîn, di bihara sala 1950'yan de çû Emerîkayê. Di pey re, ji ber alkolîzmê tenduristiya wî ya xerab pê re pê re xerabtir lê anî. Di sala 1953'yan de, listika wî ya radyoyê ya bi navê Under Milk Wood (Li Biniya Dehlê) hate weşandin, bi boneya vê yekê çû New Yorkê, piştî çend rojan jî, li otêlê, ji ber alkolê kete halê komayê, ji ber ku kesî di rewşa wî başbaş derne-xist, di 9'ê Sermaweza 1953'yan de, di 39 saliya xwe de mir.

Lêkolîn û lêgerînên laboratiwara Wêjeya Cihanê hê jî der heqê mirina wî de di gumanan de ne, hê jî li pey sedema mirina vî helbestkarê mezin in.



Berhemên wî:

- ✓ 18 Poems (18 Helbest)
- ✓ Fern Hill (Girê Fernê)
- ✓ Under Milk Wood (Li Biniya Dehlê)
- ✓ Collected Poems (Hemû Helbest)

✓ Portrait of the Artist as a Young Dog
(Wênayê Hunermend Wekî Kûçikekî Xort)

✓ Adventures in the Skin Trade and
Other Stories (Serpêhatiyên Çermfiroşiyê
û Kurteçîrokên Din)

Û mirin ê ranebe ser zîn ji vir û wiha

Û mirin ê ranebe ser zîn ji vir û wiha.
Mirovên mirî yên rût, ew ê bibin yek e
Li gel mirovê li ber bê û heyva rojava;
Hestiyên wan bi paqijî derxin, hestiyên paqij tune bin heke,
Li ser enîşk û piyên wan dê stêrk hebin;
Çendî dîn bibin jî, wê hiş hebe li serên wan,
Çendî noqî deryayê bibin jî, ew ê hîlbên dîsan;
Evîn ê wînda nebe, tevî ku evîndar wînda bibin;
Û mirin ê ranebe ser zîn ji vir û wiha.
Û mirin ê ranebe ser zîn ji vir û wiha.
Ewên li jêr gergerokên deryayê
Veketine pal dane, ew ê nemirin fenanî ba;
Ku keziyên goşt jêk bin, bêne badan li kaviliyê,
Bi şirîtan girêdayî bin bi çerxekê ve, ew ê venerêsin;
Baweriya di destên wan de dê bibe du paran,
Û nepakên Hespên Yekstrû dê bidirinin wan;
Parî û piçik bibin jî, ew ê nederizin;
Û mirin ê ranebe ser zîn ji vir û wiha.

Û mirin ê ranebe ser zîn ji vir û wiha.
Qaqlîbaz nema dikarin bibin guhên wan,
An jî pêl nema dikarin bikin qîrç li peravan;
Ciyên ku kulîlk dipijiqandin dê nema bibîşkivin,
Dê serên xwe rakîn ji derbên baranê re ji vir û wiha;
Dîn bûbin jî, tevî ku bi qasî bizmaran mirî bin,
Serên tîpan di nava beybûnan re çakûç dîkin;
Bi zorê vedikin deriyê royê, heya ku ro dihedime,
Û mirin ê ranebe ser zîn ji vir û wiha.

Bi sernermî neçe wê şeva bedewiyê

Bi sernermî neçe wê şeva bedewiyê,
Divê kaltî bişewite û bifişire, ku roj bû tewaw;
Were xezebê, were xezebê li mirina ronahiyê.
Tevî ku zana nas dîkin rast e axirî bigihên tariyê,
Ji ber ku ji gotinên wan çu birûsk neçûne, ew
Bi sernermî naçin wê şeva bedewiyê.
Yên pak, dest cara dawî li ba, bi gazî, çendî bi geşiyê
Reng bû li kendaveke hêşîn bireqisiyana
kirên wan ên jar tev,
Tên xezebê, tên xezebê li mirina ronahiyê.
Yên hov, ku zeft kirin û strandin tava li revê,
Pir dereng hîn bûn, ku şîn girtine li ser riya wê û hew,
Bi sernermî naçin wê şeva bedewiyê.
Yên nexweş î li ber sikratê, ku dibînin bi bîniyaya koraniyê



Çavên kor dikaribûn mîna meteoran biîsiyana, şa bibûna lew,
Tên xezebê, tên xezebê li mirina ronahiyê.
Û tu, bavê mino, yê li wir, li lûtkeya xemgîniyê,
Bextê te me, nîfiran bik, min bixefîrîn bi hêsirên hov.
Bi sernermî neçe wê şeva bedewiyê.
Were xezebê, were xezebê li mirina ronahiyê.

Di şarezatî an jî hunera xwe ya zîz de

Di şarezatî an jî hunera xwe ya zîz de,
Ku tê rahênan di şeva bêdeng, bêhis de,
Bi tenê gava ku heyv diperoşe
Û dildar diçin radizên
Tevî hemû kulên xwe yên di hembêzên xwe de,
Li ber çiraya stranbêj dixebitim,
Ne ji bo berzîxwaziyê an jî nên
An jî ji bo ku fortan û bazirganiya bazbendan
Bikim li ser dikên mahî, na!
Bi tenê ji bo heqdestên dera han
Ên razbartirîn dilan.
Ji bo mirovê pozbilind ê dûrî
Heyva bi coş û peroş nanivîsim van
Li ser van rûpelên ku dibine kefên pêlan,
Ne ji bo miriyên ku kokelekê bilind dikan
Tevî bilbil û lawij û beytên xwe,
Lê dinivîsim ji bo dildarên di hembêzên wan de
Derd û kulên sedsalan,
Ku ne pesnê wê an jî heqdest didin,
Ne ji bayexê didine şarezatî an jî hunera min.



Qeşmerê li heyvê

Dimînin rodaçûna bêdeng a gulpelên
Ji guleke bisêhr hêsirên min;
Û hemû kul û keserên min dikişin
Di derza esman û berfên ku
nayên bibîranîn.
Bi raya min, heke li cîhanê biketama,
Wê bibûya parî û piçik;
Ew çend xembar û şox û şeng e,
Ew çend bi lertzokî mîna xewnekê.

Gelo demek hebû

Gelo demek hebû dansorên rahiştî kemanên xwe
Di sîrkên zarokan de dikaribûn kulên xwe aş bikirana?
Demek hebû dikaribûn li ser pirtûkan bigiriyana,
Lê dem û dewranê kurmikê xwe xiste pey wan.
Ew li jêr kevana esmên di metirsiyê de ne.
Li vê jînê, çi çu carî nayê zanîn, ew e herî ciyê piştrastiyê.
Li jêr bircên esmên, kesên ku milên wan nînin,
Ew in xwediyên paqijtirîn destan, û, tek sawîrê dilkevir
Azarê nabîne, lew mirovê kor dibîne ji her kesî baştir.

Pirseke bi êş e her jînenîgarî

Berken BEREH

xwe li xweşkokiya pêjnên rojane digirt
zanî dê hew bibişire ew stêrka nas li esmên
ma kî ji me nekerixiye, rûye xwe nerûçikandiye
ku wiha bi guregur û şedîd e zeman li bin serê wî

meşiya wextekê bi çelengî û zîrekiya xwe
tovê lixwemikurhatinê reşand li wê daristana hov
li wê şeva dinalî di bin pencên berfê de
ji dil guhdarî strana kêra diteyise kir
bi dara heyatê ve hilawist gula dilê xwe
emrê xwe diyarî axa bê weç kir
maçek jî ji wî robarê dilikume re

çûn sibehên gewrik ewrên min ên bi qedr û qîmet
ew nehvirîna wek kefiyê li ser eniya min
ji xwe dipirsim ji wan wêneyên li dîwarê hişê xwe
li kîjan mizgeftê dişêwirin bekoyên me
li mala kê ketine cizbê dildarên şoreşê?
ey bîranînên diçilmisin di kavilê xwe de
ku pirsek bim li bazara vê heydedanê
ka çi guheriye bibêje ji bilî peyvên me

pirseke bi êş e her jînenîgarî
bi efsûna xwe gêr dibe ji nav polên heyatê

Meydana kûçikan

Îsmâîl HACANÎ

Diyarî ye ji Xwedewendê ez dame diya min û bavê min

Ji gelek mirovan jîrtir bû, wisa hatibû perwerdekirin, diz çend bi hêz be xwe jê nedida paş, gundê wan dizî lê nedihate kirin. Ji ber van saxletan gundiyan rêz lê digirt, hemûyan xwe bi xwedanê wî dizanî, çi mala goşt çêkiribûya para wî dibir ber derê kolkê wî, hemû deman darînkê wî tîji laka germ bû, li dor xarûfka wî tîji hestî bûn. Ka navê Tehlo çendî tehl bû, ew hêj ji navê xwe tehlîr bû. Lê gundiyan ji ber xatira seyê wî Zero rêz lê digirt, gelek caran heger Tehlo xeletiyek kiribûya, digotin hema çi bike, nehê zibarê, dorbir û bê nobe cemê xwe av bide, hemûyî gorî Zero bikin.

Pîştî wê şeva ax sibatê, Zero gurg xenikand di nav kozika berxan de, li hewşa pîrejina bi tenê li binê gundî. Pîrekên gundî rêz girtin ji ber zîrekî û dilsoziya wî, wê salê navên berê xwe yên nêr kirin Zero.

Ew cara heftan bû gundê wan bi tank û firokan hatiye çolkin û kavilkin bi destê hindekên ne ji ax û av û zimanê wan. Lê vê carê gundê wan bi destê hindek ji nîşê wan hate çolkin. Her malek bo xwe bi rîyekê çû. Tehlo jî mala xwe bir bajêr, di xaniyekî bi kirê de, Zero roj bi roj li kêman dida, êdî laka germ nedixwar, pidiyên wî fêr nebibûn somûnên hişk, gava spêdeyê li ber dîwarî dinivîst, zarokên cîranan ber tê wer dikirin. Şîrîn bi her du çavan bo digirî.

Zero xwezî ez û tu her du li ber derê mala xwe miribûna û em neketibûna ber dîwarên xelkê.

Êvarî, gote zîlamê xwe:

Çareyekê li Zero bike û ji pêş çavên min bibe, min nevê ez Zero wisa melûl û pûsîde bibînim, yan na ez ê agir berdim bedena xwe!

Spêdeyê Tehlo zincîrek kir stûyê Zero û bire meydanka kûçikan de bifiroşe. Zero ne wekî hemû kûçikan bû, çu caran ji qesta nedinirî û nedirewî. Lê wî mirovê diz bi çavan di nav hezar mirovan de dinasî. Heta

Tehlo ghişte meydankê devê Zero nekete ser yek. Tehlo di bin lêvan ve got:

Wey babo ma qey mirovekî saxlem di vî bajarî de nîn e, diyare mirovên vî bajarî hemû diz in!

Dengê Zero ket û zincîr di stûyê wî de çû xwarê û şîrikên xwînê pê ve hatin xwarê û hindî dinirî û xwe vedikêşa. Gerdena wî ya spî ji xwînê sor bû, ji mal heta meydankê, bêtir ji deh kesan birîndar kirin. Li meydankê hemû kûçik bê deng bûn û bi ber ve rabûn rêzigirtin, bo hatina wî.

Ji nîşka ve Zero xwe çeng kir efendiyeke û kelbên xwe di hefka wî de birin û çavên wî zîq bûn, heta ji nav destên wî anîne der, nîv mirî bû. Di nav wê quşmê de çend rojnamevan û peyamnêr amade bûn, rûdan ji hemû layan ve wêne kirin. Heta polîsan Tehlo û Zero girtin. Zero çend polis jî birîndar kirin.

Roja paştir çîroka Zero bû manşetê hemû rojnameyan, çendîn peyamên bi lez hatine weşandin sebarek Zero, hind rast û hindî derew. Li ser vê rûdanê televîzyonê mîzgerdek saz kir, çend pisporên şareza di warê derûnî û civaknasiya kûçikan de û nojdarekî veterîner û yek ji komeleya dostên giyaneweran pişikdar bûn di mîzgerdê de. Nojdarê derûnî bo cemawerî gelek nihênî ronî kirin; çinku di wan rojan de gelek gotgot hatin kirin. Hinda digot "Zero seyekî har û dir e", hinda digot "ne wisa ye Zero piştî ji gundî hatiye bajêr yê ji xemên gundê xwe de har bûye". Nojdarê derûnî, xuya kir hiç nexweşîyeke derûnî û fîzîkî li Zero nîn e. Bi tenê nexweşîya wî gelekî dilsoz e, rastîperwer e û xwedanprensîb e, wisa hatiye perwerdekirin, hiç carekê çavên xwe li diziyê û dizekan neniqîne, dizê çend biçûk be Zero bi ser û çavan dinase. Bo zanîn ew mirovên hatine birîndarkirin hemû diz bûn. Dikandarî tişt deh qat difirotin.

Xwendekar di ezmûnan de qopiya dikir,

nojdarî spêdehiya erkê xwe bi dirustî bi cih nedianî û çî pûte bi nexweşan nedikir. Nexweşê pêdivî bi neştergeriyê nebûya jî digotê "divêt zû bêye çarekirin û radikêşa nexweş-xaneyê taybet". Mamoste agahî jî xwendin-gehê nemabû, hindî agahî jî wanên taybet, wan polîsan jî yasa pê şêl kiriye, bexşîş û bertîl werdigirtin, ew zîlamê xwedanê riha, bo rûmetî eniya xwe reşkirî bi navê Xwedê û pîroziyên bilind pere kom kirine, ew jî derket xwedan hotêl û motêl. Ewê tûrê parsê li mile wî, ne pêdivî bû. Ew xanima bi pêçe jî piştî zîlamê xwe, ser gêrî dikirin.



Piştî cemawerî ev rastî hate zanîn bi rêka telefonan, dilsoziya xwe bo Zero diyar kirin û xwastin, pişkinîneka hûr bi-hête kirin, çî sizayên dûr jî yasayê li ser nesepînin. Zero birin dadgehê, dişa hola dadgehê pir bû jî rojnamevan û dostên

Zero. Gundiyên Zero yên kevn bêş kirin, çar parêzerên bi nav û deng girtin bo be-revanîkirinê jî Zero. Du polîsan Zero kêşane di qefesa tawanê de, Zero dişa nirî û xwe çeng kir her du polîsan û birîndar kirin. Cemawerî dest qutan û fitî vedan û gazî kirin "Ew jî diz in, ew jî diz in". Her du polîsan serê xwe şor kir. Dadvanê mezin çakûçek li mêzê da û hêj navê Zero bi dawî neaniye, Zero xwe di ser şifşa re avêt û di qirika dadvanî re girt û gerisand, kêlbên xwe avêtine pistûyê wî û kirasê ya-sayê jî ber kir, ew berda û li ber derî xwe çeng kir daxwazkerê giştî û di çingilê wî re girt û rakêşa, kirasê yasayê jî ber wî jî kir.

Fît fit û çepelqutanê di holê ve deng veda û bi dengê bilind gotin:

Ew jî diz in, ew jî diz in.




7 Berhemen Nû Ji Weşanên Lîsê



Weşanên Lîsê

4. Akkoyunlu Sokak Feza Apt.
No: 1 / 1 Yenîşehîr/DIYARBAKIR

Tel-Faks: + 90 412 228 97 76
wesanenlis@yahoo.com





Janbijan AR

*Min mirin li dîwêr raxistiye
kengî bixwazim dikarim li xwe bikim*

Niha bîranînên xwe yên nexweş ji xwe re dikayêm
bi henaseyeke pelixî li pey hev du rêz dibim
bi teyîsandina êşeke gurî re ewrekî heftê salî
ji dûxana cixareya min a gewr î giran digirî, digirîm
di şevbuhêrkeke kevnedem de
xwekuştinên xwe yên xure fêrî bazara ruh dikim
di her seansê de bi niyeta mirinê xwe vedixwim
di her seansê de di qirika xwe de dimînim
bi ser nakevim
çav berdidim dinê
têk dinalim
seranserê min zexelî
seranserê min xwediyên gunehên vî qewmî
Li dîwêr, dîmeneke ku ji xortaniya bajarê min
û ji rexê xwe yê din pêk hatiye
weke ku hîn nuh weledê xwe yên baş welidandibe disekine
ew weledên ku di pevçûnan de ji xwînê pir hez kirine
nerêsim, ew ê devereke vê dîmenê nîvco bimîne
birêsim, ma ew ê mirina li dîwar xwe li min raxîne

Giyanek ji beybûnan

Bilind MIHEMED

Li benderên serkutkirinê
Dema hewir dihêne pêçan,
Cesteyên agirîn di bin kuçikên
vemirî de diarihin
Di dîdeyên min de tu leylanek î
Û dût ji ronahiyê
Mîna kevokeke rengkirî difirî,
Li kinarên xeribiyê
Vederbûna çiçekan, hişkbûna hezan e
Hewir li ser pencereyan
Şebengên befrê ne
Tu jî newaya darên dûmahîk werz
Di gîtara evînê de bijene
Ajaweya peyvan
Di kêlikên mirinê de
Di gîxên sînorekî bê ser de
Di leylandên elindekê de şoreş e
Stran, bo bajarekî nivistî şoreş e
Qurbanî bo armanceke pîroz şoreş e
Kirnoşkirin di çavên yarê de şoreş e
Bazivîrkên nêrinên te di giyanê min de
Pêjna şevê dike hilm
Germa eşqê dike dûkêl,
Çûçikên daristanê çend dibê fêl in
Di nav ritmên çaxeke semaker de
çend digêl in

Baran li dûmahîya şevê
Xeweke sotî di çavên me yên xewte
de dike xem
Peroşîyeke serjêkirî
dilê min aram nake
Ey eblîsê min ê har
Ey eşqa axlêve
Belgên zeytûnan çend di germ in

Rûkên yara çend bi şerm in
Di fala te de min xwendî ye
Ez dûmahîk zelam im
helbestekê bi te dinivîsim
Dûmahîk werz im
di bihara jiyê te de bilîsim
Di ezel de tu di paxila min de
veşartî bûyî
Sih sal e û di balgehê min de
xewneke neditî bûyî
Ayetekê bi giyanê min
ê nefirok ve ser jê bike
Eşq û baran û jivan
Xwîn û sînor û welat
Parçeyek in ji dastana çavên te
yên ez hemû li ber germava xwe ki-
rime pêkhateke aloz
Jivan û baran û eşq
Welat û sînor û xwîn
Dibine hilm û li biyabana laşê min ê tijî ji te
zêmareke hûr li ser çengên şikestî
yên min dike toz
Di derazînkê bêlêve çimkê
sola te lê daketî
Tu zozanekî befrîn bûyî
Çend ditirsim baran bihêt û tu ya dût
Çend ditirsim

Hivdeh

Mem BAWER

me êşa welatekî neqîşand
li ser zinarên polayî
ji bîr nekin
xwîna ku di rengê hineya destên bûkan de dihat rijandin
mîna şîr û deqên barûdê
li eniya me be dê heta hetayê
yeqîn bikin
lê em ê çawan bawer bikin
ji marên ku kirasê xwe her wext
bi regekî din dişiqîtine ji laşê xwe
tu dengê tije nake valahiya nava me
bêdengî nahpelûşkên tûj
dirand e cerg û hinavên me
roj hat me bi çavên serê xwe dît
bi pozên axê
bêhna bilbizêqan û dûxana newrozê
li hewayê hevdu hembêz kirin.

Dûrî

Dilşêr BÊWAR

Lê lê wê dilê rezîl îşev jî gazincan bike
bagera ji taristana porê te yê reşxelek dişûje
wê giyana min a kal dîsa ji mêraniyê bixîne
hey zalim! tu yê heya kingê, dilê min ê tîfal
bi bişîrîna xwe ya mêrxapînok ricim bikî
û dilkeviriya xwe ya nîjadî, di ser cestê min de bigijgijîni
Lê lê dûrî ye li min sar e...
were beriya koça dawîn a giyana serserî
serê min deyne ser çoka xwe
û bi dengê xwe yê henûn ji min re bilorîne
ji awaz û newaya birîndar
ken û berkenînan bifesilîne
û ji bêwariya min re di malzaroka xwe de
tîqetîqek xaskurdî biwelidîne
dûrî ye li min sar e...
ne qeqqeba kewan û dengbêjan e
ne şinginiya taca zîvîn a serê zerî esmeran e
û ne jî çinginiya zêrên gerdana we ezaban e
dûrî ye li min sar e....

Rexnegirîya wêjeyê

Adar JIYAN

Wêje, mijara zanînê ya herî girîng e. Pirsgirêka rexneya wêjeyê ya herî girîng pirsgirêka pîvera (krîtera) rexneyê ye.

Ji bo ku mirov di wateya wêjeyê de bigihîje divê meriv aliyê wêjeyê yê ku wê ji zimanê devkî û yê axaftinê vediqetîne, derxe holê. Di zimanê devkî û axaftinê de ziman navgîn e. Û lêkera (kiryara) ku bikaranîna peyvên ber bi armancekê ve dike ye. Alava dahûrandina rastiyê, derxistina wê ya holê û bargirê ragihandina wê bi xwe ye.

LI GORÎ nêrîna Arîstoteles, ku wekî teorîsyenê wêjeya bi pergala tînî û pejiwandinê ji huner, lasayîkirin bi xwe ye.

Belê helbestkar, kirûyeke ji rêzê ya yekanî (tekane) teqlîd nake; ew, pergala gerdûnê ya ku xwezayê di xwe de dihêwirîne bi xwe teqlîd dike

Gava ku behsa bizavên wêjeyî tê kirin fikr û jiyana mirovan a ku di pêvajoya dîrokê de guhertin û veguhertinên kûr pêk tinin tîn bîra mirov. Di her demû domanên dîrokî de mirovan ji daneyên felsefî, zanyarî û her wiha rastiyên civakî, aborî bandor wergirtine û li dewsa fikr û hizrên kevn û paşmayî yê nû û nûjen pêk anîne. Wekî ku di dirûşma “her gav arasteyî başî, bedewî û rastiyê bibin” de jî tê gotin ku bi van pêngavan re nîrxên sincî (exlaqî) bedewkarî û zanyariyê derdikevin holê. Bizavên wêje û hunerê li gorî dem û serdema xwe diguherin û wekî pîvana nîrx û bedewkariyê demê tîn dîtin û pejiwandin.

Bizavên wêjeyî û hunerî, ber û berhemên neteweyî û navneteweyî yê zanistî, civakî, aborî, ramyarî, sincî û olî vediguhêzin nîfşên nû. Û di berdewema nîrxên dîrokî de li hemberî feraset an jî pergala huner û wêjeyê ya kevnar xislet û rewîşteke (kesayetiyeke) şo-

reşger û serhildêr hildigire. Belê ev xisletên şoreşgerî, pîrî caran bi azîne û bi sepandina azîneyên wêjeyî û hunerî re xwe didin der.

Di wêjeya her civakê de, bizavên neteweyî û merhaleyên wê hene. Belê hin ji wan sînoren neteweyî derbas dikin û li nîrx û bergeh-dariyên navneteweyî dadigerin. Û peyre jî bandorê li ser wêje û hunera neteweyî dikin.

Ji berhemên nivîskî yê ku ji hêla nave-rok, awa û çawaniya xwe ve bi mebest û mexseda ku xwîner ji huner û bedewkariya nivîsê têr bibe, hatine/tên nivîsandin re wêje tê gotin. Wêje, yek ji awayê vegotinê yê herî girîng û watedar e. Her wisa wêje, wekî hunera vegotineke bi bandor a ku hest û hizrên mirov derdibire jî tê ravekirin. Îcar, ji bo ku tekst/nivîsar an jî gotarek wekî berhemeke wêjeyî were dîtin, divê pêşî nîrxê wê ya hunerî hebe. Ji bo ku nîrx û pileya berhemê were fêmkirin jî, divê cihêwaziyeke wê ya ji zimanê nivîskî û devkî yê ji rêzê hebe. Lewre ziman, di axaftin û pexşanê de ji bo bikaranîna peyvên an sazîkirina hevokan wekî navgînê tê xebitandin. Her wiha ziman, wekî navgîna ragihandinê ya ku piştî lêkolîn û derbirîna hest û hizrên mirov pêk tîn jî tê bikaranîn. Peyv, di zimanê devkî de, bi axaftinê re peywira xwe bi cih tînin û ji holê radibin. A girîng; bandora wan a ku li ser encamê hikum dike ye. Encam ango armanc, guherandina ku li ser guhdêr bandorê dihêle ye. Belê di zimanê nivîskî an jî berhemên wêjeyî de piştî nivîsandinê jî peywira xwe didomînin. Gelek caran mirov, ji bo ku bikaribe peyv û hevokên xwe yê ku ji hest û hizrên kûr der dibin, bi vegotineke bedewkar bi-hûne û bîdîline, ditengije. Wê gavê hawara xwe dike hunera wêjeyê û li rê û rêbazên hunerî digere. Ziman, rasterê mirov tîne pêşberî kes an jî heyberên ku di sêwr û nîgaşa xwe de bi wan re dipeyive (pêwendiyê datîne). Di zimanê nivîskî û devkî de peyv zebloq, zelal û aşkera ne. Hevok nehs, no, dilkoçer û gewzeger in. Ji nedît ve wînda dibin û diherin. Belê di zimanê wêje û helbestê de berevajî wê

ziman ne navgîn, armanc bi xwe ye. Di wêje û helbestê de ziman, peyv û hevok li rengekî tiştêyî dadigerin. Helbest, nakeve navbera mirov û mirovên din an jî ji bo fikr û tiştên din baştir hev û din xwe aşkera nake. Wekî zimanê devkî û pexşanê tu carî nak-evin rewşeke gewgezer û kêfperest. Li nirxên wêne peyker û muzîkê dadigerin.

Helbestkar, hevokê saz nake. Ew, ji peyvan tiştên bedew ku qet nayên jibîrkirin diafirîne. Ji bo ku peyv bigihîjin ser hevdu hewcetî bi awayekî taybet a ku mirov ber bi meyl-dariyên kûr û derûnî ve dike. Helbestkar, ji peyvan sûtê wernagire. Ew sûtê dide peyvê. Wekî reng û dengê nû, wan dixê regekî zindî û li tiştêkî heyî yê jindar dihesilîne. Helbestkar, pêşî ziman xera dike, belav dike, peyvan diqurmiçîne û dîsa wan dicebirîne û peyre jî wan di cîhana helbestê de dide rûnandin.

Şewaza şewandina peyvan a ku li biwêj, hevok û gotinên bi tilsim û bedewkar dadi-gere, şewazeke kevnar a helbestkariyê ye. Ji hêla din ve mirov dikare bibêje ku ziman li aliyekî, berî ku axaftin pêk were jî helbest û zimanê helbestê hebûye. Tê wê wateyê ku wêje berî ziman pêk hatiye. Belê dîsa jî, helbest û wêjeya herî têkûz piştî vedîtin û bikaranîna nivîsê pêş ve çûye. Di mijarên derveyî hunerê (polîtîka, hiqûq, ol, bîrdoz û hwd.) de jî tekstên nivîskî, destan, stran û dilokên dilîni yên nêzîkî wêjeyê jî wekî berhemên heyberî/camîdî (tiştêyî) hatine nirxandin.

Dê tekst çawa û bi çi awayî were rexne-kin. Ev jî teqez jî hêla wêjevanan ve tê dahûrandin. Li aliyê din ve jî, divê mijara ku tê rexnekin wêjeyî an ne wêjeyî ye jî were rexnekin. Rexneya wêjeyê, gelek caran bi egera dahûrandina pîrsgirêkên wêjeyê û nirxandina ber û berhemên wêjeyî tê kirin. Belê gava ku mirov vê têgehê bi awayekî dorfîrehtir rave bike, dê mirov bibîne ku rexneya wêjeyê rasterê nirxandin û şayesandina wêjeyê ya felsefî bi xwe ye.

Rexneya felsefî (an jî ji feylesofên rexne-gir), her gav bi çavê ciwankarî û bedewkarî li berhemên wêjeyî dinihêre. Û çawaniya berhemê jî ji aliyê wêjeyî û hunerî ve dinirxîne. Belê mixabin rexneya rojane ya ku îro tê kirin, sivik û bi ser re ye. Lewre jî çawaniya

berhemê bêtir, pêşî bi nûser û peyre jî ziman, awa û taybetmendiya berhemê eleqedar dibe. Rexneya berhemê ya bi vî awayî, rexneya rastîn (û bêlayan) a wêjeyî di bin pêşdarazî û hestyariya rexnegir de dihêle.

Nêrîn û nêzîktêdanên felsefî yên çawanî û nirxandina wêjeyê, cara pêşîn xwe di diyalogên Platon de didin der. Li gorî Eflatûn (Platon), cîhana daringî, ji dimenên nîgaşî pêk hatiye. Hemû heyîn û heyber bi saya sehekiyên mirov hatine/têne hisandin. Dimenên ku tên dîtin hemû tiştên la-sayî ne. Tiştên şênber bi hizrên razber re der dibin û têne dîtin. Hunermend ji raste-qîniyê bêtir, bi dimen û nîgariyên ku bi se-hekiyan re der dibin, mijûl dibe.

Hunermend an jî wêjevan, ji hincet û spartekan wêdetir bi sehekî û xuyaniyan mijûl dibe. Li gorî Platon huner, lasayîkirina xwezayê ye. Helbestkar û wêjevanê/a ku lasayîya lasayiyê (teqlîda teqlîdê) dike jî mirov ji rasteqîniyê dûr dixê.

Li gorî nêrîna Aristoteles, ku wekî teorîs-yenê wêjeya bi pergal tê dîtin û pejirandin jî huner, lasayîkirin bi xwe ye. Belê helbestkar, kirûyeke jî rêzê ya yekanî (tekane) teqlîd nake; ew, pergala gerdûnê ya ku xwezayê di xwe de dihêwirîne bi xwe teqlîd dike. Peywî-reke hunermend û wêjevanên ku lasayîkeriya xwezayê dikin a hêvojer (hîndeker) û şerdeker heye. Bo nimûne, trajedyaya bi xwî-ner an jî temaşevanan re, pêşî tirs û xofekê der dike û peyre jî wan li gorî rê û rêbazên xwe ji pelikandinên sawdar û qilqaldar di-parêze û pak dike. Di serdema navîn de rex-negirîya wêjeyê, li ser azîneyên şîrovekirin û ravekirina nivîsarên pîroz hûr dibû. Di wê demê de, digel bikaranîna hunera wêjeyî, bandora dozîneya retorîk (xweşbejî, xweş-peyvîn, xîtabet, rewanbêjî, belaxet) jî hebû.

Di serdema ronîdariyê (ronesansê) de çav-kaniyên Yewnaniya kevnar û Romayê de pîr qîmetdar bûn. Rexnegirên demê, ji bo pey-dakirin û bidestxistina rêbazên wêjeyê yên neguherbar, ketin nav lêgerîna helbest û berhemên şanoyê yên kevnar. Digel wê, ev lêgerîn û peyitandinên nû, bûn destpêka wê-jeyeke nûjen. Û wêjeya nûjen a wê demê, hin bi hin jî bin bandora olê kîşîya û ber bi awa û şewazeke resen û serbixwe ve bû.

Praga Kafka

Munewer AZÎZOGLÛ

Dema ez niha li sernivîsê difikirim, min got gelo divê “Praga” an jî “Pragê” Kafka be? Dûre ez têgihîştîm ku Prag jî mê ye. Ji xwe jê re dibêjin “dayika bajaran” Ger Kafka jin bûya me yê jê re bigota “Praga Kafkayê” Baş e ku ne jin e, ev nav qet lê nayê. Lê gelo em dikarin bibêjin “Praga Milenayê”? Li gorî rêzimana kurdî di vê gotinê de pirs-girêk nîn e, lê mixabin Prag ne ya Milenayê ye. Bajar bi evîna xwe tê nasîn, ne bi evîndara/ê xwe. Ger Kafka ev gotina min bibihîsta ez bawer im ku dê nepejiranda. Dê bigota “Milena evîn e, ne tenê evîndar e”



Erê mîrê min, tu ji evînê hez dikî, ew dem evîn jî dibe evîndar. Lê de ka were vê yekê bi Pragê bide bawerkirin.

Niha ez wisa qala têkiliya Kafka û Pragê dikim, nebêjin ku Prag ji serî heta binî Kafka ye. Qet ne wisa ye. Kafka şaxekî ji Pragê ye; tiştê balkêş ew e ku li Pragê Milena jî şaxeke ji Kafka ye. Li Muzeuma duqatî ya Kafka de Milena tenê di camekanekê de cih digire. Dema li ber derî peywirdar got, “Muze duqat e” min got her hal qatek ji bo jiyana Kafka, qatek jî ji bo jiyana wî ya bi Milenayê re ye. Lê mixabin! Milena tenê di nav camekanekê de bi wênayek û bi nameyekê di nav jiyana Kafka de cih digire. Heta dergistiyên wî yên din û dûre hevala wî ya jiyane di camekanan de zêdetir cih digirin. Ev yek ez şaşwaz kirim. Heta di dil de li ser navê xwe, navê Kafka û Milenayê eşiyam jî. Lê ez çi bikim; bajar bajarê wan e, ez mêvaneke im. Tenê guhdarkirin li min dikeve. Wisa bi dilekî şikestî hatim jêrê; te digot qey Prag bi xeyalên min xayin ketiye.

Prag, dayika bajaran û dirokê. Kevir li Pragê bûne xwedî giyan. Ji du hostayên diwêr pirsîne, gotine, “Hûn çi karî dikin?” Ji hostayan yekî gotiye, “Ez diwar lê dikim.” Yê din gotiye, “Ez qatedralê ava dikim.” Prag ji bilî Kafka bajarê “Hosteyê qatedralê ava dike” ye. Di her avahiyê de hunera wî hosteyî xwe dide der. Li wir li Mêrdîna me (Çi xweş! Mêrdîn jî mê ye, dê ye!) fikirîm. Li bajarê ku xweşikiya xwe li ser kevir neqîşandiye fikirîm. Mêrdîn bajarê mirovahiyê, Prag bajarê dirokê...

Prag, bajarê Moldaû û piran. Rûbara Moldaûyê ku di nava bajêr re derbas dibe, bedewiyeke torîn dide Pragê. Prag xweşikbûna xwe deyndarî rûbara xwe ye jî. Bajarên ku jê rûbar derbas dibin min didexisînin. Ligel Ameda me ya jê Dicle derbas dibe, disa jî ji min re weke dewlemendiyeke ku em jê bê par mabin dixuyê.

Lewre şaristanî li ber keviyên avan mezin bûne, me jî şaristanî li ber keviyên avên xwe ava kirin, lê ji me re nebûn yar. Bi qasî Milenaya Kafka jî nebûn yar. Meşa xwe ya nav bajarê Pragê didomînim. Pirên li ser rûbara Moldaûyê dexesiya min yek car didin der. Pira xwe ya Dehderî difikirim. Wisa bi tenê, ligel hemû hewldanên tune-kirinê dîsa jî li ser lingan, di bin siya Rastika Şêx Mihemed de xwe diparêze. Ger we pirên Pragê biditina we yê dev ji Moldaûyê berda û li ser Dicleyê xwe bi cih bikira. Xwişkîtiya dîrokê...

Dibêjim gelo ev bajar xwe çawa paras-tiye, dîroka xwe, bêtî ku xêzîkek lê bikeve aniye roja me? Kê êrişî ser wê kiriye, Prag jî girêdayî êrişkerê xwe bûye. Bêdeng, bê him û gum. Cihû şênîyên herî kevn ên vî bajarî ne. Ev agahî pîrsa min a destpêkê hinekî dibersivîne. Cihû hatine, Prag bûye bajarê bazirganiyê û sînagogan, Bohmenî hatine bûye navenda çandê, Romî hatine bûye bajarê dêran, Nazî hatine, berî ku bajêr hilweşînin Sowyetê bajar bi şoreşa xwe ya sor xelas kiriye, herî dawî Amerîki-yan “şoreşa nerm” bi riya “radyoya azad” anîne. Serokê wan ê wêjevan diyariya herî dawî ya sedsala bîstan bûye.

Dûre li bajêr û li welatê xwe yê serhildêr difikirim. Kî hatiye û kî nehatiye? Kê êriş kiriye û kê nekiriye? Wekî tê gotin “em in ku hin li ser lingan in!” Dibêjin ku Napolyon êrişî ser welatekî kiriye, welat talan û

xirab kiriye. Şervanekî/e wî welatî xwe digihîne Napolyon, jê re dibêje, “Te hemû dewlemendiya me dikarî bibî, lê tu nikarî rûmeta me ji me bistîn!” Napolyon jî wî/ê wiha dibersivîne; “Her kes tiştê ku pê re/tê de nîn e distîne/dixwaze” Dema ez li ser vê meseleyê, li Pragê û li welatê xwe difikirim dixwazim tiştêkî li ser zêde bikim; Yên ku welatê me talan û wêran kirin rûmeta xwe jî di bin xirabeyên me de hiştin û çûn.

Piştî ew qas çavdêriyan ez jî têdigihêjim ku bi rasti Kafka şaxekî ji Pragê û Milena jî şaxeke ji Kafka ye. Lewre evîna Kafka û Milena hema bêje tune bû. Di vê jiyana hişk û tund de wateya nameyan çî qas be, wateya evîna wan jî ew qas bû. Ango tenê ji bo yê ku wateyê didin bi wate ye û heye; wekî din wek bersiva xwendekarê felsefeyê; Profesora ji xwendekaran re dibêje “Ji min re tunebûna vê kursiyê îspat bikin” Xwendekarek dibersivîne, “Kîjan kursî?”



Ji deftera serîhildanê

Hesen SILÊVANÎ

-1-

Te mîkrofon danî bêhemdê xwe, çavên xwe niqandin û vekirin, te serê xwe bilind kir û gote Beyarî:

- Tiştê ji vê ferztir heye.

Bi wî dêmê pir pirsîyarên xemgîn, di te fikirî û gote te:

- Çi rêyên di neman.

- Bi xatirê te.

- Ez ê di dû te re werim

Demê te ode li pişt xwe hêlay û gihiştî hewşa mekteba Bedirxan, ewa bûyî baregeha sereke, te hest kir, belgên darên mektebê jî pir bi êş û kovan in, ne wek berî çend rojan in, te berê xwe da wan mirovên bê reng û rû û çavtirsîyayî û mendehuş agirekî cihenemî di dilê te de dikeli û cerg û hinavên te disotin, tu li dora xwe zivirî û li diwarên mektebê fikirî û bi kerb jê derketî ...

Ew baregehên berî seatekê, bi tenê, pir deng, reng, çek, fişek, stran û mêrxas, mit û bédeng bûn, xelkê bajarê Zaxoyê û yên lê bûn mêvan, wek berê, bi çek venedigeriyan, hindêk ji wana mîna peykerên kevirîn li ber diwarên dukanan rawestyayî bûn.

Te ji bo xwe got "Pa ka hûn, xwedanên demançe û tiving û rext û fişekan? Ka hûn xwedanên ezmanên sê gaz û nîvan? Ka hûn tajikên kolanan?!

Bi kerb û kîn, te rêya mala xezûrê xwe girt, te bi xwe jî nizanibû çawa wisa zû gihiştî malê, dema tu çû jorê, Diloyê du salî, qesta te kir û qîriya:

- Babo hat, babo hat!

Hêdî, hêdî davên kerbê, navçavên te berdan, bi dilekî sotî, te gote xwe "Çi guheha vî zarokî ye, bihête kuştin? Yan ji îro pê ve êdî babê xwe nebîne?"

Te zarokê xwe ji erdê rakir û kire milê xwe û têr maçî kir, hindî ji wî hat xwe bi

sîngê te ve nûsand û şidand. Careke di te maçî kir û te bir odeyê û deyna xwarê berî dayika wî biaxive te gotiyê:

- Tiving û rextê min bîne der.

Êkser, ewrên tarî rahêlan dêmên wê yên spî.

Ser û sîmayê wê guherîn, pirsîyarên mirî li ser lêvên pêti direqisîn peyv di gewriyê de bûne gêsên hesinî. Bi her du çavên tu baş lê şehreza, gote te:

- Xelk dibêje, esker gihiştîye Sêmêlê û yê qesta Bêxêrî dike, ev gotin rast e?

- A, rast e niha yê xwe lê hev dide bo deşta Dobanê û gelîyê Zaxoyê.

- Pa ka kurdên me? Ka çeperên me?

- Netirse, yên xwe amade dikin ji bo bergiriyê û niha gelî tijî mêr in û xelk qesta wê derê dike

- Heq ew bû ji serê serîhildanê, gelî û Sêmêl û Duhok bi xwedan bûna hizra vê roja reş kiribûna, ne wek niha, li hev şêlay bûna.

- Çi xeman nexwe, gelî asê ye û bi xwedan e.

- Ma me çi didî, divêt Xwedê piştî wan bişkêne îşelaaa.

Qesta qazana savarî kir û sêniyek bo te tê kir û digel nanekî reşandî deyna ber te û beramberî te rûnişt, te baş berê xwe dayê. Berê xwe da te, hêdî hêdî davên xeman, nav çavên wê berdidan û direviyan, careke di kulîlk û beybûna mala xwe lê deynan, bi nazikî gote te:

- Te çi ye, wisa berê xwe didî min?

- Min tu divê!

- Ez dizanim.

- Min gelek tu divê.

- Heçiku tu dê bimirî?

- Ez bawer nakim, hêj zû ye.

-Dê zadî bixwe.

Te neh deh kevçikên zadî xwarin, nîv berdaxa avê bi ser de kir.

Te pantolê kawbûyî deyna, ew şelwalê te ji Maltayê digel xwe înay, kir ber xwe rextê leşkerî li ser şidand, dersoka beleka bê ser û ber di stûyê xwe aland. Zêro yê heft salî bişkurî û got, "Wey wey, baboyî xwe kir pêşmergel!"

Dema te dest avêt darê tivingê, xesûya te bi kotekî şiya bibêje te;

- Dê çi bikî, bextê Xwedê? Te tiving kir milê xwe.

- Dê çim gelî.

- Geliyê çi û şerê çi? Rûnê xwarê, te çi jê ye?

- A rûnim xwarê û serê xwe şor kim, çavên xwe hilû kim, heta dihên careke di li me siwar bibin, ma ne?

- Ê, tu dê çê çi?

- Eger ez û kurên te û xortên vî bajarî xwe li ber dijminî negirin, ma em bo çi ne?

- Ê, ê!

- Bes dirêj bike. Dê çim, anku dê çim. Çavê te li biçûkan be. Berî tu derkevî, Zêroyî gote te:

- Babo, ez jî dê hêm

- Dê hêy çi babo?

- Da harî te bikim.

- Dê çawa harî min bikî?

- Ez ê fişekan bo te dagirim, bi Xwedê ez dizanim.

- Hêj zû ye bo te kurê min, ez dizanim tu zîrek î, xwe bigire babo dê roja te jî were.

Tu gelek dilşad bûyî bi axaftina Zêroyî, girinjînek sava li ser lêvên dayîka wî peyda bûbû, berî tu derkevî ji der ve, gote te:

- Bextê Xwedê, hişyarî xwe be, xwe bi-parêze.

Tu lê ziviriyî û bi zimanê çavan te jê re got:

- Bila, bila.

Demê te du sê pêngav avêtin, dengê xesûya te gihişte guhên te.

- Wexera te ya xêrê be kurê min.

-2-

Roja tûj li nîva esmanî helawistî, tîroj-kên xwe li serê Bêxêrî û Pira Delal û Xabûra har û bêhteng, bi dijarî belav dikin.

Hêj negiheştî meydana Barzan, xwêdanê xiveta xwe li nîva eniya te veda, hêdika te kefika navdestan ji berika şelwalî îna der û ew xwêdan vemalî. Bi kerb te berê xwe da Gazînoya werzişî ya berî şeş rojan êkî ji serkirdayetiya bereya Kurdistanî peyveke hêja û pir biha lê xwendî, te qurçek daqortand û got:

-Pa ka ew mirovên lê kom bûbûn û nehêlan baş biaxive, ji dest qutanê pêvetir.

Li nêzikî xestê, çavên te bi Cegerê ketin. Destê rastê li hewa rakir û bi keyif qesta te kir, destê xwe li rextê te da û got:

- Tu digel kê yî lawik?

- Ez bi tenê me, lê hindek ji hevalên ragehandinê gotine, "Em dê digel hev biçin, li baregeha ku zêlam lê digihên hev"

- Xwe li hêviya min bigire, ez ê biçim firavîne bixwim û tivinga xwe înim û bihêm.

- Baş e, eger giro nebî.

- Eger ez zû nehatim, tu here û em ê li gelî her bigihên hev.

Di wê delîvê de cihêlekî bejnîlind, sor û sipî û baş lêkdayî, silav kir û got:

- Erê rast e esker û top û tank gihiştine deştê?

Yekser Cegerî bersiva wî da:

- Anku tu dizanî, yên hatine?

- Pa em ê çi bikin? Çi ji me dihê bextê Xwedê.

Dema wisa bi sistî û savayî û mirî axivî, tu bûyî agirê sor bêyî ku te hay ji xwe hebe, te destê xwe kir di nav çavan re û bi reqî gotê:

- Hema tu û bûyinbaxa xwe û pêlava teysok sax bin, kuro tu şerm nakî wisa dibêji? Ma tu ne zêlam î? Tu neşê çekî hil-girê, hey xweliser.

Gelek têk çû, xwêdanê eniya wî girt, destên wî lerizîn, çavên xwe şor kirin erdê û lêv ji ser lêvê ranekir.

-Bi xatirê we.

Te wisa gote her duyan û çûyî.

Komeke tirimpêlan li ber dergehê baregehê rawestiyabûn.

Zelamên çekdar karê xwe kiribûn û baş xwe berhev kiribûn ji bo şerî.

Ji nişkekê ve, melayekî rihspî û rengmaqûl, bi dengekî bilind qîr kir:

-Dê lawîno dê, dê xurtîno dê, dê mêrxasîno dê, ev e roja mêran e, ev e roja şêran, ev e roja zelamên bi xîret û namûs, mirin nîn e ji îro ve.

Şehîd e şehîd e, beheştî ye yê sexmêratî axa xwe, mala xwe, eyalê xwe, şehîd be, dê lawîno dê, dê kurdîno dê, dê neviyên Şêx Seîdê Piran û Barzaniyê nemir, xwe bavêjin tirimpêlan û qesta mêran bikin û dijminê bê hêz û lawaz û newêrek ku ji birsa mirî biherşînin, dê evîndarên kurdîniyê, dê hey delalên li ber dilê miletê xwe, hey destên we xweş be, lawên berketî înşeleh Xwedê qewetê bide we û pişt dijminê we bişikîne, dê herin, dê herin wexera we ya xêrê be.

Gotinên melê hêzeke mezin dida zelaman û yekser qesta tirimpêla dikirin ji bo berûkên şerî. Dema te viyayî xwe bavêjî kosterê, Rîşardê pîrçdirêj, bi kameraya xwe ve li ber te rawestiya û bi zimanê îngilîzî got:

- Min divêt şerê gelî wêne bikim, dê parti tirimpêlek hebe min bigihîne wê derê?

- Ez ê pirsîyar bikim.

Te ew digel xwe bir jorê û gote wî berpirsê cihêl:

- Ev e rojnamenivîs e, hez dike şerî wêne bike .Dê tirimpêlek ji bo wî hebe?

- Kê gote te bihîne vê derê, ma tu halê me nabînî?

- Belê weleh ez ê halê we dibînim, çawa li hev du disetimin û wek gêjan nizanin dê çi kin

- Dê here xalo here ne dema wî ye.

Te destê wî kişand, we qesta kosterekê kir û hûn siwar bûn.

Te çavên xwe li dorûberê xwe gerand, te

dostekî xwe dît, we silav li hev kir, şofêrî da rê û strana Şivanî "Herine pêş " pê xist.

-3-

Te pencereya rex xwe vekir, di wê kela dijwar de bayekî hênîk, navçavên te maçî kir. Hêdî, hêdî we malên taxa Hisênîkê li pişt xwe dihêlan. Rîşardî kameraya xwe dabû ber çavê xwe û bajarê Zaxoyê wêne dîkir. Dema tirimpêl gihîşt serê taxê, nêzikî lêva Xabûra har, wî tolazê (ciwan, Kovara W) ji nû mûzerik li aleka hatin û li ber dergehê kosterê ji pêr ve rawestiyayî gote şofêrî:

- Bi xêra de û babên xwe, tenê deqîqeyekê li vê derê raweste, ez ê tivinga xwe bihînim û werim.

- Lezê bike.

Xwe ji tirimpêlê avêt û bi xar qesta mal kir, her di wê gavê de, derket û tivinga wî bi milî ve, dayika wî li dû gazî dîkir.

- Kurê min hay ji xwe hebe, bigihê babê xwe û her du birayên xwe.

- Bila dayê, bila.

Derî girt û got zelaman:

- Li min bibûrin, min piçek hûn derengî xistin.

Ew zelamê rûsor ê ku li navçavên wî nivîsîbû ku gelek dinya dîtiye û şerkerekî kevn e, di Birinoya xwe fikirî û gote ewî cihêlê xwîngerm:

- Kurdistan me her dê serferaz û ava be, hindî xortên wekî te hebin. Seheta te xweş lawo.

Berî hûn ji pirê derbas bibin, çavên te ji pêlên Xabûrî venedibûn, tîrojkên kela rojê li ser rûyê avê bi dîntî direqisîn, tu careke dî li Xabûrê ziviriyî û di dilê xwe de bêdeng gotê:

- Dê bizivirim careke din, her û her dê ji ava te vexwim.

Li serê gundekî komên zelaman digihîştin hev û qesta gelî dikirin, ji keyfa rondikên te dihatin xwarê. Dema we zalgeh li pişt xwe hêlay û kevir û dar û barên serê bajarî serên xwe bo we diçemandin û bi

rêya xwe ya taybet silav li we dikir "Êkser tu çar salan paş ve ziviriyî û ew peyvên li bihara heştê û heftê, li Mûsilê bi navê "Rêya Rojê" te nivîsîn, di dilê te de xwe dihilavêtin, te jî hêdî hêdî vegêrandin ji bo ciwaniya sirûştê Kurdistanê berxwedanê:

*Ev e ez ê biçim sîngê agirî
Mîna mêrxasên pir hêz û dilşêr
Da biparêzim
Vî warê dêrîn
Ji dilreşîya dijminê gurî
Da zarokên me
Her çêkin li ber lêvên Xabûrî
Xanîkên xîzê û
Bikenin bo me û
Dêma befira spî
Ya nivîstî li ser çiyayê Spî*

*Evîndara min
Soz be bi ciwaniya her du çavên te
Û girantir nîn in ji çavên te
Welatê te nebe
Û rih û giyanê min gorî gerdena welatî be
Ger ez sax û serbilind zivirîm
Bi stran û serbestî zivirîm
Ez ê ji te re
Ji davên heyvê
Şalekê rêsim*

*Li newqa te ya spîndariyan
Têr min nedîtî
Bi van destên bêhna barût û cengê jê difirin
Bi kêf girêdim
Ez ê ji te re
Ji tîrojên rojê
Ristikekê çekim
Di ava gul û rihanan hilînim
Li gerdena te
Ya ciwanî jê dizêtin, şidînim
Da her bimînî
Xanima evîne û*

*Rewşa vê jînê
Belê pa eger axa warê min
Xerîb bû ji min
Gazî min kir û min
Xwe têwer kir û
Têr bêhn kir û ji dil maçî kir
Bi xwîna xwe, navê xwe nivîstî:
Zêrevan im ez
Kurê kurdan im
Neviyê mêran im
Xortê çiyar im
Û ruhê min li ser çengên kevokan
Spî kevoka
Bi kêf û xweşî
Bi lavîje û şahî
Bo esmanê cîhana dî firî
Termê min di nav xwînê de teyisî
Qet xeman nexwe
Ne sibe siharê
Dê ruhê min digel çavê rojê
Belav be, mîna ronahiya rojê
Dê bi ezman keve û bi axive
Heyva şevê
Ezmanekî spî mîna nûrê
Û dê bibêje te û
Hevalên gundî û
Hogirên çiyayî û çek û şerî
Bi dengêkî, ne wek wî çî deng
Ez sax im, namîrim
Kewekî şad im û
Li dorên kuptên warê xwe her û
Her dê qebim û qebim
Dê firim û namîrim*

-4-

Nêzîkî zîrikên Hesênayê, dengê gurmegurma topan, xwe li guhên we da. Te neşîya çavên xwe ji gundî bidî aliyekî.

Te diviya gelek pirsîyaran ji dar û teraşên gundê berî sih salan wêran bûyî, bikî. Ev e çend sal û sal in, xelkê gundî bi zorî û koekî hêlane û terîqîne?

Ev çend sal û sal in, ev gund, li hêviya xort û zeriye xwe ye? Li hêviya gêsî û şalokên cotyarên xwe ye?

- Em nêzikî şerî bûn an ne?

Rîşardê rojnamenivîs wisan gote te û kameraya xwe deyna ser piyên xwe û defterikeke biçûk, ji berîka xwe derxist.

Tu lê ziviriyî û te gotiyê:

- Hîna em dûr in ji meydana şerî, heta em digihên cergê gelî ji nû em dê nêzikî tixûbên şerî bibin.

- Ev e şûnwarê gundekî we ye?

- Belê, ev e gundê Hesênayê berê xwe bidîyê, çawa "rejîma mirovayetiye" ji bo xwe kiriye baregeheke leşkerî!

Hêdî, hêdî, ew qelema xwe li ser deftera xwe dibir û dianî, nîza çî dinivîsî, serê xwe rakir û gote te:

- Hêzên we, pêdiviyên şerî û berevaniyê amade kirine?

Sêsed ax û ax li pey hev ji dilê min derketin.

Çi bêjimê û çî nebêjimê? Bêjimê em nivîstî bûn û me hay ji xwe nîn e? Bêjimê berpirsên me li çiyayekî bûn û mîletê xwelî bi ser, li newaleke dî bûn? Çi bêjimê û çî nebêjimê, dê law careke dî, dereweke dî bike û qirçikekî dî daqortîne.

- Belê, belê. Tu bi her du çavên xwe jî dê bibîn!

Serê xwe hejand û got:

- Ev dar û bar û ware hejî hindê ne, mirov xwe gorî bike, çî welatekî pir jî ciwan e welatê we!

Pa tu çî dibêjî me kurdan, evîndarên Kurdistanê, bêy Kurdistan em tajîk in, tajîk in, tazî ne, berze ne, wînda ne.

- Hêviyeke bê tixûb ez di çavên we de dibînim.

- Çunkî em xwedan bawerî ne. Lewma îro bikêf em qesta berûkên şerî dîkin. Welatê me, tenê bo me helal e.

Dema em ketin zîkê gelî, bêhna barûtê xwe li difinên me da û dengê peqîna topan xweştir lê hat

-5-

Erûba Berekat ka tu? Niha tu li ku yî? Erê te dîtî û têbîniyên xwe li ser geriyana me ya azad di nav xelkê û pêşmergeyan de tomar kirin? Û ew wênêyên te girtin wê bigihên kovara ku tu lê kar dikî?

Niha tu yê di hizra wê de, li ber çavên te ye, tu wisa dibînî niha hawara wê ye, da ji bo xwe rêyekî bibîne ku ji tengaviya ketiyê rizgar be... Mixabin pa niha xem û kovana xwe li dûr çandî ye! Bêguman niha Mamê Evdia di hawara wê çûye.

Ji cara pêşiyê ku min ew dîtî di nav pêşmergeyan de li baregehê, wisa bi sivikî û bawerî bi kamera û qelem û amûrêntomarê diçû û dihat, dê bêjî yek ji me ye, min hest bi xweşiyekemezin kir.

Pîştî pîrsên xwe li ser serîhildanê û armancên wê kirin û hevalan bersiv dan, we her duyan hest bi nêzîkbûnekê dikir û çavên we yên pir bişkurîn baştirîn şahid bûn.

Dema destê xwe li piştî te da û got:

- Û niha tu dê min bi ku ve bibî?

Te berê xwe da dava zera pirça wê ya hatî xwar li ser alekê û te got:

- Em ê biçin geriyaneke azad di nav bajarê Zaxoyê de.

- Min hez ji vî bajarî kir.

- Çima canê?

- Bes pîrsiyaran bike, ew karê min e! Ez im rojnamevan û pîrs mafê min e ma ne?

- Bila wisa be keça Berekatî.

Ew, Beyar û tu, we her siyan qesta bazarê, goristanê, Xabûrê, Pira Delal kir. We çend wêne girtin. Li ser pira Erûbayê serê xwe dihejand û digot:

- Ev der çend xweş e? Ev e çî çiyayên jêhatî ne? Çî Xabûreke bi şîq û evîn e? Hûn di xêra Xwedê de ne!

Çavên xwe ji ava Xabûrê û zîrikên destê rastê û xelkê ve nedikirin, xweşiya biharê gulistana xwe di dilê wê de çandibû, nîv fityek veda û ji kûrahiya dilê xwe got:

- Wey babo çend xweş e Zaxoka wel!

Beyarî bi kenî ve gotiyê: - Were bibe yek

ji me û li vê derê bimîne, ma ne baş e?

- Sipas, mala we ava, bi Xwedê min hez ji we û xelkê we kir. Belê ma we nedit.

Piştî em gelek westiyan, em vejeriyan nivê bazarê, me ew vexwendibû nanxwarinê li mal, lê ewê dinya qulipand û got:

- Hûn bixwazin û nexwazin hûn mêvanên min in.

- Keçê, dîna Xwedê çênabe, tu ya di nav me de û ev e malên me ne.

- Hûn bi Xwedê kin wisan nebêjin. Dema me kurt e û bila ez feydê ji dema xwe werbigirim. Hûn mêvanên Erûba Berekat in, baş e?

- Baş e! Na weleh ne baş e, bes bila weke te be.

- Da em biçin otêla Bexdayê.

- Da em biçin.

Tama kebaba xweştir lê dihat, dema we her siyan behsa peyvê û wêje û rewşenbîriyê dikir, di odeya wê ya biçûk de.

Tu û Beyar kêfxweş bûn çunkî wê hest bi hêminî û rehetiyê di gel we dikir.

Erûbayê bi şadî çîroka derbasbûna xwe ji ava mezin bi gemiyeke biçûk a darîn ji bo we her duyan vedigêra û xweşî ji nav çavan difirî, dema bi evînî behsa pêşwaziya pêşmergeyan a pir camêrî û rêzigtin li xala Pêşxabûrî dikir. We hest dikir xweşî mala xwe li ser dîwarên odeya ku hûn tê de bi delalî radixe, dema wê behsa wan gavên çavên wê ciwaniya çiyayên Kurdistanê maçî kirin û bêhna kulîl-kên Newrozê dilê wê tijî bayê azadiyê kirî.

Ne tu, ne Beyar çi caran nikarin van peyvên wê ji bîr bikin:

- Aaaah çend hûn baş in û xweş mirov in xelkê Kurdistanê!

Ka tu keça Berekat î? Ez hêvî dikim, çi bela nehatibin serê te û tu sax û silamet be. Bêguman em ê hev du bibînin careke din, ev e dilê min wisan dibêje û kêm caran dilê min şaş dibe.

Nêz hatiye

Sîpan XIZAN

Keça delal tu dinalî gelo çima
Bi keser û bê mecal î gelo çima
Dimeyzînim zor bê hal î gelo çima
Azadî nêz e bawer be, bizanibe carek

Daxwaziya te azadî ye dizanim ez
Ji bo mêran her hêvî ye dizanim ez
Bêşik, dê serkeftin pêk bê dizanim ez
Lewra xebatkar bo te hene bizanibe carek

Aştî dixwazin ji bo her kesî em
Ji bona tevahiya gelan li cîhan em
Bo reşik, kejk, spî, sorik jî em
Bi azadî jiyîn maf e bizanibe carek

Her kes qadên welatê xwe bike jîyan
Ez û tu jî jîyan çêkin şûna waran
Bi azadî digel hev kin geşt û seyran
Lewra nêz e ji bo me bizanibe carek

Ji bo her kes serbestî xweştir e bizan
Bi tevayî ji bo wî re têkoşîvan
Azadî her jî bo me jî maf e bizan
Lewra nêz e ji bo me bizanibe carek

Bêşik were azadî bi sond û peyman
Digel hev bin bi serbestî û dil û can
Li herêmên çiya û deşt û gelî û zozan
Herî bikin dîlk û dîlan bizanibe carek

Keç û xortên me çêbûne li deveran
Fêriz im bo azadiya xaka Kurdistan
Têkoşîna wan şewq daye tara cîhan
Pergalek nûjen çêbibe bizanibe carek

Ez sond dixwim evîna te keça delal
Me derbas kir bi keserî çend qirn û sal
Keç û lawên evîndar bîntintin mecal
Sîpan bawer nêz hatiye bizan carek

Sirûda stranan a Silêman⁽¹⁾

Wergêr: Salih BOZAN

Pirtûka Yekemîn

1. Sirûda stranan a Silêman.*
2. (Dilber): Bira bi ramûsanên devê xwe min ramûse, çimkî evîna te ji meyê xweştir e.
3. Bêhna donê te xweş e, navê te mîna bêhneke weşyan e, loma keçîndar ji te hez dikin.
4. Min li pey xwe kaş bike, ji bo em birevin. Şah ez kirim nivîna xwe. Em bi te geş û şa dibin. Ji meyê bêtir em evîna te tînin bîra xwe. Ên ji te hez dikin li ser riya rast in.
5. Lê keçên Orşelîm! Ez reş im, lê ez bedew im, ez weke konê Qeydar im,⁽²⁾ weke surdaqên (rewagên) Silêman im.
6. (Dilber): Li min nenihêrin ku ez ev qas reş im, royê ez tarî kirime. Kurên diya min ji min xeyidîn, ez kirim rezvanê rezan. Lê min rezê xwe neparast.
7. Lo yê ku dilê min jê hez dike, ji min re bibêje tu li ku derê keriyê xwe diçêrîni? Li ku derê taştîyan mexel dikî? Çima ez ê weke jineke bi neftik li kêleka keriyên hevalên te bigerim?⁽³⁾
8. (Dilyar): Lê çelenga jinan, ku tu nizanî, bi şopa miyan de, karikên xwe li hinda xaniyê şivanan biçêrîne.
9. Lê dilbera min! Ez te weke hespeke di erebanên Ferhon de dişîbînim.
10. Çendîn hinarikên te di bin xarûzanan de xweşik in, çendîn qirika te bi gerdenê zêrîn çeleng e.
11. Em ê guharên zêrîn ji te re çêkin û bi zîv bineqîşînin.
12. (Dilber): Hîn şah li ser textê xwe ramediyayî bû, nardînê bêhna xwe berda.⁽⁴⁾
13. Dilyarê min ê min e, weke boxçeyêke tiji murr e.⁽⁵⁾ Ew di navbera pêsîrên min de xulmaş e.
14. Dilyarê min gûşiyekî hinê ye di rezê kaniya karê de ye.⁽⁶⁾
15. (Dilyar): Çiqas tu çeleng î lê dilbera min, çiqas tu çeleng î! Çavên te mîna du kewkirkan in.

16. (Dilber): Çiqas tu bedew î lo dilyarê min, bi rastî tu dilrevîn î, şîrîn î û nivîna me teze ye.

17. Sapûtika mala me ji hevrestê ye û bi darên selwî kiraskirî ye.

Pirtûka duyemîn

1. (Dilber): Ez nêrgîza Şaron im, ⁽⁷⁾ sosina newalan im.
2. (Dilyar): Dilbera min di nav keçikan de weke sosinek e di nav striyan de ye.
3. (Dilber): Dilyarê min di nav xortan de, mîna dareke sêvê ya di daristanê de ye, di bin siya wî de min dixwest rûnê, fêkiyên wî di qirika min de şîrîn in.
4. Wî ez anîm eywangeha şahiya xwe, ala wî li ser min hezkirin bû.
5. Kulorên mewîjan bi min xwarin bidin, bi sêvê min vejînin, ez bi evînê nexweş im.
6. Destê wî yê çepê di bin serê min de bû û yê rastê ez hembêz dikirim.
7. Lê keçên Orşelîm..! Ez we sondkirin didim, bi xezalên çolan, bi evorên zeviyan, dilyarê min ji xew ranekin, hişyar nekin, heta ew bi xwe radibe.
8. Ev dengê dilyarê min e tê, di ser çiyayan re tê, ser qûçan re xwe çeng dikî.
9. Dilyarê min weke xezalekê ye, yan jî weke evorekî ciwan e, va ew e, li paş dîwarê me sekiniye, di qulikan re dinihêre, di pencereyan re bi dizî mêze dike.
10. Dilyarê min ji min re got: Rabe dilbera min, çelenga min, were bi min re biçê.
11. Zivistan êdî çûye, baran rawestiyaye û nemaye.
12. Gul li ser zemîn xuya dibin, wexta stranan hatiye û dengê kewkirkan li zeviyên me tê.
13. Dara hêjîrê ber girtiye, rezên guldar bêhna xwe berdane, de rabe dilbera min, de rabe were.
14. (Dilyar): Lê kewa min e, xwe avêtiye

qelşa zinaran, veşartgehên kendalan! Rûyê xwe raberî min bike, dengê xwe bigihîne min, dengê te şîrîn e, rûyê te bedew e.

15. Ji me re roviyên biçûk yên rezan telef dîkin, nêçîr bikin, rezên me êdî çilok dane.

16. (Dilber): Dilyarê min ê min e, ez jî ya wî me, li nav sosinan keriyê xwe diçêrîne.

17. Vegere dilyarê min, berî ku ro bihna xwe bikişîne û tarî bireve, mîna xezalan vegere, yan mîna evorekî ciwan ê çiyayên Etyabê.

Pirtûka sêyemîn

1. (Dilber): Bi şev pê de, li ser nivînê xwe min destê xwe dipalikand, bi dilsojî li yê ku dilê min jê hez dike digeriyam û min ew nedît.

2. Ez ê niha rabim di bajêr de bigerim, di kolan û meydana de, ez ê li yê ku dilê min jê hez dike bigerim. Ez çûm lê geriyam û min ew nedît.

3. Ez li pêwanên bajêr rast hatim, min ji wan pirsî: “We yê ku dilê min jê hez dike nedît?”

4. Gava ez ji wan derbas bûm, min yê ku dilê min jê hez dike dît, ez raperikîm wî, min ew berneda ta kir xaniyê diya xwe; ew xaniyê ku diya min tê de bi min avis bûbû.

5. Lê keçên Orşelîmê! Ez we sondkirin didim, bi xezalên çolan, bi evoran, hûn dilyarê min ji xew ranekin, hişyar nekin ta bi xwe radibe.

6. (Sirûda keçên Orşelîmê): Ev kî ye, mîna stûneke dûmanê ji çolistanê derdikeve, bi bêhn û bi bixûr e, bi hemû melhem û kilên bazirganan e?

7. Ev textê Silêman e, li hawirdorê şêst pêlewan ji pêlewanên Îsraîl sekinîne.

8. Giş bi şûran çekdar in, fêrî cengan in û ji bo bêtarên êvaran şûrên wan bi kêlekê wan ve ne.

9. Şah Silêman ji darên Libnanê textê kişweriyê çekiriyê.

10. Stûnên wî ji zîv çekirî ne, balîf ji zêr e, doşeg ji erxewanan e û keçên Orşelîmê çarşeva wî ya hundirîn bi evîne çinîk kirine.

11. (Dilber): Lê keçên Sahyonê

derkevin û binihêrin! ⁽⁸⁾ Şah Silêman bi zerzengê tacdar e; bi zerzenga ku diya wî roja zavatiya wî ew pê tacdar kiriye, ew roja şahiya dilê wî ye.

Pirtûka çaremîn

1. (Dilyar): Çendîn tu çeleng î dilbera min, çendîn tu çeleng î! Çavên te di bin nef-tika te de mîna du kewkirkên in, porê te yê reş weke keriyekî bizinên ji pesara çiyayê Celadê dadikeve. ⁽⁹⁾

2. Diranên te weke keriyekî miyên birî yên ku ji bin şûştinê derdikevin, her diranek bi tacêwiye xwe re ye, tu diranên kurmî di nav de nîn e.

3. Lêvên te xêzeke qirmizî ye, gotinên devê te xweş in, her du hinarikên te di bin neftika te de du parçeyên hinaran in.

4. Stûyê te mîna birca Dawid e, ya ku ji çekan re ava kiriye, ⁽¹⁰⁾ hezar mertalên cengewerên stûr bi dardakirî ne.

5. Çiçikên te du karikên tacêwî yên xezalan in, li nav sosinan diçêrin.

6. Hema ku ro bêhna xwe dikişîne û tarî ji ber direve, ez dibezim hinda çiyayê Murr û girê Libnanê. ⁽¹¹⁾

7. Tu bi tevahî bedew î lê dilbera min, tu kêmasî di te de nîn e.

8. Ji Libnanê bi min re were lê bûkê, ji Libnanê bi min re were! Mêze ke di ser pozê çiyayê Amaneyê re mêze ke, ⁽¹²⁾ di ser pozê Şonîr û Hermonê, ⁽¹³⁾ di Gêdûka Şêran û di ser Çiyayên Pilingan re mêze ke.

9. Bi nêrînen çavên xwe, bi gerdeniya di stûyê xwe de, te dilê min talan kir lê xwişka min, lê bûka min!

10. Çiqas evîna te şîrîn e, lê xwişka min, lê bûka min! Evîna te ji meye noştir e, bêhna bêhna te ji bêhnan gişan xweştir e.

11. Ji lêvên te hinguv dirije, lê bûkê! Di bin zimanê te de hinguv û mast e, ji kirasên te bêhna Libnanê tê.

12. Tu bihuşteke girtî yî, lê xwişka min a bûk. Tu çaviyeke kilitî, kaniyeke devsi-waxkirî!

13. Şitlên te Firdewsî hinaran e, bi fêkiyên hêja ne, bi hine û nardîn in.

14. Tu nardîn û zaferan î, qamişê bêhn-xweş î, tu qurnefil î, hemû darên Libnanê û Murrê yî. Tu bêhnên tewre baştirin î.

15. Tu kaniya bihuştan î, bîra bi ava zindî yî, tu cobarên ji Libnanê tîn.

16. (Dilber): Lo bayê bakur hişyar be, were tu ji bayê başûr! Werin bihuştan min, ji bo bêhna wê belav bikin. Bira dilyarê min were bihuştan xwe û ji fêkiyên wê yên xweştirin bixwe.

Pirtûka pêncemîn

1. (Dilyar): Ez hatim bihuştan xwe, hê xwişka min, bûka min, min mur û tiştên xweş berhev kirin, min hinguvê xwe tevî şimayê xwar, min mey bi dewê xwe re vexwar. (Keçên Orşelîmê): Bixwin lo hogirino, vexwin û mest bibin lo evîndarino.

2. (Dilber): Ez raketibûm lê dilê min hişyar bû, ax. De bibihîsin! Ev dengê dilyarê min e li derî dixê. (Dilyar): Veke lê xwişka min, dilbera min, kewkîrka min, çelenga min! Serê min bi xunaviyê şil e û xûsi li ser guliyên min ketiye.

3. Min got: Min kirasê xwe ji xwe daniye, ez ê ji ku careke din li xwe bikim? Min lingên xwe şûştine, çawa ez ê careke din gemarî bikim?

4. Dilyarê min destê xwe di teqa derî re dirêj kir, bi vê tevgera wî re hestên min liviyan.

5. Ez rabûm bi destê xwe yê bêhnê diniquitî, bi pêçiyên xwe yên bêhnê diweşiya, ez rabûm derbesta derî vekim.

6. Min ji dilyarê xwe re derî vekir, lê wax. Dilyarê min êdî çûbû, ser min re derbas bûbû û gava ew dûr ket giyanê min ji hundirê min derket. Ez lê geriyam, lê min ew nedît, min bang kir, lê wî li min veneğerand.

7. Pêwanên di bajêr de digeriyan ez dîtîm, li min xistin, ez birîndar kirim û pêwanên sûrên bajêr jî cilên min ji min kirin.

8. Lê keçên Orşelîmê! Ez we sondkirin didim, gava hûn dilyarê min dibînin, haya min pê xî, jê re bibêjin ez nexweş im.

9. (Keçên Orşelîmê): Lê çelenga jinan! Bi

çi dilyarê te ji yên din çêtir e, ta ku tu me wisa sondkirin didî?

10. (Dilber): Dilyarê min xuya ye, sor e û aleke di nav deh hezar peyayan de ye.

11. Serê wî ji zêrê pak e, guliyên wî weke pêlên deryayê xwarxwarî ne û weke kelereşê reştarî ne.

12. Çavên wî mîna du kewên di avê de ne, bi mest şûştine, û di ciyê xwe de rûniştine.

13. Gupên wî baxekî guldar e, bêhna xweş jê tê, lêvên wî sosin in, xweşiya murrê jê dilop dibe.

14. Herdu destên wî du bazinên zêrîn in, bi zebircedê çinikkirî ne û gewdeyê wî weke qîlê filan şayik e, bi yakûtê hêşin qaş kiriye.

15. Herdu çaqên wî du stûnên mermerî nin, li ser du dezgeyên ji zêrê pak in, lingên wî mîna bilindahiya Libnanê ne. Ew ciwanekî mîna hevristê bedew e.

16. Devê wî şîrîn e, ew bi tevahî dilbijawend e. Ev dilyarê min e, ev yarê min e lê keçên Orşelîmê.

Pirtûka şeşemîn

1. (Keçên Orşelîmê): Lê çelenga jinan! Ka dilyarê te ku de çû, ji bo em bi te re lê bigerin?

2. (Dilber): Dilyarê min çû bihuştan xwe, çû nav gulên bêhndar, ji bo di çîmenan de keriyê xwe biçêrine, sosinan berhev ke.

3. Ez a dilyarê xwe me, dilyarê min ê min e, ew di nav sosinan de şivan e.

4. (Dilyar): Lê dilbera min tu çeleng î weke bajarê Tîrseyê,⁽¹⁴⁾ weke Orşelîmê xweşik î. Tu heydedar î, weke ordiya ku alên xwe ber bi jor hildane.

5. Çavên xwe ji ser min rake, wan ez alt kirim. Porê te weke keriyekî bizinan ji Celadê dadikeve.

6. Diranên te spî ne, weke keriyekî miyên ku ji bin şûştinê derketine, her diranekî te bi yê din re tacêwî ye, tu diranên pûç di nav de nîn in.

7. Her du hinarikên te di bin neftika te de du parçeyên hinarekê ne.

8. Li wê derê şêst şahjin hene, heştê carîye û keçên bê hejmar.

9. Lê kewkirka min, tu di nav wan de bê-hempaya min î, tu tenhaya diya xwe yî. Di nav zarokên wê de tu ya tewre nazenîn î. Gava keçîndaran ew dîtîn, di ser xwe re girtin, şahjin û carîyeyan ji pesnê wê dikirin.

10. Ev kî ye? Weke berbangê derdikeve, weke hîvê bedew e, mîna hetavê hiltê û heydedar e, weke leşkerên alên xwe ber bi jor hildane.

11. (Dilber): Ez daketim baxçeyê gûzan ji bo berên wan yên nû bibînim, binêrim ka rezan çiçek dane û hinar sor bûne.

12. Bê ku ez bi hawirdora xwe hest bibim, min hew dît ku ez di nav mîrên miletekî bi rûmet de me û ez ji wir reviyam.

13. (Keçên Orşelîmê): Vegere. Vegere lê Şûlemmîtê⁽¹⁵⁾, vegere ji bo em li te binihêrin. (Dilber): Hûn çi di Şûlemmîtê de dibînin? (Dilyar): Ew weke dîlaneke bi du rêzan e.

Pirtûka heftemîn

1. (Dilyar): Çendîn lingên te di solan de bedew in lê keça miran. Her du hêtên te yên gilover du gewherên bi destê çekerekî jîr çêbûne.

2. Navika te berdaxeke gilover e, zikê te gidişeke geniman e, bi sosinan dor-pêçkiriye.

3. Herdu çîçikên te du karên xezalan in.

4. Stûyê te mîna qîlê filan dûz e, çavên te kûr in weke du golên Heşbonê,⁽¹⁶⁾ pozê te bilind e mîna birca Libnanê ya li Şamê dinihêre.

5. Serê te li ser te weke Kermêlê ye,⁽¹⁷⁾ û porê te yê berdayî mîna erxewanan e. Şah di van biskan de dîl ketiye.

6. Çendîn tu çeleng î lê dilberê, çendîn tu bi xweşiyên şîrîn î.

7. Bejna te mîna dara xurmeyê ye, pêsîrên te weke guşiyên in.

8. Min got: Hele ez ji xwe re bi dara xurmeyê ve hilperikim, bi guşiyên wê bigirim, bira pêsîrên te ji min re guşiyê tirî be û hilma devê te weke bêhna sêvê be.

9. Devê te meya tewre xweştirin e.

(Dilber): Bira ew gişkî ji dilyarê min re noşîcan be, bira ser lêvên xulmaş de şîrîn birije.

10. Ez a dilyarê xwe me, ew jî ji bo min disoje.

11. Lê dilberê! Were em biçin hinda zeviyan, em li gundan rakevin.

12. Were em sibê zû herin nav rezan, em binihêrin ka gul dane, ka xunçeyên wan bişkivîne, ka hinar sor bûne? li wê derê ez ê evîna xwe diyarî te bikim.

13. Bêhna mandragorê êdî diweşîye,⁽¹⁸⁾ fêkiyên xweş xwe ser deriyên me de berdane, fêkiyên kevn û nû min ji te re hîlanîne.

Pirtûka heştamîn

1. (Dilber): Xaziya tu birayê min bûyayî, yê ku pêsîra diya min mêtî bûyayî, ji bo gava ez li derve te dibînim, bê ku kes min lomekar bike, ez te ramûsim.

2. Min karibûya tu derbasî mala diya xwe bikira, ew dera ku diya min tê de ez fêrî hezkirinê kirim, min ê mey bi ava hînanan bîdiya te

3. Destê wî yê çepê di bi serê min de ye û yê rastê min hambêz dike.

4. Lê keçên Orşelîmê! Ez we sondkirin didim, hûn wî hişyar nekin, ji xew ranekin heta bi xwe radibe.

5. (Keçên Orşelîmê): Ev kî ye ji çolê derdikeve, palê xwe daye dilyarê xwe?

(Dilyar): Di bin dara sêvê de, li wê dera diya te bi te avis bûbû, bi êlincejana zayîne tu hanî, li wê derê min sojên te di te de hişyar kirin.

6. (Dilber): Min bike muhra ser dilê xwe, min çînika ser zendê xwe ke, evîn weke mirinê bi hêz e û gumreşî mîna jêrzemînekê zor e, pêtên evînê ji pêtên agirê Xwedê ye!

7. Piraniya avê agirê evînê venamirîne û ne lehî dikare di bin xwe de biniximîne. Ku mirov malê xwe gişî bi evînê re bipîve, dê mal tim ji evînê kêmtir be.

8. Xwişkeke me ya biçûk heye, hîn

pêsirên wê derneketine, çawa em ê di roja bûkantiya wê de, pêsirên jê re peyda bikin?

9. Ku pêsirên wê weke sûrek bûya, me yê avahiyeke bilind ji zîv li ser lêkîra ku deriyek bûya, me yê bi darên hevrestê piştvan bikîra.

10. (Dilber): Ez mîna sûrekê me û pêsirên min weke du bircan in, loma di çavên wî de tekûz im.

11. Rezekî Silêman li Bal Hamûn hebû,⁽¹⁹⁾ rezê xwe da pasvanan ji bo berdêla fêkiyan, her pasvanekê dê hezar zîv pere bide wî.

12. Lê rezê min li hemberî min e, bira hezar yê te be û du sed ji yê pasvanan be.

13. (Dilyar): Lê tu ya di bihuştan de rûniştiye, herdu hevalrêyên min bi bal-darî li dengê te guhdar dîkin, wî dengê xwe bigihîne min jî.

14. (Dilber): Weke bezokekî, bi lez were hinda min, bira tu mîna xezalan, yan jî weke evorekî ciwan li ser çiyayê Etyabê bî.⁽²⁰⁾

*. Qasî min karibû, min xwest ev wergera dûre nivîsa "Tewratê" nekeve. Him bi wateya xwe, him jî bi huneriya xwe. Lê nizamî çiqas bi ser ketim. Ez karîm bibêjim, min ne tiştek zêde kir û ne tiştek jî kêmkir. Min jî zamênê rûsî û yê erebî wergerand, lê ez vegeriyam hinek pirtûkên din jî. Ji bo xwendevanên Kurd yê ku tu carî Tewrat nexwendine, min di nav du kevan de (...) peyva "Dilber", "Dilyar" û "Keçên Orşelîmê" zêde kirin, û ev jî min jî {Pirtûka Jiyanê} ya ku Tewratê şîrove dike wergirtin. Hemû pirtûkên ku min bikar anîne, min li jêr diyar kirine.

Têbînî:

1- Silêman: Navekî cihûya ye, bi wateya "peyayê aştiyê". Ew Kurê Şah Dawidê Tewrî yê navdar di dîroka Cihûyan a kevînar de, ew bi şarezahiyê tê naskirin.

2- Qeydar: Navekî samîtî ye bi wateya "hêzdar yan reş". Dîbêjin kurê Ismayîlê duyem e; bavê elên ereban yê navdar in. Di nivîsa îbrî (Hebro) de, Silêman û Qeydar li vê derê du elên ereban ên koçer in.

3- Di wê demê de, jinên tolaz (qehpik) rûyê xwe digirtin û li kêleka rêyan canê xwe difirotin rêwîyan.

Dilber jî weha dîkir, ji bo kesek wê nas neke û bi çolan diket, li dilyarê xwe Silêman digeriya. Gava şivanan ew didît, ji wan be tolazek e, loma dixwestin tevleşê bibin, ew jî ji vê rewşa xwe gazincan dike.

4- Nardîn: Navê dareke bi bêhnxeş e.

5- Lopikên sipîne ji dareke bi stîrî ye û bêhnxeş e, jê re digotin dara murrê.

6- Navê ciyekî ye, li perava rojavayî Derya Mirî ye.

7- Şaron: Navê deştekê ye, li berava bajarê Yafa ye, ji aliyê başûr dest pê dike ta çiyayê Kermêlê yê li bakur.

8- Sahyon: Navê kelehekê ye

9- Celad: Navê çiyakî li rojavayî Êrdînê ye.

10- Dawid: Şahekî Cihûyan yê bi navûdeng e. Bajarek bi navê wî hebû û li ser sûra wî bajarî bircek hebû jê re digotin: Birca Dawid.

11- Çiyayekî tîji darên murrê ye û girekî bi darên Libnanê nixumandiye. Murre û Lûban du darên bêhnxeş in.

12- Amane: Navê çiyayê Libnanê yê biçûk e.

13- Şonîr û Hermon: Navê du çiyayên niha jê re dibêjin Cebel-elşêx li başûrî Suriyê ye.

14- Tîrse: Bajarekî gelek çeleng bû, di bin destê Kenenayan (Cenaniyet) de bû. Îsraîlan ew bajar wêrankirin û paşê kirin bajarê xwe. Dîbêjin nêzikî bajarê Nablîsê bû.

15- Şulêmit: Navê dilbera di van sirûdan de ye.

16- Heşbon: Navê bajarekî ye.

17- Kermêl: Navê rêzeçiyayên li Filistinê ne.

18- Mandiragor: Bi erebî jê re dibêjin "loffah", û bi latînî jê re dibêjin (mandragora officinarum). Ew mîtekî weke patetan e, bêhnxeş e, li dawîya zîvistanê derdikeve. Di wê demê de, bawer dikirin ku ew mit derman e, jê nivîşt çêdikin ji bo evîn di hundirê mirovan de peyda bibe.

19- Bal-hamûn: Çiyayekî ne diyar e.

20- Etyab: Navê çiyayekî ye.

Çavkaniyên vê wergerê

1. "Pirtûka Pîroz" bi zimanê rûsî. Dem û çapxane ne diyar e.

2. "Pirtûka Pîroz": Çapemeniya Kambêrc - Ingiltera, bi zimanê erebî. dem û çapxane ne diyar e.

3. "Pirtûka Pîroz": Wergera şîrove, bi zimanê erebî - Kahîre - Misir-1988.

4. "Pirtûka pîroz": Komeleyên pirtûka pîroz li rojavaya nêzik, bi zimanê erebî. Libnan-Bêrût 1971.

5. Ferhenga "Pirtûka Pîroz" bi zimanê erebî. Bêrût-Libnan-1981.

6. "Pirtûka Pîroz". Çapemeniya "Komeleya Pirtûka Pîroz li rojhilat". Libnan- Bêrût. 1989.

Nan nan nan

Migirdîç MARGOSYAN
Wergera ji tirkî: Feratê DENGİZÎ

Li wan derên me, li Amedê, nan pir û pir tê xwarin. Bê nan xwarin xwarin, bê nan tecrûbeya têrxwarinê wek ku yek nizanibe birçîtî tişteki çawa ye. Me di axaftinên xwe yên rojane de jî dianî ziman ku em çi qasî ji nan hez dikin, çi qasî pir nan dixwin. Me ji yekî/ê re nedigot, "Were rûnê, em xwarinê bixwin" me digot, "Were em nan bixwin." Ku dema em li ser xwarinê bûna yek bihata cem me yan jî mêvanekî me bihata, me nedigotê, "Ma te xwarin xwariye?", "Ma tu birçî yî?" Me jê dipirsi, "Ma te nan xwariye? Me jê bawer nedikir. iroekî ku nan nexwaribe têr nabe, teqez birçî ye...

Li malên me kulinên me hebûn. Kulinên me bi denên ziktirtire dagirti bûn. Ma gelo me çi dixist denan? Ez bibêjim: Pêşiya pêşin denê me yê herî tirtire, herî bi zik û yê herî qelew î şîşko bi arvan dagirti bû. Li teniştê wî denên me yên din î ku li gorî bejna xwe bi rêz dibûn; denên me yê dan, bilxwir, nîsk, nok, fasûlî û birincê bûn. Denên me yê dinê jî hebûn: Denê dimsê, cîranê wî yê devderî denê rûn, denê mewîjan ê ku me zarokan pir jê hez dikir û pir û pir serî didayê û ji ber vêya her ji carekê gotinên diyên me dihatin rûyên me, denên; bastêqê, yê gûzan û yê beniyên ji gûzan...

Li wan derên me, li ba me pîvana dewlemendiyê bi meziniya kulînê, bi hejmara denên li kulînê û bi zikmeziniya wan an jî çirmaqiya wan dihat pîvandin. Ku denên malê tev vala bûna êşkere bû ku, rewşa malê kambax e, ne qenc, dilşewat û perîşan e. Me di duayên xwe de vîna şanî dida û wiha digot:

"Xwedê denê kesî vala nehêle."

"Xêr û bêra Brahîm Xelîl ji denên me qet kêr nebe."

Lebikandina diyên me ya ku; rojên yekşemê piştî dêlindêza dêrê, bikaribin nanekî ji wan nanên pîroz ku Keşe Arsen bi çikûsî belav dikir bigirin û ji wan nanên biçûçik

her yekî têxin hundirê denekî ku bereketa wî zêde bike; hêja bû hezar pesnî. Gelek bi rûmet bû. Ku Keşe Arsen jî dêvla, ji roja yekşemê heya yekşema dinê ew sê çar nanên sêlê yên biçûçik, tenik î pîroz belav dikir, tirali nekira û hê zêdetir nan çêbikira û hê pirtir belav bikira, wê diyên me jî neketina pêşbaziya revandina nanê pîroz û wê bika-rîbûna denên xwe dagirtina, ew ê hê baştir bûya. Lê miheqeq Keşe Arsen jî li gorî xwe tişteki dizanibû. Sedema tevgera wî ya bi vî awayî nepeniyek bû, ji Xwedê pê ve jî kesî ku vê nepeniyê dizanibû, tune bû.

Gelemperî denên me du reng bûn: Ên ji axa sor yanî rengheriyîn û yek jî yên keskesurîn. Me arvan, dan, nîskên kesk, nîskên sor, nok, fasûlî û bilxwir dixist denên rengheriyîn; penêrê helandî yê ku mîna gulikên por hatiye hûnandin û gihayê penêr ê hovî ku tev lê bûye, xwêya kevir, dims û rûn jî dixist ên bi keskesurîn.

Dema ku diya min hevîr dikir an jî mehîr çêdikir, motacî tişteki ji kulînê bibûya, bi destên xwe yên bi hevîr ji ber testê ranedibû; bangî min, birê min an jî xwişka min dikir:

"Keçe Anî, ji kulînê hinekî xwê bîne."

Xwişka min bi bazdan berê xwe dida denê xwê, qapaxa den a textikî ya gilover bilind dikir, kincê di bin de dida alî, radihişt qemçek xwê, qapax cardin dixist cî û xwê dianî dida diya min. Wê jî, xwê tevî hevîr dikir, di ber xwe de dua dipispisand û hevîrkirina xwe didomand. Piştî bêhnekê îcar jî ji bo tişteki din bang dikir:

"Sopêêê, ji kulînê lûlûkê bîne!"

Sopê xwişka min a dinê bû. Ji Aniyê biçûktir bû. Bi rastî navê wê ne Sopê bû, Ardemîs bû. Ji ber ku qamqut û giroverkî bû, ev nav bêhtir lê hatibû. Zemanekî li Amedê jinikeke qamqut û pîr ku navê wê Sopê bû, hebûye; zilamekî qamqut û kal jî... Navê zilam jî Xerepêt. A ha ji bo ku bîranîna wan

bijî, ji bo hurmeta bîranîna wan, ji tevahiya zîlamên qamqut re digotin Xerepêt, ji jinên qamqut re jî Sopê... Ev bûbû adet. Sopê û Xerepêtê boçî ji mêj de bûbûn komikek ax, lê bi sedan Sopê û Xerepêtê boçî yên ku dijîn, hebûn...

“Sopê, de haydê lûlûkê bînel!”

Ku Sopê diçû kulinê û dereng dima ji diya min dikir qîrîn:

“De haydê, çirçirkê... Ma lûlûk li ku ma?”

“Yadê, ma te lûlûk daniye ku? Ez peyde nakim. Ez nabînim.”

“Keçê ma çavên te kor in, Xwedê nehiştê ma tu lûlûka ji xwe dirêjtir nabîni?”

Bila Sopê li lûlûka ji bejna xwe dirêjtir bigere, sebra diya min nedima, qîrîniya xwe ducar dikir:

“Hey tu kor bibî... Keçê, hela li ba sêniya Anî û beroşa Apo binêre!”

Li mala me, bavê min Sike û diya min Hino, ji bo ku karên xwe hêsan bikin, di rojên pêş de di tunejiya wan de ji bo ku em, xweh û bira, di nav xwe de ji bo mîratê bi hev nekevin, şer nekin hinek qafûqul di malê de, bi navên zarokên xwe mêrûn kiribûn... Ji bo vê, ji beroşa sifir î ku nû hatibû kirin re digotin beroşa Apo, ji sêniya sifir re digotin sêniya Anî, yan jî tasa himamê ya Sopê û her wiha şixul hêsan kiribûn.

Sopê li ciyê ku dihat gotin lûlûk peyda dikir û bi gindiroşka mîna gohê dihat, dirêjî diya min dikir. Diya min destê xwe yên bi hevîr dişuştin, li ba “hebeş”ê çok dida, bizotikî venemirî di hebeşê de peyda dikir, rejî bi rêzeke xweş li dorê rêz dikir û bi lûlûkê dest bi pîfkirîna dikir.

Diya min wek ku li bilûrê xe, pifi lûlûkê dikir. Jixwe ev tişt ku navê wê lûlûk e, mîna bilûrê dirêj, weke wê ji hesinekî qalind pêk dihat. Ku te ji aliyekî ve pif dikirê ji aliyê din hewa derdiket. Ciyê ku hewa jê derdiket ji ber ku teng bû jî, hewa hebekî bi tazyîk, bi şid derdiket. Diya min nefesa xwe kûr dikişand, gepikên wê bi hewayê dinepixin, cudatiya wê û elokekî bi hêrs ji hev nedima. Û pîfkirina xwe didomand. Diya min ku çend caran mîna elokê nepixî, bi dengê tûj î ku ji dawiya lûlûkê derdixist hat wê rewşa ku elo-

kan jî bidexisîne, rejî yanî komir jî li hember ew qas hewldanê ji fediyar hêdi hêdi disincirî, sor dibû û bi rivînên xwe silav dida diya min.

Ku agir amade bû, sêling li ser “hebeş”ê dida rûniştin. Ji vêya re bi zarê diya xwe, ya rastî bi ermenkiya herêma me digotê “esgerenk” Sêl datanî ser gesgerengê. Sêl, evêya ku hûn dinasin, a ku nanê sêlê li ser tê pehtin, wesleyekî sacê yê ji hesin ku bi pihîneke li zikê xwe xûza wê hatiye dertxistin...

Ku sêl li ser agir sincirî û xwe di zikê dojehê de hîs kir, diya min li ser sêpêka textîn ê girover ê li teniştê xwe, bi destên xwe yên hosteyî girikek hevîr bi tîrikê vedikir, dikir nanê sêlê û diavêt ser sêlê. Nanê sêlê yê tenikokî li ber germiya sêlê xwe nedigirt, hema dihilpişî. Diya min nanê ku pijiyaye çawa zêft dikir, ew ji dojeha sêlê difilitand, diavêt ser kincekî li erdê, naneke din diavêt ser sêlê. Diya min çil pêncî carî eynî tişt dikir, me jî ew hunera wê bi balkêşî û bi sebir raçav dikir.

Nanê sêlê yê dawîn jî ku bi “xişt”înî dipengizand ser sêlê û bi “firt”înî dihat civandin û pê ve sebra me ya bê dawî diqediya, me dadida kulinê, her yekî/ê radihişt parçeyek toraq û em dihatin li ber diya xwe diketin rêzê. Wê, nanekî sêlê yê germ dida her yekî/ê ji me, me jî mîna zemanekî ku diya me em li pêçekan dipêçandin, nanê xweşgerm li toraqa xwe dipêça û bi kêf û henek û bi dilbijiyeye mezin dixwar.

Di demên dinê de diya me, ji me re “zingilik” dipeht. Zingilik jî ji hevîr dihat çêkirin. Wek ku berê jî min gotibû, em bi hevîr dihatin strandin û bi nan mezin dibûn.

Hûn ê hinek rûn têxin hundirê miqilkê, wê rûn bihele, ku çavî bi çavî li hundirê çavên we nihêrî, hûn ê kevçiyek hevîr bera ser din, wê hevîr di hundirê rûnê ku ji hêrsa xwe sor bûye de şaşwazî bibe û bimîne, tişteki ku bike nîn e jî wê hilpişe, bi giroverkî xûz bibe. Hûn wî rebenê ku di nav rûnê sor kirî de xûz bûye derxin û dimsê bera ser din û bi gilêza devê xwe bi noşican bixwin; bila qet şika we tune be ku tiştê we xwariye “zingilik” e.

Hevîrê ku li ser sêlê hatiye danîn, ji nanê

sêlê qalintir be, hema bibêje bi qaliniya ti-liya qelaqûşkê ya diya min be, wê demê hevîrê li ser sêla ku bi agirê bizotan ê sivik germ bûye, wê hêdî hêdî bipije û çiqas bipije jî wê çav bike we. Ku hûn rahêjin vî nanê xweşgerm, ku evqasî bi heyranî li çavên we dinihêre û bi awirên xwe yên ji serxweçûyî dilbijiya we zêde dike, têxin hundirê tepsî-yeke sifir û qelakirî, rûnê helandî yê malê yê xalis muxlis Qerejdaxî bera ser din, bi ser de jî di şekirê hûr an jî li gor xweşxwestina xwe di dimsê bidin û bixwin, navê tiştê ku hûn dixwin “nanê şilîkî” an jî “şilekî” ye.

Ha yek jî “cûmûr” hebû. Ku hevîr hat strandin, xaçek jî li ser hat çêkirin û ji bo ku tirş bibe ser bi kincekî hat nixumandin û li qorziya malê ya herî germ hat danîn pê ve; jî bo ku tirş bibe, jî libendemayînê pê ve tiştêkî ku bê kirin nedima. Her jî çi be, ez timî, her tim bi ser hevîrê ku tirş bûye û hindik maye ku ji testê derê ve dihatim... Diya min dibû heyrana vê di demhatina min, wê gavê testê hevîr datanî ser serê min û berê min dida firnê. Ev, peywira min a bê dawî û nediqediya bû. Min radihişt nanê ku pijiyane û ez vedigeriyam malê. Hê ku bêhna nanê germ î mîna misk û emberê li ser e, hê ku bi-xûra nan a germ belav nebûye, hê ku nan hebekî destên me dişewitand, em rûdiniştin, me çok dida erdê, nanê germ î teze hûr-hûrî dikir. Her wiha, nanê ku jixwe li firnê canê wî şewitiye, pijiyaye; îcar jî me ew dida ber qurincokan, parçe parçe dikir, ew poşman dikir ku çima afiriye û pijiyaye. Ku nan êdî ji nanîtiyê derdiket, hûrhûrî bû û hat şeweyeke ku ew jî nizane çi ye, nikare li ser rewşa xwe biryarê bide, me dawî li miraqa wî dianî, rûnê malê bera ser dida. Hê ku ew qenc bi ser xwe ve nehatiye, me ew xweşik bi dimsê tevlihev dikir û ew dikir girêk, êdî wî fêhm dikir ku hatiye kewitiya xwarinê û şikuriya xwe ji Xwedê re dianî... Me jî şikuriya xwe ji Xwedê re dianî ku cûmûr daye me. Ku hê diya min duaya şikranê dipispisand, ez bi girêkek cûmûr di dest de dipengizim kuçeyê, min parçeyek jî cûmûrê bi hevalê xwe dida tehmandin ku min tevli listika xwe ya darçoqîtîkê bikin.

Ez dixwazim vê ji êşkere bibêjim ku nanê hişk pir bi me xweş bû û me dixwar. Herê,

dema ku nan hişk bû mehdê me lê vedibû, em dibûn mîna gurên birçî. Nanê hişk, kevn, kartû ma mehde vedikir gelo? Erê vedikir! Ber bi êvarî, ku em ji dibistanê vedigeriyan, me bazdida cem diya xwe ya ku nîvê emrê wê li pêjgehê dibihurî:

“Yadê ez birçî me.”

“Yadê qurbanê! Binihêr ez mehîrê dikelînim, hebekî sebir bike, tu yê bixwî.”

“Lê ez pir birçî bûme. Ji nêzan ketime.”

“Wê çaxê here ji kulinê tasek mast bîne.”

Me mast dixist kîsên ji caw. Satilek mastê ku me ji sûkê dikirî, me berdida kîsê ku me ji cawê emerîkanî çêkiriye û ew bi ciyekî bilind ve dialiqand. Av bi “pit”îni ji kîs diniquitî. Ku “pit” diqediyar, hew deng didan, mastê ku ava wî qenc parziniye, ji mastîtiyê derdiket, te digot qey vediguherî rûnê malê. Ku me hinek mastê kîs dixist tasê û paşê jî ava wek qeşayê cemidî ku me ji çalê kişandibû berdida ser û têra xwe li hev xist, va ye dewê me yê pir xweş amade ye. Îcar jî dor hat ku em nanê hişk û kartû yê di malê de hûrik hûrik biçinin nav dew. Nanê me berî me dewê me bi dilbijiyeke xurt vedixwar û dinepixî. Me hew xwe digirt, berî ku dem derbas bibe me bi kevçî dadidayê. Ji ber vê dema ku diya me ji me re digot, “De here ji kulinê tasek mast bîne” me yek nedikir dudo, em dibeziyan kîlerê, me bi sernermî bi ya diya xwe dikir û em ji vê jî qet poşman nedibûn.

Me nan bi qinikên gûzan jî dixwar. Me ji kulinê, ji denê gûzan heşt neh gûz derdixist, çok dida erdê, bi kevirêkî hêdika gûz dişikandin ku qinikên wan nepelixin, qinikên ku me derdixistin piçik miçik me tevî gezikê nanê xwe dixwar. Me gezikên nan bi destan jênedikir, me dev lê dikir, bi diranan diqu-raft. Paşê li Stenbolê me bihîst ku nanxwarîna bi devlêkirinê şerm e, em ecêbmayî man... Halbûkî nanê herî bitehm û xweş ê ku mirov dev lê dike û dixwe ye. Herê, ez dizanim, mirov bi destan nan diqurêfe û dixwe. Me wilo jî dikir, lê encex di xwarinên mîna mehîr, çeçilmast, şorbeya nîskan, nok û fasûleyên hişk de me nan diçande xwarinê û paşê jî me bi kevçîyan êrîş dikirê.

Di cejnên pîroz de nanê me vediguherî “lewaş”ê.

“Sibê îd e, em ê lewaş bipêjin.”

Gotinên diya me yên wisa em ji berê de bextewar dikirin. Em li ser lewaşên pir xweş ên sorkirî diramiyan û girêza devê me diheriki. Kurteçiroka bi kovani ku Keşe Arsen li dêrê her sal bi ducariyan digot, êdî me tevan bi çavgirtî ji ber kiribû ku Îsa li çarmixê xistine û ew paşê vejyaye derketiye asîmanê jor ê bi rastî ev zêde ne li ser bala me zarokan bû. Ji bo me cejn yanî îd dihate wateya lewaşan û hêkên sor. Bi rastî ku em amin bibûna ku wê neçe guhên Keşe Arsen; me yê bi ya şeytanê ku em dizexitandin bikira û bipirsa ku gelo çima pêxemberê me Îsa mucîzeyêke nû naafirîne, ji bo ku me zarokan hê zêde şa bike hê zehftir namire û naveje ku di salê de çend carên din em têr kêf bikin û çima xwe nade ber vêya; lê em ew qasî ji ne bûmik bûn ku em nizanin bi ya şeytên kirin gunehekî çiqasî mezin e.

Ku me çend hêk dan ser hevîr û bire firnê, firinciye kurd dizanibû ku ya din rojê Cejna Hêkan a me gawiran, an jî ku em bi zarê wî bibêjin, a me filehan e.

Nanpêj, şeweyên ku divê bi hosteyî bida hevîr dida hevîr paşê hêkên xavî li bin guhên hev dixist dişikand û bi destên xwe bi ser lewaşan dida, di pey re jî li ser bêrê diediland û diajot firnê. Piştî çend deqîqeyan jî qapaxa firnê vedikir, nanên ku pijiyane derdixist. Lewaşên ku hêk di ser wan de hatine dayîn hê birqandî bû, te digot qey hê pijandî ji me re dikenyan. Êê, wê ev lewaş bi germî neyê xwarin? Bi destên me negirin! Tê xwarin him jî mîna hinguv, mîna qîmax. Lê em jî bir nekin ku tişteki din tu bidî ber lewaşekî wiha, bikî qatix û bixwî him şerm him jî tawan bû.

Hê ku zemheriya Amedê nehatiye, ji payîzê ve her kesî dest bi amadeyiya zivistanê dikir. Her malbatê li gorî kîsê xwe yan jî bi gotineke din, li gorî meziniya kulîna xwe yek, dudu, sisê, yan jî çar mih ser jê dikirin. Miha tevahiya tawanên xwe li ser çermê ku hatiye gurandin dihiştin û diketin distên sifir û tirtire, bi êzingên ku di bin distan de vediketin tehma dojhê ditehmandin û dibûn qelî û derdiketin. Rûnê ku di dista qeliyê de bi qultequltî keliya ku nanê bi tenikî

bûye felq di nav xwe de didît, bi şayî xwe lê dipêçand, felqên nan jî ji kêfan dîn dibûn, mîna sîngerê ew rûn vedixwarin. Ji bo mirov vî nanî bixwe, ne hewce bû ku mirov birçî bibe. Ku heta qirika xwe jî em bi xwarinê dagirtî, têrxwarî bûna jî dîsa me xwe nedigirt ev nan dixwar. Ji xwe vî nanê di hundirê dista qeliyê de kê rakira bernedida. Yê ku ecele nedikir jî kortika piştûyê xwe dixwîrand, bêheq xweziya xwe dadîqurtand.

Di kurdî de lawijeke wisa heye,

“Heta ku Xaço sax e,

Nan û pîvaz yasax e.”

Yê ku dizane jixwe dizane, lê yê ku bi kurdî nizane em jê re dibêjin ku pîvaz, bi tirkî “soxan” e. Nan û pîvaz, her hal, li her derê cihanê cotikekî xweş pêk tîne. Ji ber ku kurdan vî rastiya qenc dizanibûn, digotin rêya cezekirina filehan, yanî ya xaçoyan herî qenc ku mirov nan û pîvazê bi hev re, bi wan nede xwarin. Vêya bi vî gotina wecîz dianîn ziman. Heta ji min hat, min vegot ku em çî qasî ji nan hez dikin. Lê nuqteyêke dawîn heye ku, ez nikarim di ser re bibihurim: Ku we heta îro nanê kufnikî nexwaribe, bi misogerî hûn jî vîya bawer bin ku, çenika aqilê we, bi qasî pîneyê biçûçik di delinga pîrika min î ji pazên jî tune ye.

Dapîra min, pîrika min, radihişt parçeyekî nanê ku kufnikê avêtîyê, kufnikî bûye, diçû li ber deriyê me yê kuçeyê xwe diavêt erdê, rûdinişt. Tasek ava cemidî mîna qeşayê ku ji birê kişandîye jî datanî ber xwe, paşê jî bi destên xwe yên ricifokî av bi ser vî nanî de direşand. Parçeyê nan, ku ava mîna qeşayê di piştûyê xwe de his dikir, dinepixî, dibû tişteki mîna beqlaweyê. Pîrika min ev beqlaweya kufnikî di gepên xwe de dicût û hey dicût. Ku ger çend firdik ji ber xweşxwarina pîrika min zêde bimana, dor dihat mirîşkên me yên di koxê de. Pîrika min radibû ser xwe, firdikên ku rijiyabûn ser pêşmala xwe mîna nanê pîroz di kefa destê xwe de dicivand, berê xwe dida koxê û bi dengê xwe yê ricifokî bang dikir:

“Tûû, tûû, tûû...”

Wateya van “tûû, tûû, tûû”yan di zimanê mirîşkan de pir û pir kûr bû:

“Nan, nan, nan...”

Dawiya temenê defterê

Cîhan ROJ

Her însanek xwediyê defterekê ye. Deftereke min ya dehsalî heye. Êdî peritî ye. Hin nîşeyên li defterê lêkirî bi tevî hin kurtenêrînên di nivîsên cûr bi cûr de pêşkêşî xwendevanên Kovara Wyê dikim.

Heskîf û Mêrdîn du ciyên bi wate ne di jiyana min de; ez dikarim bibêjim piştî xeyal û hîsa van ciyan tehma dîrokê û serboriyên însên ên di dîrokê de, zimanê îşaretan û hêza rengan a estetîkî tevî dil û hişê min kirin. 2009

“Têmaya dê û lawik wekî çavkanî xwe dispêre şayesên Meryem û Îsa. Ev di wêneyên înterîor yên di sedsala hivdehemîn de li Holandayê tê dîtin.” Piştî min ew agahî xwend helbestên Rênas Jîyan ên di ‘Janya’yê de bi bîra min hatin. Têmaya dê-lawik di Janyayê de xwe dabûn der. Dîsa em agahiya ,”Jinên bîaqil-jinên kêmaqil wekî babet ji Încil hatiye girtin” bi-fikirin wê risteya Cîgerxwîn bi bîra me were:”Jin hene, jinkok hene”

Gelo peyva ‘Janya’ çi wext tevî edebiyat û zimanê me bû? Ez ne şaş bim cara pêşîn di çîrokeke xwe de (rojnameya Welat) min wekî navê lehengeke çîrokê bikaranî. (Di zarokatiya min de bûkek ser bi xêlî ya bi navê Asya, miribû, bandor li min kiribû. Navê wê ji bo navê Janya ji min re bûbû bingeş) Lê tiştê ku bû sedem ew peyv bibe navê zarokan, bi însanan şîrîn were, helbet hêz û bedewbûna helbestên Rênas bû, dosyeya Rênas bû. 2003

Di sala 2007’an de di Rojên Çîrokê de ez axivîbûm û ew axaftin wekî nivîs di Diyarnameyê de hatibû weşandin. (11.02.2007 Diyarname) Ji wê nivîsê paragrafêk:

“Li gelek bajaran, li gelek deverên hin bajaran jîyan bi ser zar û ziman neketiye.

Reng lê çilmisîne. Însanên wanî, em dikarin bi navê masiyên bajêr binav bikin; belê, jiyana wan însanan û jiyana masî lihev dikin. Li perên bajaran bê av mane...”

“Min xeyal dikir ku bibim nivîskar. Derket holê ku agahiyên derbarê hêlên insan yên fîzyolojîk, bîyolojîk û patolojîk divê. Bijîşkî rê dide, dibe sedem mirov bi insanên ji gelek tebaqe û çînan re têkiliyê dayne.” (*Vikent Vikentyevîç Veresayev, çîroknûseki Êris*)

Ji nîfşê nodî jê gelek nivîskarên me mamoste bûn. Hêja ye ku insan bifikire û lê bikole bê gelo vî pişeyî çi derfet da nivîskariya me, lewre zarok awêneya jîyan û civakan in. 2004

Gerek helbest ji sînor û baskên ayet û hedisan dakeve û bi nav sikakên xwe bikeve. 2001

Mimkûn e ku nivîskar carinan li hember berhem û xwendevan desthilat be. Rexnegir li hember desthilatiya nivîskêr tovê birêxistinbûna xwendevan diweşîne. 2006

Em nas û dostên wê ji bo wê dibêjin, Helbestvana Veşarî. Behsa Ayten Çaçan dikim. Em çiqas pêşniyar dikin dosyeya xwe biweşîne jî ew bi ya xwe dike. Ez ji hevjinê wê Loqman jî bi gazin im; di warê ziman de gelek şareza ye lê nanivîse. Helbet mamostetiya bi dehan kesan kir. Min pêşniyara konferansa nivîskaran li wan kir. Ew xwedî li pêşniyarê derketin. Bi wî awayî dê nivîskarên kurd hay ji hev çêbûna û yekitiyek bihata sazkin. Belê pêşniyar ya min bû lê ked, hewl û rûmeta wê konferansê aidî Ayten û Loqman e. 2001

Çar çavên me hene, çar guhên me, du dilên me ... Helbet bi dehan' zimanên' me hene! 2006

Îro pirsgirêka bingeîn bi tevî xwendevanan gelek helbestvan jî bi wateya peyvên ya wêjeyî nizanin, an jî peyvên di siya wateya peyvên biyan de difikirin ev jî kuştina peyv û berhemê ye... Ji hêlekê ve helbest dişibe ewrekî tenik û vekirî; hilma jiyanê bi tîna dilê helbestvan li hev dicive û reng digire. Tîna dilê helbestvan jî di peyvên de veşariye. Di nav jiyanê de jiyan û gel gelek peyv jî martine û her yek jê wekî hespekî şê amade ye. Bikaranîna peyvên wanî çî qas honazî bivê jî honaziya herî mezin ew e ku însan wateyê li peyvên din jî bar bike... 2001

Di helbestê de gelek têgihên wek ziman, naverok, deng, reng newa û rîtm, hêma, nexş, vehewîn, bijartin, hûrikhunandin, ziravî û zelalî, ked, karkerî, his, pêjn, teşe û şêwe hatine vekolandin û veçirandin. Ji helbestvanan jê hinan jî bi hişmendiya "Gotinek serê hezar gotinê dibire." ev têgihên hanê bi awayekî kin derbirine. Jê yek jî Goran e.

"Şî'irî ciwanit ewê qurban şî'irî ciwan,
Şî'irek geşew zerdexene ba be jiyan"
(Bo gewreyekî şî'ir—dost) 2001

Îrfan Amîda, "Xelk (hevalên me) helbestên xwe jî bo dosyayan jî xelkê vedîşêrîn lê tu radibe gişan li ber radixe." 2001

Çend nîşe ji konferansa nivîskaran:

Hin nivîskaran jî rexne û pêşniyaran bêtir girîngiya çand û zimên dan pêş. Hinan jê têgeh derxistin pêş. Hinan kovar û sazî kirin navend. Dîsa hin kes li ser rewşa têkiliyên zarava û wêjeya çar parçeyan rawestiyên. Dîsa pirsgirêkên perwerdehî, weşangerî, têkiliyên siyasî û wêjeyê, rewşa nivîskaran, têkiliyên nivîskar û saziyan, nivîskar û civakê, nivîskar û siyasî, berpirsiyariyên nivîskar jî di nav axaftinan de hate derkirin. Dîsa hin kesên ku di saziyan de beriya niha xebitîbûn têkiliyên di saziyan de

rexne kirin. Bi taybetî û bi tundî hate rexnekirin ku kesên di saziyan de bi zimanê xwe naaxivin. Ne di civinê de be jî hin rexneyên wan kesan jî hatin rexnekirin ku çima di wexta wext de rexneyên xwe dernekirine. 2001

Di gotegot û çîrokan de forma weke "Li paş heft deriyên hesin..." dest pê dike di xwe de xem, êş, neçarî, hêvî û hewlên têkoşinê di hewînê; ev, derbirîna kareseta nîrxên digirtî ye, carna bedewek e xwe jî dêwan diparêze, carna egîtek e jî dinyaya tarî hewl dide ku derbikeve, dinyaya ronî carna evîneke bi birîn e, carna jî hêviya herî mezin e ku di kesayetiyên de bi gewde dibe. 2001

Di zimanan de hinek peyv hene ku dişibin jiyanî mitribiyê. Ew her ku bi kesan xweş neyên jî di nav xwe de bi coş û dilxweş in. Pirsgirêk ne ya wan e. Ew însanetî û dîlsozî bi me re nîn e ku em hêla wan ya xweş binasin. Behsa wan peyvên dikim ku di her zimanî de cî wergirtine û tu sînor û zagonan nas nakin. Jiyanê wan ya azad û xweş heye, ji zagon û xelean hez nakin. 2003

Bi pencikan bi kevirên almastî ketine ku peyvên hevrişimî birêsin. Siwarê ziman, çemên hestan in hin jê; kêrê li birîna peyvên didin, xêliya reş jî ser eniyên gewer diavêjin, bi baskên hevrişimî ber bi welat ve dişînin. Dîsa yê ku însan di bin baran û bagera peyvên de şilfitazî di hêla û hiş li însan dike hevîrê strayî ew in bi qasî bejnek rojê jî welatê xwe dîr.

Ziman li hember dagirkeriyê kirine kevir û pola. Bi tevî van ê ku helbest li ser çonga însan dike biskên yara şîrîn û carinan wek xezalekê jî însan dîrevîne û bêhnê li însan diçikîne, carina jê jî însan diqehirîne ew dilê wan ê serberedayî ye...

Jê hin pênuş li bin dilên bi xem û birîn kirine hêlkan; peyvên wan peyayên kolanên Mêrdîn, bi şahidiya xwe derî li odeya bîranînan vedikin. Şingîna zengilê hin helbestan e li govenda pênuşan... Ev bîstanekî li geliyekî kûr e; koremişk li zinaran asê dimînin... Reş li bejna vî zimanî nayê, ji rengê biharan

dipişkive... Hewrek berfê ye li rojê dikele...
2003

Carekê yek diçe mêvaniyê. Çar roj lê di-
buhure naçe. Mazûvan ji kevaniyê re, "Ka cil
û bergan biavêje derve, êvarî mêvan hat ku
çav lê bikeve belkî biçe." Êê, ev mêvan e, rê
ji zû de li xwe kifş kiriye, êvarî "wey Xwedê ji
te razî, ev xesîl besî min e, ji xwe pêxember
jî li ser xesîlê rûniştiye" dibêje.

Roja mayî mazûvan riyeke din dide ber
kevaniyê, "xesîl mesîl, hemî tiştan biavêje
derve û avê berde malê."

Dîsa li wan dibe êvar. Mazûvan û mêvan
tên mal. Mêvan li avê dinihêre, bi dilekî asan
gotinê der dike:

-Ev dilê me bi hev re rast e, baş e ku we
av rijandiye, do kêçan em peritandin!

Xwediyê malê xwe ranagire:

-Ma tu kî yî?

-Ez xwarziyê Xwedê me..!

Xwediyê malê bi hêrs radihêjê, wî dide ser

milan dibe diavêje hewşa mizgeftê û dibêje,
-Ku tu xwarziyê Xwedê yî, ev e mala
Xwedê....

Hûn jî wekî min gelek caran gotina,
"Ziman çiqas şîrîn e" dibihîzin ne? Hûn jî bi
ihtimaleke mezin bi awayekî mîna min bex-
tewar in lê ji sedî sed her kes jî min bêhtir
bextewar e ji ber ku pirî caran hinek peyv
dibin zebanî, dibin gûzan li ser rihê min,
dibin gurê har bi canê min dikevin; hişk in,
sar in, bêhna kufikê bi ser wan ketiye. Belkî
neçariya zimanan a herî xedar ev rewş e; tu
ziman nikare bêtî wan peyvyan bijî jî. 2007

Li Gimjimê biwêjên wekî, "Bi pûşê xwe
zanîn, pûşê yekî/ê avêtin" tê bikaranîn;
pûş tê wê wateyê ku hûn hêlên lawaz yên
xwe û yên kesên din destnîşan dikin. Ger
di civakekê de gengeşiyên jî bo rêdana
pûş dest pê kiribe ev destpêkeke bi wate
ye. Ne wanî be wê her tişt sergirtî bimîne
û bêhn pê bikeve. 2007

Dolên Ristemî

Xecê OMERÎ

Li xayiziya kemanê diingire xunav
Xwe ji arika esmanê reşeqetranî ve
Di valahiyên bêna de wer dike
Çilkên narîn bi axa stewr şa dibin...
Û destnimêja sedsalan dişikê
Dolên Ristemî dibizirînin malzaroka axê
Ji bo tayekî bi tenê...
Heft şev û heft rojan di sicûdê de dimînin
Pîrejinên çira malê vemirî û bê semyan
Qewmê ku bi hebûna xwe re dibelhezîn
Bi vejîneke nû di binê zinaran de diseridin
Bûkên gûlîbir û rûdirandî
Ji nû ve hine dikin destên girtî
Qebeqeba kewan e!
Vê carê ne ji dijminahî, ji dostanî...

Dîwaneke avangard

Fewzî BÎLGE

Wênesaz û helbestvanekî roja me, hûn-
nêrmendekî ciwan e Ehmed Ronîar. Bi dî-
wana xwe ya dawî angû bi “Pevşabûnên Şîn”
dike ku em di derbarê helbesta kurdî ya
nûjen de bibin xwedî gelek pirs. Dîwana wî
ya dawîn ne berhemeke ku em lê binêrin, bi-
zivirînin vî alî wî alî û deynin cih. An jî di pir-
tûkxaneyî xwe de bikin amûreke rewşê. Ma
bi tevahî dîwan ne ya ku li ser gerdûna sa-
zûmana xwe, xwe damezirandiye ye. Ew ne
tenê heybereke çarqorzi, di nava wê de çend
helbest, xwedî naverok û formekê ye.

Di pêvajoya em tê de dijîn
de ji bilî çend nîqaşên sivik û ji
rû de, -çend kesên tenê bi çav-
ekî hatine dîtin û nirxandin-
ne tê de tu kesî tu kes -hel-
bestvan- weke ku heq dike ne-
nirxandiye, bahoze ranekiriye,
nîqaşên ku malî civakê bibe û
bike ku helbest di nava dîrokê
de cihê xwe yê giran bigire ne-
kiriye. Weke ku tê zanîn pêş-
ketina dîroka hunerê di
demên diyar de -ku ev dem gi-
rîng in- bi xêra kes û berhe-
mên wan ên avangard pêk
tên.

Bi saya serên wan kesên
serhildêr, bizavên nû deng didin, pengav û
pêşketin pêk tên. Bi saya serê wan kesên
serhildêr hebanoka hunerê bi hêztir dibe û
ji pêvajoyên nû, ji pêşerojê re dibe mîrate-
yên xurt. Di dema ku em dijîn de him li din-
yayê û him jî di civaka me de kesên
pêşawayên ku dikaribin dinyayê li bin guhê
hevdu bixin, qalib û qilişeyên berê li bin
guhê erdê bixin, di qalib û kirasên heyî de
hilneyên, nexwazin tê de hilên pir kêr in.
Ehmed Ronîar helbestvanekî avangard e ku
di roja me de dijî. Di helbestên E. Ronîar de
xwîner piştî ku wan bixwîne êdî zor e ku
wan ji bir bike. Helbestên wî êdî xwîner rihet
nahêlin, wan li ber bahozean dixin, wan dibin

paşeroj û pêşeroja wan, wan dixê nava gerî-
nekên zemanê ku ciwanbûn, evîndarbûn,
dîn û harbûnê.

Xwîner nikare piştî ku helbestên wî
xwendin wan biavêje. Ger ew biavêjin jî hel-
bestên wî dev ji wan bernadin, bi bestika
wan digire, dihejîne û bi ser wan de diçin. Ji
ber ku êrîşî nîviyên wan î vala dikin û dema
ku wî nîviyê xwîner ê vala dadigirin, wan
naxin nava xeweke giran, berovajiyê vê wan


dixin nava livekê û bi xwe re
dikişkişînin nava zemanekî ku
mirov him dikare dema tê de ye
bijî û him jî dikare dema boriye
de bijî. Ji ber vê jî rihetiya xwî-
ner û tiraliya xwîner jî holê ra-
dike.

Helbestên wî hêza xwe ji du
têgihan digirin. Yek jê pêşeroj
a dîn jî paşeroj e. Têgîna yeke-
mîn; ya ku xwîner hişyar dike,
difikirîne û qilişeyan dişkîne û
dikişkişîne nava zemanê niha.
Têgîha duyemîn jî; bandor li
ser can û cesedê xwîner dike,
ya ku rîman tê de radike û dibe
paşeroja wî ye. Ev her du hêlên
ku bandorê li ser xwîner dikin

di yek demê de navberêkê dixê nava xwe
û wan, ev navbera raman û fikiran e. Ev en-
camek e, encama ku xwîner xwe bi berhemê
re dike yek perçe ye. Pêvajoya kelijandina du
zemanan, du hêl û du jenerasyonan e. Xwî-
ner wê di helbestên wî de tu carî tenê çîroka
kesekî, evînekê, welatekî, êşekê û kêfê ne-
bînîn û fêr nebin.

Tam wê dema ku bibêje va ye min tiş-
tek zeft kir de wê li tiştêkî din biqewime
ku ev tişt wê wan xafil zeft bike û bi şûn
de ber bi paşerojê ve bivirvîrîne û bi şid
dîsa şûnde vegerîne. Wê wan têxe nava
zemanê ku a niha tê de dijîn û wan ra-
westîne, bifikirîne û bihejîne.

E. Ronîar bi vê helwestê sinorê helbesta



kevneşopî hildiweşîne. Bi pisporî terza xwe diafirîne û xizmetê ji helbesta nûjen re dike, lê him rêza xwe û him ji ya me li himber helbesta klasîk ji zêdetir dike.

Bi aliyekî ve ji mirov bi hêsanî dikare bêje ku helbestên wî giş di derbarê wî de ne, tiştên wî û helbesta wî xwedî kirine, rêhevaltî bi wî re kirine ne.

Ji aliyekî ve helbestên wî xwedî paradigmayekê ne û ev paradigmaya di naveroka helbestên wî de bi awayekî eşkere xuya ye. Bi aliyekî xwe ji bi helbestên xwe xwestiye paradigmatîkî heyî hilweşîne. Berhem bi du hêlên xwe xwedî paradoksekê ye jî. Ji aliyekî ve helbestên wî giş di derbarê wî de ne, ji aliyekî din ve ji ne di derbarê wî de ne.

Di naveroka helbestên wî de çandeke li ber wendabûnê, zimanekî roj bi roj tê ji bîr

kirin. Û ji hêla veşartî ji hilweşandina tiştên heyî, tunebûna ramanên ku mirov têr bike, tunebûna ramanên metaforîk ku cihê mirovên vala bûne digirin. Mirovan diwarqilînin, zeft dikin û bernadin, di vê derê de ji helbestvan kiriye ku ew tiştên ew li ber ketiye xwîner jî li ber bikeve.

E. Ronîar di helbestên xwe de cih ji her tiştî re veqetandiye. Di pêvajoya ku em dijin de ji ber gelek sedemên netêrbûna giyanên mirovan, mirovên ku zivirîne heyberan, lêniherînên wan ên vala û bê wate, mirovên qaşo nûjen in ku zivirîne cendekên mirî ku bi awayekî mirî li mirovan dinihêrin ji helbestên xwe re kirine ristên lîrîk. Bi saya wan hêmanên ku ji ristên helbestên xwe re kirine kompozîsyon ji kiriye ku berê ramanên me yên rûtîn biguherîne.

Şengul OGUR

Kolan û Kalan

Kolan li gel ewteewta kûçikên şevê
li ser milan barê bajêr
bêdeng dibihure di riya xwe de
mîna marên kalanê xwe avêtî
li du xwe dihêle siyên bê cendek
berên risas û qisasên şanaz!

û li sergoyan zarokên rûqemerî
bi awirên qerimî
di oxirvedana rojê de bêhêvî
di bîrên bîranînên bi kevz de
avjeniyê dikin û perwaz dibin
çend kevok ji nişka ve ji ser bîrê
bi baskên birîndar
li şûna kolana ku çûyî
dinikilînin kalên
kalên dinikilînin

**Vê helbestê di 13. pêşbaziya çîrok û helbestan
a Huseyîn Çelebî de xelata duyemîniyê girtiye*

Mehabad

Şêst sal in vêxistî ne
Çirayên şîngiriya min
Ji şahiya ji salekê
Yek meh(abad) kê de
Şêst sal in derizîne
Hemû şibakeyên min
Di zivistana bindestiyê de
Diqufilin
Şêst sal in dohn in
Rondikên min ji finda çarçirayan re
Diniqutin, dinuqutin, diniqutin!..

Dosye: Romana kurdî -II-

Amadekar:
Elîxan LORAN



✓ Nîfşê bêjî qeyikên romana kurmancî di nav
pêlên siyasetê de

Helîm YÛSIV

✓ Çend dîmenên reşbîn / Çend dilopên ji ro-
manûsiya min

Pirdengiya hewldanekê

Yaqob TILERMENÎ

✓ Roman navê guhertinê ye

Medenî FERHO

✓ Ber bi romana kurdî ve

Hesenê DERWÊŞ

✓ Muzexaneyê kulan û vegotina banî

Yunus EROGLU

Bi beşa duyemîn ya dosyeyê em ligel hev in. Em dikarin bibêjin ku dosyeya romana kurdî -I- baş hate xwendin û ecibandin (*Em vê meseleya xwendin û ecibandinê ji tiliya xwe bêhn nakin, ji ber ku çi bi gotinên rû bi rû, çi bi name û bi peyamên xwendevanan em hatin ser wê baweriyê ku dosye hatiye xwendin û ecibandin, bêguman rola CDya dokumentera Cegerxwîn ji heye, kir ku kovar were firotin.*)

Me di beşa yekemîn a dosyeyê de, şewaza guftûgoyê hîlbijartibû da ku bi hev re ahengekê saz bike. Di vê beşa duyemîn de jî, me ji nivîskaran nivîsên li ser romana kurdî xwestin ku bila çarçove û stratejiya nivîsên xwe ew diyar bikin. Ji ber vê yekê jî beşa duyemîn a dosyeyê li gorî beşa yekemîn bêtir *serbest* e. Wekî nimûne Helîm Yûsiv di nivîsa xwe de ji rewşa siyasî ya sedsala bîstan a kurdan tê romana kurdî û nivîsa xwe ji ser vê yekê li ser romanûs Mehmed Uzun didomîne. Dîsa wekî nimûne, Medenî Ferho li ser paşxaneyê romana kurdî radiweste û li ser vê paşxaneyê, kaya romana kurdî ya kevn û nû dide bê.

Bêyî ku em bibêjin “Ji bo romana kurdî çend roman û çend roj man?” fermo beşa duyemîn a romana kurdî!...

Nifşê bêjî, qeyikên romana kurmancî di nav pêlên siyasetê de

Helîm YÛSIV

Mebesta min ji nifşê nû, nifşê me ye, ew nifşê ku di navbera salên 1990'an heta 2010'an bi nivîsandina roman, çîrok û helbesta kurmancî re mijûl e. Zarokê bêjî, ew zarok e yê ku diya wî tê naskirin, lê bavê wî nayê naskirin, anku "bê bav" e. Di civaka me de, ev peyv wekî dijûn, sixêf tê bikaranîn. Jixwe di civakeke nexwendî û ji zimanê xwe dûrketî de, nivîskarê wî zimanê ku "bi kêrî tiştekî nayên" wê mîna bêjiyekî ku bi kêrî tiştekî nayê bê nîrxandin.

Mebesta min ew e ku "dê"ya me, dikare wêjeya kurdi an jî zimanê kurdi be, anku di-yeke naskirî ye. Lê "bav" bi gotineke din, pişt, xwedî li meydana nîn e. Ew bav dikare dewlet be, dezgeh be, partî be an jî aliyekî xwediyê îmkânên aborî be dibe jî ku xwendevan be.

Ji bo vî nifşê ku bi nivîsandina romana kurmancî -ku mijara me ya vî nivîsê ye- mijûl e, yek ji van "bavan" heye yan tune ye?

Em ê di vî nivîsê de bi mînak û şîroveyan, li bersiva vî pîrsa wêjeyî û siyasî bigerin.

Romanivîsên destpêka pêvajoyê (1930 - 1980)

Dema mirov li pêvajoya wêjeya kurdi ya van sed salên dawîn binihêre, yekemîn xala ku bala mirov dikişîne ew e ku ev wêje bi temamî ji nav kûrahiya siyasetê derketiye, wisa jî heta qirîkê di nav siyasetê de maye. Ev diyarde mirov vedigerîne çavkaniyên xwe ku ew jî paşxaneyê dîrokî, cografî, civakî û siyasî ye, ya ku rewşa kurdan a siyasî û perçebûna Kurdistanê di nav çar dewletan de bi xwe re anî. Bi awayekî ku kurd di nav dewlet, millet, welat û zaravayên cuda de hatin parvekirin. Hemû hewldanên wan yên civakî, siyasî û wêjeyî, roman jî di nav de, xwe dispêrin çavkaniyekê, ew jî ev e, têkoşîna kurdan a siyasî ji bo bidestxistina

mafên xwe yên rewşa. Giringtirîn rûdanên siyasî yên vî demê li rojhilat damezirandina komara Kurdistanê li Mehabadê bû, 1946 û hilweşandina wê ya piştî yazdeh mehan. Li Başûr jî şoreşa êlûna 1961'ê heta 1975'an a bi serokatiya Mele Mistefa Berzanî bû. Ji bo kurdên li kafkasyayê jî bandora ramanên şoreşa oktobra 1917'an û damezirandina Sovyetê bû.

Ji ber vî, eger em li jînenîgarî û berhemên romanivîsên damezirînerên vî pêvajoyê hûr bibin, her sê navên sereke yên ku di navbera salên 1930'î heta 1980'an de tên beramberî me ev in: Erebe Şemo, Rehîmê Qazî û Îbrahîm Ehmed.

Erebe Şemo: Endamê komîteya navendî ya partiya komonîst a Ermenistanê bû.⁽¹⁾

Rehîmê Qazî: Endamê komîteya navendî ya partiya demokrat a Kurdistanê-Iranê bû.⁽²⁾

Îbrahîm Ehmed: Yek ji serokên partiya demokrat a Kurdistanê-Iraqê bû.⁽³⁾

Hêjayî gotinê ye ku naverokên her sê berhemên wan jî heta radeyeke mezin di bin bandora vî mijûliya wan a siyasî de mane.

Weku tê zanîn yekemîn romana kurdi "Şivanê Kurmanca" ya Erebe Şemo ye ku di navbera salên 1930'î û 1935'an de hatiye nivîsandin û weşandin. Ew wekî bavê romana kurdi tê binavkirin.

Li pey wê qonaxê, di navbera salên 1950'î û 1970'yan de li Kurdistanê, li Başûr romana "Jana Gel" ⁽⁴⁾ a Îbrahîm Ehmed û li Rojhilat romana "Pêşmerge" ⁽⁵⁾ ya Rehîmê Qazî weku romanên wê qonaxê tên naskirin. Her wisa romanên Eliyê Evdîrehman, Xatê -1959- û Gundê Mêrxasan -1968-⁽⁶⁾ û romana Heciyê Cîndî Hewarî -1967- di wan salan de li Êrîvanê -Ermenistanê- hatin weşandin.

Xalên hevbeş di navbera her sê romanên

- Şivanê kurmanca, Jana Gel û Pêşmerge-
û her sê nivîskarên wan de ew in ku hem
berhemên wan, ji hêla naverokê ve, di bin
siya siyasetê de ne û hem jî ew bixwe di pi-
leya herî jor a hêzên siyasetê de cih digirin. Bi
gotineke din, roman di jiyana wan de jî pro-
jeyeke wêjeyî bêtir mîna alaveke siyasetê di-
hate nîrxandin. Di ber karên xwe yê siyasetê
re dest diavêtin nivîsandina romanê. Bi
awayekî ku bîr û baweriyên xwe yê siyasetê
rasterast li romanên xwe bar dikirin. Di vê
çarçoveyê de, hinekî rewşa Heciyê Cindî û
Eliyê Evdirehman cuda ye. Malbata Eliyê
Evdirehman ji Wanê bar dike Qefkasyayê. Li
wir li Êrîvanê xwendina mamostetiyê diqê-
dîne. Ew wekî leşkerekî di nav refên artêşa
sor de tev li şerê cihanê yê duyem dibe. Li
Bakuyê jî xwendina pedagojiyê diqêdîne. Ji
1955'an de heta mirina xwe 1994'an weke
redaktorê rojnameya Riya Teze dixebite⁽⁷⁾.
Wisa xuya ye ku, beşa mezin ji jiyana xwe
weku rojnamevan kar kiriye. Jiyana Heciyê
Cindî jî ku malbata wî ji aliyê Qersê bar ki-
riye Qafqasyayê û li wir pedagojî û filolojiyê
dixwîne û jiyana xwe bi karê rewşenbîrî û
çandî derbas dike⁽⁸⁾. Ji rojnamevaniyê hetanî
bi karê radyo, hetanî bi amadekirina alfa-
beya kirilî ya ji bo kurdî û her wisa.

Xala hevbeş di nav van her pênc berhe-
mên dirokî yê girîng ew e ku hemû piştî
salên heftê -1970- bi kurmanciya tîpên la-
tînî derketin. Tevî ku yekem çapa "Şivanê
Kurmanca" bi kurmanciya tîpên latînî ha-
tibû weşandin⁽⁹⁾, lê bi alfabeya kurdên Sov-
yeta berê derketibû ku hinekî ji alfabeya me
ya niha cuda ye.

Di van salan de çend romanên din yê
Erebê Şemo derketin, Jiyana Bextewar -
1959-, Dimdim -1966- û Hopo -1969-.

Rawestgeheke girîng, Hawar

Girîngtirîn rûdana diroka kurmançî der-
ketina kovara Hawarê 1932, 1945 û berhe-
mên nivîskarên wê bûn. Mîr Celadet Alî
Bedirxan jî di nav de, hema hema hemû ni-
vîskarên wê birêveber û çalakvanên siyaseta
kurdî bûn û piştî şkestina şoreş û serhilda-
nên kurdên bakur berê xwe dabûn Binxetê
-Sûriyeyê-. Li wir jî gelek ji wan dîsa bûn

serok û birêveberên tevgera siyasî, bi taybetî
Osman Sebrî û Nûredîn Zaza ku serokatiya
tevgera siyasî ya kurdên Sûriyeyê kirin. Yan
jî ji Binxetê beşdarî tevgera siyasî û çekdarî
ya kurdên bakur dibûn. Wek mînak, piştî
şkestina serhildana Şêx Seîdê Pîranê -1925-
bi her awayî hewl dan ku tev li şoreşa Agirî
ya Îhsan Nûrî Paşa -1930- bibin. Di vê çar-
çoveyê de rêxistina Xoybûnê 1927-1947 ya
ku serxwebûna Kurdistanê dixwest bi destê
wan hat damezirandin. Bi têkçûna hewl-
danên wan ên siyasî re dest bi karê wêjeyî
û çandî kirin. Ji bo hinekan jî wan jî ev
karê wêjeyî şeweyek ji şeweyên berdewa-
miya karên siyasî bû. An ku tenê ji bo pê-
kanîna armancên siyasî dest diavêtin
karên wêjeyî. Bi vî awayî wêjeya kurmançî,
bi helbest û çîrokên xwe, bi nivîs û serpê-
hatiyên xwe, bi ziman û alfabeya xwe, li ser
destên wan rewşenbîrên ku ji qada siya-
setê dihatin, hat holê.

Wisa tê xuyakirin ku ne tenê roman, belê
wêjeya kurdî bi giştî, bi taybetî ya kurmançî,
berhemek ji berhemên siyasetmedarên kurd
û siyaseta kurdî bû. Heta dawîya vê qonaxê
jî wêjeya kurmançî mîna balindeyeke birîn-
dar di nav derbên dagirkerên Kurdistanê de,
bi zor û zehmet, bi destê têkoşerên kurd jî
mirinê dihat rizgarkirin. Rast e, dihat riz-
garkirin, lê ji ber ku ew rizgarkirin û berde-
wamî bi destên têkoşerên qada siyasî bûn,
ne bi destên têkoşerên qada wêjeyî bûn, ev
wêje hem lawaz, hem jî ji sûdwergirtina ji
pêşketinên teknîkî yê girêdayî form û ho-
nandinê yê di wêjeya cihanê de hatibûn
holê, bê par mabû.

Mirov dikare bibêje ku siyasetê roleke
dualî list. Ji aliyekî ve roleke erênî bû ku di
parastina ziman û damezirandina alfabe û
nivîsandina berheman de bi dimen dibe.
Aliyê neyênî yê mijarê jî ew e ku wêjeya
kurdî mabû dil û hêsa mijarên siyasî û bi
çavê alaveke siyasî lê dihat nihêrîn, ne ku bi
çavên wêjeyî û hunerî. Tunebûna pisporên
wêjeya kurdî, yê ku karê rêxistinî û siyasî
yê rojane nekin, zirareke mezin gihand
asta hunerî ya berhemên wêjeya kurdî. Her
wisa ev bandor li cem salên heştêyî jî nehat
rawestandin. Rola siyasetê her ku çû zêde-
tir bû, lê reng û awayê xwe guhert.

Ji bo ev nirxandin zelal bibe, divê mirov vê pêvajoyê, bi taybetî di warê romanê de, bişopîne.

Romanivîsên navbeynkar an yên “pir” 1980-1995

Dîmenê perçebûn û belavbûna kurdan çawa ye, wisa jî romana kurdî xwe dispêre wî dîmenê belawela. Ka em li gor sala weşanê, bi mînakên çend romanên vê qonaxê destnîşan bikin:

- Romana Kurdê Rêwî ya Seîdê Îbo, 1981.
- Romana Xanê ya Birîndar, 1982.
- Romana Soro ya Birîndar, 1983.
- Romana Pala Bêşop ya Xemgînê Temê, 1983.
- Romana Hêlîn ya Mahmûd Baksî, 1984.
- Romana Tu ya Mehmed Uzun, 1984.
- Romana Dê û Dêmarî ya Egîdê Xudo, 1986.
- Romana Stokholmê Te Çi Dîtiye Bêje ya Bavê Nazê, 1987.
- Romana Wendabûn a Şahîne Soreklî, 1987.⁽¹⁰⁾
- Romana Zeviyên Soro ya Nûrî Şemdin, 1988, ku ew bixwe Nacî Kutlay e.

Ev deh roman mînakên vê qonaxê ne. Di nav van nivîskaran de hinek hebûn ku tenê ew roman nivîsandin û rawestiyên, mîna Nûrî Şemdin. Hinek jî hebûn ku berdewam kirin û hejmara romanên xwe bilind kirin heta heftan, mîna Mehmed Uzun. Hinekên din jî mîna Bavê Nazê û Şahîne Soreklî li kêleka nivîsandina çîrokan, nivîsandina xwe ya di warê romanê de jî berdewam kirin.

Di vê qonaxê de, ji bo naskirina paşxaneyê siyasî ya romana kurmancî, mirov neçar e ku jî derbeya leşkerî ya 1980'yî li Tirkiyeyê dest pê bike. Di encamê de, piraniya yan jî hemû siyasîmedarên kurd ku vê dawiyê, wê wek nivîskar bîna naskirin, berê xwe dan Ewropa û Îskandinavyayê. Li wê derê, di encama têkçûna partî û rêxistinên xwe yên siyasî de, bi temamî berê xwe dan qada wêjeyê. Li Bakurê Kurdistanê jî, bi taybetî bi destpêkirina şerê çekdarî re, di-mena siyasî yê kurdan jî hêdî hêdî zelal bû.

Rêxistin û partî hinek jê heliyan û neman, hinek jî mezin û berfireh bûn.

Di nav vê xirecira siyasî de, piraniya van siyasîmedarên berê yên bakurî, ku niha nivîskar in, li Swêdê bi cih bûn û bi alîkariya derfetên ku qanûnên wî welatî jî bo zimanê dê, li hember koçberên xwe vedike, kurdan jî karibû, heta radeyekê, wan derfetan jî bo zimanê xwe bi kar bînin.

Bi vî awayî, jî bilî Sovyeta berê, pencereyeke din jî li zimanê qedexekirî vebû û ew ava romana kurdî ku li Ermenistanê bi ser hev de kom bûbû û di bin qeşaya Qafqas-yayê de sar mabû, li Swêdê û Ewropayê jî xwe re cihokeke nû dît û dişa ew pêvajoyê bi destên wan navên ku me li jor hejmartin dişa herikî.

Di nav vê gelemşeya siyasî de û bi germ-bûna şerê azadiyê yê dijwar ku kurdan li dijî dagirkerên welatê xwe dikirin. Bi bilindbûna dengê keleşkof, tang, top û firokeyên şer re û bi bilindbûna hejmara qurbanîyên ku kurdan ew di riya azadî û serxwebûna xwe re didan, deng bi temamî jî qada wêjeyê bi-liyabû.

Ji nişkê ve, di medya û çapemeniya tirkan û ya kurdan de jî, her gava ku qala wêjeya kurdan, yan jî romana kurdî dibû, navê ku bi tenê dihat gotin her Mehmet Uzun bû.

Ev çi qewimî gelo ku nivîskariya zimanê kurdî, wêjeya kurdî û romana kurdî di navê Mehmed Uzun de hat qurmiçandin û qedandin.

Çawa û çima ev rewşa dûrî rastiye hate holê, di riya vê şîroveya jêr de, em ê hewl bidin ku li bingeha vê dimena çewt û yê ku romana kurdî di hundirê wî de asê kirine, bigerin. Çavkanî jî, bêguman, siyasî e.

Mehmed Uzun, romanivîsê kurd, an si-warê hespa boz ê dewleta tirk?

Bi têkçûn û vemirandina şoreşa êlûnê ya 1961'ê ku li Başûrê Kurdistanê bi rêberiya Mele Mistefa Berzanî dest pê kiribû û siya xwe hetanî 1975'an avêtibû ser her çar perçeyên Kurdistanê, tevgera siyasî ya kurdan li Bakur, bi kekeleke germ dest bi rêxistinbûnê û livandinê kir. Her çendî destpêk di nav refên çepgirên tirk de be jî, lê dişa jî di nav çar pênc salan de bi dehan rêxistin û

partiyên kurdan hatin damezirandin. Di nav van rêxistinên de, bi her awayî şer, pevçûn û nakokiyên mezin hebûn. Lê, hemû di xalekê de digihîştin hevdu, ew jî bikaranîna tirkî bû. Bi gotineke din, li Bakur, zimanê siyaseta yê kurdan ji destpêkê heta niha her tirkî bû. Li aliyê din ê sînora, li Binxetê (Sûriye) ku bi temamî kurmançîxêv in, rewşa rêxistinên siyasî yên kurdan hinekî cuda bû, lê zimanê siyaseta kurdî yê nivîskî yê hemû rêxistinên kurd li Rojava erebî bû. Ji rawestandina Hawarê û hetanî 1968'an ku Cegerxwîn kovara Gulistanê derxist belavokê jî bi kurdî dervediket. An ku zimanê siyaseta kurmançîxêvan li her du aliyên sînora ne kurmançî bû.

Bi hatina salên 1980'yî û bi derbeya leşkerî re, rê û qedera van rêxistinên û siyasatmedarên ku vê dawiyê wê bibin romanivîs û nivîskar hêdî hêdî zelal dibû.

Hinek ji wan berî wê demê û piraniya wan piştî wê demê berê xwe dan Binxetê, ji wir jî çûn Ewropa û Îskandinavyayê. Gelek ji wan di girtîgehên dewleta tirk re derbas bûbûn û serborîyeke siyasî ya têkçûyî li pey xwe hiştibûn.

Piştî ku, di nav wan partî û rêxistinên pir de, Partiya Karkerên Kurdistanê dest bi şerê çekdarî kir, bi derbasbûna demê re, ligel rêxistin û dezgeh û partiyên derûdora xwe serkeşiya tevgera siyasî ya kurdên Bakur kir û heta niha. Ew rêxistin û partiyên bakurî yên din, yan biçûk bûn, yan jî heliyan û bê hêz û bê kes man, an jî serok û rêberên wan bûn xwedî malper, bûn rojnamevan û nivîskar.

Wisa jî di 28'ê adara 1984'an de, li dijî hêzên gerilayên kurd, dewleta tirk hêzên cerdevanên (kurd) ava kir û kurdên xwe berdan pêxêla kurdên azadîxwaz. Pê re jî, di qada wêjeyî û rewşenbîrî de, dest bi amadekirina zemîna çekirina kurdên spî kir. Tabloya siyasî ya wê demê li Bakur ev bû.

Vê yekê çi bi xwe re anî?

Çi têkiliya vê kurteşîroveya siyasî bi romana kurmançî re heye?

Ez ê bêm ser bersiva van pirsan.

Di nav salan de, ji nişkê ve, li Tirkîyê û li bakurê Kurdistanê, di dimena wêje û ro-

mana kurdî de tenê Mehmed Uzun hat xuyakirin. Ne dirok ji romana kurdî re ma, ne jî nûnerên ziman û wêjeya kurdî man. Ji bîlî çend navên "mirî", ne kesek berî Mehmed Uzun hebû û ne jî kesek piştî wî. Gelo ev rewş çawa hate holê? Bi rastî rewş wisa bû, yan jî ev rewş aliyekî rastiyê bû, ku bi dilê hin aliyan bû û aliyin din yên vê rewşê bi îsrar dihat binaxkirin û veşartin?

Çend gotinên giştî derbarê romanên Mehmed Uzun de

Mehmed Uzun heft romanên kurdî li pey xwe hiştin. (Tu-1984, Rojê ji Rojên Evdalê Zeynikê-1987, Mirina Kalekî Rind-1989, Siya Evînê-1991, Bîra Qederê-1995, Ronî Mîna Evînê, Tarî Mîna Mirinê-1998, Hawara Dicleyê-2001.) Di nav nîşê xwe de, siyasatmedarê herî zêde ku guh da aliyê xwe yê nivîskariyê Mehmed Uzun e. Yê ku xwedî hejmareke herî pir e ji romanên. Piraniya romanên wî bibliyografîk in, an ku jiyanê kesayetên naskirî yên diroka kurdan in. Mîna Celadet Bedirxan, Memdûh Selîm Beg, Evdalê Zeynikê û her wisa.

Wek ku tê zanîn, ev şêwe, nivîsandina romanên li ser jînenîgariya kesayetên dirokî û naskirî, hêsanîrîn şêwe ye. Ev hêsanî pala xwe dide van her du sedeman: Yek jê ew e ku ev kesayetên navdar li cem xelkê gelekî hezkirî û naskirî ne, wiha jî her kes mereqa jînenîgariya wan dike. Di nav xelkê de, berî ku bîr nivîsandin, xwendevanên van romanên hazir in. Navekî wek yê C. Bedirxan, an jî Evdalê Zeynikê bi serê xwe dikare bibe sedema bîdestxistina romanê. Nexasim li cem kurdan û di vê dema hişyariya neteweyî û bilindbûna asta têkoşîna siyasî de ku tîbûneke mezin ji naskirina dirokê re bi xwe re anîbû.

Sedema din jî ew e ku ji bo nivîskarê romanê materyal û melzeme hema hema li ber dest hazir in. Piştî lêkolîneke biçûk mirov dikare bibe xwedî agahî û zanebûnên berfireh li ser tevna romana ku tê nivîsandin. An ku mijar û melzeme amade ne, nivîskar bi hêsanî dikare wan bîne cem hev û romaneke qalind binivîsîne.

Dema mirov van romanên bi hûrbînî dixwîne, mirov bê kedeke mezin li dehan şaşiti û kêmasiyên girêdayî naveroka romanên, wisa jî li likumandinên mezin di awayê honandina tevnên van romanên yên sist û dirêjkirî û jihevezilandî, rast tê.

Lê, heta mirov li paşxaneyê siyasî ya vê mijarê nekole, mirov nikare bigihîje bersiweke zelal ji wan pirsên me yên ku me li jor kiribûn. Ev paşxaneyê siyasî hem xwe dispêre kesayeta Mehmed Uzun û xisletên wî yên takekesane û helwestên wî, hem jî xwe dispêre projeyên demdirêj yên dewleta tirk û bandora dewletê di çêkirina zihniyeta kurdan a siyasî de. Bi awayekî ku tevgera kurdan a siyasî, bi taybetî di mijara ziman û wêjeyê de, dibe kopyeke berevajî ji zihniyeta wê dewleta ku li hember wê şer dike.

Zelalkirina mijarê

Ji 1984'an de têkoşîn û berxwedana kurdan, sal bi sal, dewleta tirk ber bi dîtina gihayê rastiya kurdan ê di bin kevîrê kolonyalîzmê de, ajot û ew neçar kir ku piştî salên 1991'ê hebûna kurdan, wek ku kurd bi awayekî "dekorîstîk" be jî bipejirîne. Vê rêzefilmê jî wir dest pê kir û wisa dewam kir:

- Kurd hene, lê zimanê wan tune ye.
- Zimanê wan jî heye, lê devokî ye û ne zimanê nivîsandinê ye.
- Zimanê wan ê nivîsandinê jî heye, lê yê dema osmanîyan e û çend klasîkên wan hene ku ew klasîk jî yên me, yên "Tirkiyeyê" ne. Vê dawiyê serokwezîr û serokê dewleta tirk jî doza xwedîderketina li Ehmedê Xanî jî kirin.
- Bi berdewamiya berxwedanê re, di vê dema me ya destnîşankirî de, gihîştin vê pêpelûkê ku bibêjin dibe ku zimanê wan ê nivîskî û wêjeyê wan jî hebe, lê dîsa jî dikarin van romanên xwe yên hemdem bi zimanê dewletê bixwînin û mînakê wî zimanî û vê wêjeyê û romana modern jî Mehmed Uzun ê ku 'Yê Tirkiyeyê hemûyî ye.'

Çima Mehmed Uzun ?

Bêguman, berhemdarî û xwedîderketina li romanê û berdewamiya di nivîsandina wê

de, yek ji faktoran e. Eger mesele li cem sînorê romana kurdî bima û rê li ber bikarîna wê ya jî bo projeyê dewletê bihata girtin, dê niha nîrxandinên me jî jî wî û jî helwestên wî re û jî paşxaneyê siyasî ya berhemên wî re, bi awayekî din bûya.

Di van salên 'dijwar' ên dewleta tirk de, ku şerê çekdarî yê kurdan berfireh bûbû, pê re tevgera siyasî ya kurdan xurt û berfireh-tir bûbû. Li aliyê din, rewşa siyasî ya cihanê guherî û hewldanên Tirkiyeyê jî ber bi ketina nav yekîtiya Ewropayê re germ bûn û bi her awayî dewletê dixwest ku xwe nêzî kirîterên 'Ewropayê' bike. Ji ber têkilbûna berjewendiyên aborî, dewletê karibû bi Ewropayê jî tevgera kurdan a siyasî weke tevgereke terorê bide qebûlkirin û wisa bi nav bike. Êdî, kurdbûn nema dibû sûc. Li

HETANÎ bi rexneyên cidî yên nivîskarên mîna Remezan Alan, bi her awayî dihatin paşguhkirin û jî hêla van derdorên siyasî ve hem ên tirk û hem yên kurdvê dawiyê- tune dihatin hesibandin

şûna wê, têkiliya bi tevgera kurdan a siyasî re bû sûc. An ku tu dikarî kurd bî, bi kurdî bi axivî, binivîsinî, lê dijberî û dijminayîya 'Terorê' şert e. Di vê çarçoveyê de, projeya 'spikirina' kurdan berdewam kir.

Ji lew re, derdorên dewleta tirk ên birêveber û çêkerên 'Kurdên spî', ev yek jî xwe re kirin armanc, bihêzkerin û qezenckirina 'rewşenbîr û nivîskarên' ku yan têkiliya wan bi tevgera 'terorê' re tune be, yan jî dijberî wê tevgere bin. Xala girîng ev bû, jî ber wê jî eger ev derdor jî nav girtiyên siyasî yên berê bin, yan jî jî bermayiyên rêxistin û partiyên biçûçikmayî û heliyayî bin, dîsa xem nake.

Bi vî awayî nivîskar, rewşenbîr, çapemenî û dezgehên tirk ketin dewreyê.

Yek ji taybetmendiyên balkêş ên vê dewletê ew e ku li hember azadî û serxwebûna kurdan hemû alî û derdorên neteweya tirk bi çep û rastên xwe, bi general û sivilên xwe, bi dezgeh û çapemeniya xwe, bi nivîskar û

rewşenbîrên xwe, dikevin nava tevgerê harmonî. Ji bo vê armanca pîroz, rêlibergirtina azadiya kurdan, hemû dibin yekdest û yekdev û yekbawerî.

Ji bo xurtkirina eniya kurd a dijberî 'tevgera terore' li xelekên qels geriyan. Yek ji wan xelekên pêdiviya dewletê pê hebû, di karibû bi hêsanî di nav kurdên li Swêdê de bê ditin. Baştirîn nivîskarê ku ew kirasê spî li bejn û bala wî dihat, li gor derdorên dewletê, M. Uzun bû. Hem bi rastî nivîskarekî xwedî berhem bû, hem jî dilsoziya xwe ya bi dewletê re, di dema gurbûna şerê li dijî 'Tevgera terore' de ji Swêdê rê girt û hat bû 'Mehmet-çîk', an leşkerî ji artêşa dewleta tirk re kir.⁽¹¹⁾

Her wisa ji rêxistineke têkçûyî û li ber helandinê 'Rizgarî' hatibû, ku bi her awayî dijberiya 'tevgera terore' dikir.⁽¹²⁾

Lê, her çendî ew ji hemû romanivîsên kurd çalaktir û zîrektir be û xwedî berhem be, lê di sa ji divê di bin sîwaneke maqûl û cihê baweriyê de derbasî vî dergehê mezin ê wêjeya hemû Tirkîyeyê bibe. Ji bo bê şubhe karibe derbas bibe, pêdivî bi hinek tedbîran hebû. Diviyabû Yekîtiya Nivîskarên Tirk wî hemêz bike û wî xelat bike û hat xelatkirin jî. Diviyabû romanên wî bi tirkî û li weşanxaneyên mezin ên Tirkîyeyê bîn çapkirin û belavkirin û wisa jî bû. Diviyabû ku ew ji hêla xwe ve, xwe wek nivîskarekî cihanî û pîrzimanî bide nîşandan ku milê hemû Tirkîyeyê ye û li dijî teror û cudaxwaziyê ye û wisa bû. Ji bo balkişandina çapemeniya Tirkîyeyê û ya cihanê diviyabû ku ji bo romaneke kurdî doz lê bê vekirin û dûre jî, ji bo ku îspat bibe ku Tirkîye welatekî nêzî kirîtêrên ewropîyan e, diviyabû dozê qezenc bike û ji ewropîyan re diyar bibe, bi zimanê kurdî ku Tirkîye welatekî cihê azadiya raman û derbirinê ye û bi kurdî û ... her wiha.

Ka em guh bidin çend helwestên Mehmed Uzun ên ku di 19.04.2002'yan de, ji dadgeha ewlekariyê ya dewleta tirk re, dibêje:

"Peywira min cihêxwazîkirin nîn e, pêkanîna yekîtiyê ye. Ji bo min tiştê bingehîn ne dabeşkarî (cihêxwazî) ye, pêkanîna yekîtiyê ye. Ez dabeşkarîyê ne tenê wek ehmeqiyê dibînim, di heman demê de wek ramanê x-

tere jî dibînim."⁽¹³⁾ "Ne ji bo cihêtiyê biafirînim, ji bo tiştê heyî dewlemend bikim, dinivîsim."⁽¹⁴⁾ "Min mafên kêmeteweya tirk a Bulgaristanê parast û ji bo van mafan çî ji destê min hat, min hemû pêk anî."⁽¹⁵⁾ Ew dixwaze "... xwe bigihîne Tirkîyeyeke şareza, murefeh û demokratîk."⁽¹⁶⁾

Her wisa ew dibîne ku demeke dirêj di serketina Tirkîyeyê ya riya parastina wijdanê mirovan re, derbas bûye:

"Tirkîyeya ku ji zû ve ye ketiye riya piyarî û wijdanê ya mirovî..."⁽¹⁷⁾

Ev nimûneyeke ji dehan nimûneyan, bi taybetî di hevpeyvînên bi rojnamevanên tirk re, ku Mehmed Uzun xwe ji nivîskarekî kurd bêhtir wekî nivîskarekî ku bi gelek zimanan dinivîse, ku yek ji wan zimanan kurdî ye, dide pêşkêşkirin, wisa jî qala 'entegrekirina kurdên Tirkîyeyê' dikir.!. Ew hêleke, ji hêla din ve jî xwe weku afirînerê zimanekî pêşkêş dikir. Dema ji bo peyva xwe ya 'Min zimanek afirandiye' diket tengasiyê, mebesta xwe, ne zimanê kurdî, lê wek zimanê romanê şrove dikir. Bi vî awayî jî rê li ber nivîskar û rewşenbîrên tirk vedikir, da ku ew nezani û tunebûna agahiyên wan ên li ser ziman û wêjeya kurdî bibin derew û li her derê, wekî ku rastiyên dirokî bin, belav bibin. Projeya dewletê jî, ji bo bê şubhe û bi selameti bibe serî, hewcedarî bi wergerandina van derewan bû. Berztirîn mînak di vê çarçoveyê de Yaşar Kemal e, ku li ser wêjeya kurdan û Tirkîyeyê her dem Mehmed Uzun wekî wêjewanê kurdan ê bi tenê pêşkêş dikir:

"Li Tirkîyeyê gelek wêjenas derketin. Nazim Hikmet derket, Saîd Faik derket. Gelek mirovên din jî derketin. Lê di kurdî de tenê Mehmedekî wê heye."⁽¹⁸⁾

Derewên Yaşar Kemal ên li ser

Mehmed Uzun û li ser romana kurdî

"Îro zimanê kurdî bi Mehmed dest pê dîke."⁽¹⁹⁾

Li vê derê mebest ji peyva 'ziman' çî be bila bibe, mebest zimanê kurdî be yan jî zimanê romanê be, bi her du wateyan jî, ev gotin ji rastiyê dûr in.

Yaşar Kemal, mîna her nivîskarekî din, di bîr û baweriyên xwe û di nîrxandinên xwe

de, azad e. Ew ji kê hez bike yan ji neke, ew derdekî wî ye. Lê, ne ew, ne tu nivîskar, ne xwediyên wî mafî ne ku, nirxandinan li ser romanivîsandin û wêjeya zimanekî bikin, ku ne bi wî zimanî dizanin, ne ji derbarê wêjeya wî zimanî de, xwedî agahî ne. Yaşar Kemal nivîskarê zimanê tirkî ye û kurdekî ku nizane bi kurdi bixwîne û binivîse, vî mafî ji ku tîne ku nivîskarekî bine û wî bike yekem kesê ku zimanê me ji wî dest pê bike.

Yaşar Kemal ê tirkînivîs vê wêrekiyê ji ku tîne ku dereweke wisa mezin, wekî rastiyeke dîrokî, ji me re pêşkêş bike?

Jixwe bi vê qayîl nabe. Mîna ku ji hemû berhemên romana kurdi jî agahdar be, dîsa wî mafî dide xwe û romana Uzun wekî yekemîn romana kurdi, yan jî 'romana pêşî' bi nav dike:

"Gava min romana Mehmed Uzun xwend ez şaş mam, çawa di zimanekî de romana pêşîn evqas pêşketî, dewlemend û bi hosteyî dikaribû bihata nivîsîn..."⁽²⁰⁾

Yaşar Kemal û pê re jî çapemeniya tirk û derdorên rewşenbîriya tirk û kurden spî bi hev re mîna 'koralekê' ev derew dubare û dehbare kirin, hetanî ku bû bawerîyeke hevbeş a gelek kurdan jî. Vê yekê hinek ji nivîskarên nîfşê nû jî xiste bin bandora xwe, wek mînak, Yaqob Tilermenî M. Uzun wekî maratonvanê bi tenê yê wêjeya kurdi bi nav dike ku ne li pêş û ne jî li paş wî kesek tune ye:

"Mehmed Uzun, di qada wêjeya kurdi de maratonvanê tenya ye ku di pêşbazîya sedmetreyî de, ne li nik wî, ne li pêşîya wî, ne jî li paşîya wî tu maratonvanên din tune ne."⁽²¹⁾

Yaşar Kemal li ser gora Uzun jî heman derew dubare kirin:

"... Kevirê yekemîn ê esasîn yê zimanê kurdi daniye."⁽²²⁾

Ev pêlên deryaya derewên ku bi her awayî li ser kurdan dihatin ferzkirin, nema rê didan qeyikên rastiya ku dema dihat gotin jî ne deng diçû kesekî, ne jî rê li ber wan dangan vedibû ku ev dîmena çewt a wêjeya kurdi hinekî sererast bibe.

Hetanî bi rexneyên cidî yên nivîskarên mîna Remezan Alan, bi her awayî dihatin

paşguhkirin û ji hêla van derdorên siyasî ve hem ên tirk û hem yên kurd- vê dawiyê-tune dihatin hesibandin. Rexne carinan li zimên bû: "... wî bi domdarî digot 'Min ji bo romana kurdi zimanekî nû afirandiye, lê di eslê xwe de ew ji sînorên vegotîneke çîrok-bêjî derneketibû...' "⁽²³⁾

Carinan jî van rexneyan wisa bal dikişandin ser çewtî û nenormalbûna rewşa pêşkêşkirina berhemên wî yên di kurdi de lawaz û bi tirkî bi awayekî din bûn:

"...Yanê pirtûkeke ku di tama edebiyatê de pênc hevokên wê nîn in, bi nivîsên A.Omer Turkeş û Muhsin Kizilkaya rûspî dike, ya rast saziyeke wisan li pêşîya me ye ku bi van nivîsan, me amade dike..."⁽²⁴⁾

Berevajî wê, piştî 1999'an û guhertinên ku destpêka sedsala nû di siyaseta azadîxwaz a kurden Bakur de bi xwe re anîn, êdî ev dîmen bi destê tevgera kurdan a siyasî hat rûniştandin û Mehmed Uzun ê nexweş, mîna qehremanekî ku serkeftinên mezin bi dest xistibe li welatê xwe, li Amedê, hate pêşwazîkirin û hembêzkirin û bi temamî ev derewên ku bi salan e dewlet û rewşenbîrên xwe û kurden xwe dixwestin bikin rastî û nîkaribûn, êdî ew armanc bi temamî pêk hat.

Balkêş e ku hin derûdorên siyaseta kurdan bi dewletê û derûdorên wê re kete pêşbazîya spîkirina navê Mehmed Uzun û ketin nav hewldanan, da ku hin rastiyan bi kurdan bidin jibîrkirin û li hember nivîsên diji projeya dewletê di çapemeniya xwe de sansûr bikin, wek mînak, kovara Wyê, ku niha ji weşanên Enstîtuya Kurdi ya Amedê ye û berê bi alîkariya Şaredariya Mezin a Amedê derdiket, di hejmarê xwe ya 13'an de, di dosyeya li ser Mehmet Uzun de, gotara Mahabad F. Arda ya ku vê diyardiya mijara me rexne dike, sansûr kir, ew neda weşandin û li şûna wê hejmareke tijî nivîsên ku ji tirkî hatibû wergerandin li ser M. Uzun derxistin. Di vê hejmarê de 48 wêne û portreyên M. Uzun hatibûn bicihkirin. Arda di nivîsa xwe ya sansûrkirî de wisa nivîsibû:

"Birêz Uzun, 10 sal li ser navê nivîskariyê ji swêdiyan pere wergirt ku ji bo li ser wêjeya kurd kar û xebat bike. Piştî deh salan eger pêwîst bê dîtin deh salek din an demek kintir carek din tê dirêjkirin.

Piştî ku Uzun fam kir dê êdî pere nedinê, di wê demê de 'listeyek' derket ku PKK'ê navê 200 kesî rêz kiriyê ku dê 200 kesî bi-kuje û navê Mehmet Uzun jî di nav de ye. Di nav van '200 kesan' de, bi tenê navê Uzun hat zanîn û derket pêş û propogandaya wî hat kirin. Wî bi xwe jî çapemeniya tirkên û swêdiyan re digot "navê min di listeyê de ye", di Roj TV'yê de jî derdiket digot: "Masmedya swêd û tirkên derewan dikin". Heman tişt di Ozgur Politikayê de jî nivîsand.

Gelo bi nexweşketina Mehmet Uzun re ev dokument hemû wenda bûn an jî jî bîr bûn? " (25)

Ez ê li cem vê mînakê rawestim û vegêrim ser nîrxandinên Yaşar Kemal ên jî helwest û kirinên siyasî yên Uzun re, ku di dema koçkirina Uzun de gotibû:

"... Ev mirov di politikayê de jî li ser xwe rawestiyaye. Li wir jî tu xeletî nekirine, her dem lanet li tundiyê aniye..." (26)

Ez bawer dikim, mebesta wî bi 'xeletînekirin'ê ew e ku tu caran piştigiriya 'tevgera terorê' nekiriye.

Bi vî awayî, ew dimena ku li ser dihat karkirin û xebitandin, da ku bi her kesî be qebûlkirin ev bû. Y. Kemal rola xwe heta dawî bi cih anî. Ji wir û pê ve proje êdî berdewam dike û 'kandidatên' nû tînin amadekirin. An ku 'kevîrê esasîn' ê romana kurdi, piştî M. Uzun tînin amadekirin. Pê re jî TRT6 tê vekirin û dibe platformeke geş ji bo ku ew proje ber bi serkeftinê din ve here.

Roman û dagirkerî (kolonyalîzm)

Gelo rast e ku M.Uzun ew 'xeletî' nekiribû?

Tev ku romana wî ya Ronî Mîna Evînê, Tarî Mîna Mirinê li ser şerê li Kurdistan û Tirkiyeyê bû. An ku çawa 'xeletiyek' e wisa dikare nebe, tev ku nivîskarekî kurd romanekê li ser şerê di navbera artêşa dewleteke dagirker û şervanên azadiyê yên kurd de binivîse. Ew 'xeletî' bûbû yan nebûbû? Ez ê hewl bidim piştî vê kurtesîroveyê, li gor xwendina xwe ya jî romanê, hinekî nêzikî bersivê bibim.

Di dîroka wêjeya cîhanê de, mirov li gelek mînakên rast tê, ku welatê nivîskarê xwediyê romanê jî hêla artêşeke dagirker ve hatibe bidestxistin û li hember wê artêşê şer tê kirin. Nêzîktirîn mînakê vê yekê romana Bêdengiya Deryayê ya Vircor e. Ev roman li ser dema dagirkirina nazîyên elman jî Fransayê re. Nivîskarê romanê Jean Marcel Bruller e. Cara yekem romana wî di bin navê Vircor de, di sala 1942'yan de derket. Vircor jî navê cihekî ye ku sembola berxwedana frensiyan bû di ji nazîyên elmanên dagirker.

Çîroka romanê bi kurtayî wilo ye, serbazekî artêşa dagirker a nazî bi navê Werner von Ebrennac dixwaze li cem malbateke frensî ku jî kalik û keçeke ciwan ku biraziya wî ye, pêk tê. Serbazê elman bi her awayî dixwaze tîkiliyê bi keçikê yan bi apê wê re deyne. Roman hemû li derdora awayê berxwedana vê keçikê, yan vê malbata ku welatê wê hatiye dagirkirin û li hember vê dagirkeriyê bêdengî hîlbijartine. Hemû rengên tîkiliyê bi vî serbazê dewleta dagirker re red dikin û xwediyên helwesta xwe dimînin. Serbazê elman dixwaze xwe nêzikî wan bike û bi xwe re diaxive ku ew dixwaze her du çand, a frensî û ya elmanî, bi hev re bijîn û ... lê ji ber ku ew serbazê artêşa dewleteke dagirker e, hemû gotinên wî li hewa dimînin û tînin redkirin. Ev helwest dibe sedem ku yê serbaz xwekuştinê bifikire û ... heta dawiyê.

Em niha vegerin ser romana Ronî Mîna Evînê, Tarî Mîna Mirinê, di nav romanên M.Uzun de ev tenê li ser şerê li Kurdistanê ye li dijî artêşa tirk nivîsandiyê. Di romanê de navê Kurdistanê derbas nabe. Ew wekî welatê çiyayan û Tirkiyê wekî welatê mezin tînin binavkirin.

Beramberiyeke biçûk:

- Welatê ku hatiye dagirkirin: li wir Frensa ye – li vir Kurdistan e "nayê binavkirin".

- Artêşa dewleta dagirker: li wir artêşa elman e – li vir artêşa tirk e.

- Serbazê artêşa dagirker: li wir Werner von Ebrennac e – li vir Baz e.

- Jina ku yê serbaz dixwaze pê re tê-

kiliyê deyne: li wir keçikeke frensî, bi apê xwe re dijî -li vir keçeke kurd e, şervaneke bi navê Kevok e.

- Stûnê bingehîn ê romanê: li wir awayê təkiliya serbaz û keçika Frensî ye - li vir awayê təkiliya yê serbaz û keçika kurd e, ji hevdu hez dikin û roman çiroka evîna wan vedibêje.

Encam

Nivîskarê frensî M. Bruller, keçekê ji welatê xwe yê dagirkirî tîne û li hember serbazekî artêşa dagirker ê elman wê bēdeng dike. Bēdengiyeke wisa ku mîna bēdengiya deryayê ye, ji derve ve hêdî û ji hundir ve tiji qêrîn û protestokirin û redkirina dagirkeriyê ye.

Nivîskarê kurd M. Uzun, keçeke şervan ji welatê xwe yê dagirkirî tîne û li hember serbazekî artêşa dagirker ê tirk dixê deryaya evîneke kûr. Şervana keç a kurd dike Kevok û serbazê artêşa tirk dike Baz û wan berdide nav pêlên hezkirin û evînê.

Tev ku serbazê elman nerm e, kulturhez û diltenik e, lê dîsa jî, ji ber ku dagirkirina welatê wê li wê navê ye, ji hêla keçika frensî ve tê redkirin.

Serbazê artêşa tirk ê M. Uzun xwîn mij, kujer û qesasê serê şervanên kurd e. Dîsa jî keçika kurd dibe evîndara wî û ew evîn dibe mijara romana M. Uzun a ku ew bi tenê li ser dagirkirina Kurdistanê û şerê azadiya kurdan ku heta niha lidar e nivîsandibû.

Hêjayî gotinê ye ku ev “serkeftinên M. Uzun ên di warê romanivîsandinê de ku berî her tiştî yek ji encamên wê projeya demdirêj a dewleta tirk e, wisa jî ji hêla tevgera siyasî ya kurdên bakur ve hate qebûl kirin û ‘efsane’ kirin, bûn sedem ku ji bo hin ‘namzetên’ din yên wê ‘rol’ a nepîroz bidin ser riya wî. Bi hêviya ku teqlîdkirina wî, wan ji bigihîne wê radeya ku M. Uzun gihiştibûyê.

Nivîs didome...

Jêder:

- 1) Romana Şivanê Kurmanca ya Erebe Şemo, amadekar Mistefa Aydoğan, weşanên Lîs, rûpel 4.
- 2) Romana Pêşmerge, weşanên Nûdem, çapa sêyem, 1997.

3) Romana Jana Gel, çapa yekem, wergêr Elî Şêr, weşanên Apec, Stockholm, 1992.

4) Jana Gel: Di pêşgotina vê romanê de hatiye nivîsandin (Nivîsandina vê romanê digihîje sala 1956’an, lê aloziya zeman wisa lê kir ku piştî deh, yazdeh salan bê belavkirin... Rûpel 9, Kemal Fuad, li başûr, 21.10.1971 dane ya kurmanci ya bi tîpên latînî, ji wergêr Elî Şêr -Apec-1992).

5) Pêşmerge: Ev roman di sala 1960’î de, li Êrîvanê, di sala 1962’yan de li Bexdayê, tê çapkirin. Di sala 1964’an de li Bakûyê, bi zimanê Azerî tê weşandin. (Pêşgotina çapa kurmanci bi tîpên latînî, weşanên Nûdem, Stockholm, 1997 kurmanciya wê: Ziya Avcî)

6) Romana Xatê Xanim, Eliyê Evdîrehman, weşanên Belkî 2004, Stenbol, rûpel: 2.

7) Heman jêder; rûpel: 1.

8) Romana Hewarî, Heciyê Cîndî, ji weşanên Lîsê, çapa sêyem, Amed 2008. Rûpel: 4.

9) Romana Şivanê Kurmanca ya Erebe Şemo, amadekar Mistefa Aydoğan, weşanên Lîs.

10) Hinek agahiyên li ser nav û dema weşandina romanê, ên di vê nivîsê de derbas dibin, ji listeya romanên kurmanci ya ku Îbrahîm Seydo amade kiribû, hatine girtin.

11) Di salên 90’î, dema herî xerab de ku gund dihatin şewitandin, her roj mirov dihatin kuştin, serihildan dibûn û qiyamet bû... Birêz Mehmet Uzun 15.000 ewro pere da dewleta tirk û bi ser de jî çû mehekê li Egeyê eskerî kir. Ji malbata wî bi xwe jî şehîd ketin, ew qasî felaket bi serê kurdan re hatin. Ev helwesta Uzun bû skeç (şano) û di Med TV’yê de hat listin. Mahabad F.Arda: ji amidakurd.com/15 çile 2007. <http://www.amidakurd.com/kevin/modulesc420.html?name=Niviskar&op=viewarticle&artid=489>.

12) Wek tēbîniyekê li ser çûna Mehmed Uzun a leşkeriya Tirkîyeyê, ez dixwazim vê xalê zêlat bikim. Eger M. Uzun li Tirkîyeyê yan li bakurê Kurdistanê bûya, bēguman wê nîrxandina çûna wî ya leşkeriyê jî bi awayekî din bûya. An ku ew rexne nikare bi vî awayî li nivîskarekî kurdî din bibe ku ji neçarî, ji ber mana li welêt, biçe leşkeriyê. Mesele ew e ku ji Swêdê, bi qîm û reza xwe, rê bigre û here ji artêşa tirk re bibe leşker.

13-17) Pirtûka planetK a Bienalle 2009, rûpel 23 – 30.

18-19) Kovara W, hejmar 13, zivistan-2007. Rûpel 91.

20) Romana Ronî Mîna Evînê, Tarî Mîna Mirînê, Avesta 1998, rûpel 351.

21) Kovara W, hejmar 13, zivistan-2007. Rûpel 28.

22) Ji A. Welat 14.10.2007 <http://www.rojawan.com/haber-29086.html>

23-24) Bendname, Remezan Alan, Avesta-2009, rûpel 14.

25) Ji amidakurd.com-15.çile.2007. <http://www.amidakurd.com/kevin/modulesc420.html?name=Niviskar&op=viewarticle&artid=489>, Mahabad F.Arda: ji amidakurd.com/ 15 çile 2007.

26) Ji A. Welat 14.10.2007 <http://www.rojawan.com/haber-29086.html>

Çend dîmenên reşbîn / çend dilopên ji romanûsiya min/ pirdengiya hewldanekê

Yaqob TILERMENÎ

Di van demên hestiyar de -jixwe demên ne hestiyar kêm in- ku neteweyek ji bo nasname û hebûna xwe li ser piyan e (li ber xwe dide), mixabin lingê herî girîng ku zimanê vê berxwedanê bi xwe ye, kût û bawî dimîne. Çinku li ser axa kurda serhildêriyeke demdirêj, bêhempa û dabaşa gelek vegotinan li dar e; lê, bi hezaran ciwanên ku dikarin çavgiyê bi ser dijberên nasnameya xwe de bibazin û serkêşên vê serhildêriyê ne, rojê saetê wextê xwe ji nivîsa çareya cahda xwe re venaqetînin. Yanî bi kurt û kurmancî; lehengên vê çalakgeriyê zimanê vegotina xwe (çanda wêjeyî) naafirînin û li hêmanên afirandî jî xwedî dernak-evin.

Nebûna çanda wêjê û xwendinê nahêle ku pêşketin, coş û xiroşa di vî warî de geş bibe. Jixwe cihê ku geşedan lê tune be dê pêşveçûnên dîtir jî pêk neyên. Naxwe; dê hejmara kovarên hunerî, çandî û wêjeyî bi dehan bûya û dê di van kovaran de bi sedan pênuşalêsên cur bi cur binivîsandana. Digel van şert û şirûtan; ger romanên kurdî ligel pirtûkên dinê têne çapkirin û ger di kovareke kurdî de dosyeyek li ser “romana kurdî” tê amadekirin, hingê pêdivî bi veçirandin û şîrovekirina vê bizavê jî heye; her çiqasî derûdor bi dîmenên reşbîn hatibin rapêçandin jî.

Mirov tim û dayîm dibihîse ku xwendevanên kurdî kêm in, nivîskarên zimanê kurdî nayên naskirin, pirtûkên kurdî nagi-


hîjin pirtûkhezan û hwd. Digel van neteyan jî, zêdetirî bikirên pirtûkên kurdî li der û dorê rexneyan li nivîskar, weşanger, pirtûk û zimanê vegotinê -ne li ser kaxizê-dikin -tê nagihîjim çawa bêyî xwendinê têne rexnekirin-. Îcar dema ku ev dîmenên

reşbîn tê ber çavên mirov, mirov bi şik û guman jî xwe dipirse: “Gelo dê ev dabaşa li ser romanê jî di nava rûpelên kovarê de bê pirs û nîqaş were pêşwazîkirin?” Çawa ku romanên kurdî piştî derçûna xwe nakevin bergeha çavên xwendevanan, nivîsên li ser wêjeyê jî bi tenê çend kesên xemxur eleqedar dike. Ne wiha bûya û geşbûnek jî bo pirtûkên wêjeya kurdî hebûya, qe nebe dê fena wêjeya li welatên din “xelatdayînek” û pê re jî “rûmetdayînek” jî bo van pirtûkan bihata lidarxistin. Û dê dabaşa kesên rexnegir û şîrovekaran jî bilî hêla pirtûkan a siyasî bihata guherandin û dê

bal biçûya ser tevn, honak, vegotin, şewaz û hêmanên girîng ên rexneyî jî.

¶¶¶¶

Piştî raxistina ew qas neteyan der barê nivîs û pêşaniya kurdî de mirov vegere ser nixrandin û vegotina nivîs û romana kurdî, jixwe dê bersiva dosyeya li ser romanê bi hindikî be jî were dayîn. Ez ê jî bi giştî li ser romanê û bi taybetî li ser romanûsiya xwe çend miftiyên (kilid) biçûk bidim destê xwendevên ku bikaribe deriyê pêşin ê roman û ramanên min vebike.



Alain Robbe-Grilletê romanûs û afirînerê “pour un nouveau roman (romana nû)” ye, gotiye, “Regezên pirtûkeke afirandî bi tenê ji bo xwe derbas dibin... Her pirtûka nû şeweyên neguherbar li pê xwe dihêle, hem zagonên xwe saz dike hem jî xerabkirina wan amade dike.”

Nivîskarên ku erbabê pênuşê bin û hemû dem û serdemên jiyana xwe ya stewiyayî xistibin xizmeta nivîsê, jixwe dê berhema wan neşibe ya tu kesan û jixwe dê li gora qalib û zagonên xwe yên nû binivîsin. Her çiqas kesên li derveyî nivîskêr (bêtir jî xwendevanên pozbilind û rexnegirên ku pûte bi tiştêkî nadin) naxwazin ku nivîskar rasterast xwe bipesinîne û li berhemên xwe xwedî derkeve; lê li dijî vê bixudandinê nivîskar dikare bi hêsanî dengê xwe bi ser dengên wan bixe û rêveçûna nivîskariya xwe vebêje:

“Dilê min liyan e... ez kitim im. Bêje enstrumanên min, hevok orkestraya min, sewt pêlên berî firtoneyên min in. Û dê ev firtone ancax di sê dîwanên cuda de werin rawestin...” (Sêbareya Mêrdînê: 1-Kitim, Rûpel 221)

Li gora raya min pêwendiyên herî dilsozane û arambar ên wêjeyekê, pêwendiyên di texm û taya mirovî de ne. Naxwe nivîskar citbûnê derxe pêş dê bilindbûneke di ser asta çavneriya mirov re derkeve holê. Çi kesên di nava seqaya hebûna romanê de cih digirin –romanûs, xwendekar, weşanger, rexnegir- zû bi zû dev ji hînbûn û ezberên xwe bernadin û berxwedaneke beleheq li dijî romanê nişan didin ku ev bixwe ji pêşketina romanê re derengiyekê tîne. Di rastiya xwe de tu nivîskar rasterast berhema xwe napesinîne, bêtir li dijî xerabkirina gotinên qelewîn li berhema xwe xwedî derdikeve. Ji ber hindê jî, nivîskar jî ber neditin û têngîhiştinên mirovan carinan jî misogerî dengê xwe di nava hevokan re radigihîne bikirê berhemê.

✽✽✽

Di nav ew qas belawelabûn û parçebûna kesayet, derûnî, dilînî, hal û rewşan de roman dibe alav û amûr an jî mebesta xwetemamkirinê. Weke Michel Butor jî go-

tiye, “Ez ne ji bo firotinê, ji bo ku di jiyana xwe de yekîtiyekê pêk bînim romanê dinivîsim.” Hingê mirov dikare weke kurdekî nivîskar parîparçebûna xwe bi rêya nivîsandina romanê wiha jî binivîsîne:

“Ji xwemikurhatinên romanûsekî kitim heta bi vegotinên muzîkjenekî tîkçûyî ku jiyana wî li ser sêlika reş a lek dizizikî û heta ciwanên ji Mêrdîna bav û kalan veqetiyayî û li nava kuçe û kolanên Stenbolê winda; pênuşek bêyî ku guh bide rêbaz û şeweyên heyî yên romanê, ji çirokek ruhekî pelçiqandî dihere çirokek ruhekî dîtir. Dişibe beytîkek ji ser guliyekî xwe dipengizîne ser guliyekî dîtir...” (Sêbareya Mêrdînê: 2-Qerebafon, Rûpel 239)

Cihana li derveyî mirov a ku hebûna xwe di sehekên mirov de dîtewisîne dikare bi rêya nivîsandina romanê were vegotin. Carinan nivîskar di romanên xwe de dîtewise, weke Joyce di Ulyssesê de; weke Kafka di Doz û Qesir de; weke Proust di Li Dû Şopa Dema Winda de; weke Mehmed Uzun di Tu de...

Vebijartina “mijara romanê” feqeke vedayî ya li ber rexnegirên kevneşopparêz in. Kî devê xwe veke û bixwaze çend gotinên qelewîn der barê romana kurdî de bibêje, pêşîn serê xwe bi mijara romanê re diêşîne. Bi vêya jî nayên ser, romanûs jî weke berdevkê siyasatên rojane tawanbar dike (di pirtûkên nîrxandinî, di nivîsên quncikên rojname û kovaran û di bernameyên televîzyonan de berê tîran li romanûsan e). Ziman, leheng, cih, şayesandin, pevgirêdan, diyalog, monolog, çespandina fikrekê, peyamên rasteqîn, xeyal û nîgaş jî bo wan weke rewşikên dora hibriyekê ne. Mirov dibêje qey devên çatirî bi tenê dikare ji bo darazê vebîn; lê di rastiya de kesê herî dawî dikare berhema afirandî bidarizîne, bi tenê nivîskarê wê berhemê bixwe ye. Jixwe danasîn û rexnêkirina berhemekê ne tîpekê jî berhemekê derdixe, ne jî tîpekê lê zêde dike.

✽✽✽

Di romanê de vegotina xweser a nivîskêr bi tenê romanûs eleqedar dike. Ji ber ku pevgirêdana beş, leheng, bûyer, çîrok, dem

û seqayê bi hêlên xwe yên nepenî bi tenê ji hêla nivîskêr ve têne zanîn:

“Çirok, çirokê tine û çiroka dawiyê ji dibe destpêka çirokeke dîtir. Mirov dikare bişîbîne romanekê.” (Sêbareya Mêrdinê: 3-Bavfileh, Rûpel 277).

Bi vî hawî pirdengiyê xweser derdi-keve pêşîya mirov. Ji ber ku li Rojhilata Navîn û bi giştî ji li Kurdistanê pirdengiyê resen heye, divê (ev divêti ne ferma-neke jênager e!) bikaribin romanûsên kurd ji li gora vê cihêrengiyê tevbigerin û honakên xwe li ser vê xusûsiyetê ava bikin. Lê; pirdengiyê çawa?

Mirov ji mēj ve li rêveçûna nivîsîna wê-jeya cihanê binihêre û bixwaze ji xwe re ji van tecrûbeyên heyî sûdê werbigire, divê (tu nivîskar ne mecbûrê vê divêtiyê ye!) hewldan û afirandinên heta niha hatine kirin di ser guhê xwe re navêje. Bi vî hawî: Ew pirdengiya ku ez di çand û jiyana kurdistanîyan de dibînim, berî bi salan di wê-jeya cihanê de bersiva xwe ditiye. Û ku em berhemên di roja me de têne afirandin bix-wînin, xaleke aşkera derdikeve pêşîya mirov. Nivîskarên rojavayî li dû jiyanêke razber û nepenî berê xwe didin rojhilatê welatên xwe. Ev qiblegeh ji bo lehengên pêşaniyan weke warên utopîk dixuyin. Çima? Ji ber ku rojavayîyan kar û barên xwe kirine, daw û delingên xwe dane hev û dixwazin bi jiyanêke dîtir rûhev bimînin. Ev jiyana dîtir carinan bi rêya bizaveke sû-fistî pêk tê, carinan ji bi xema bidestxis-tina aramiya derûnî ve... Lewre ji bo wan li rojhilat gelek qul û qulaseyên ku nehatine saxkirin û keşîfkirin hene. Ji vê derê şûn ve barê mezin dikeve ser milê nivîskarên rojhilatî.

Parek ji van nivîskarên rojhilatî jî, ni-vîskarên kurdî ne; ger xwendevan û rex-negir bi awirên nejiherkirî li vê dabaşê binihêrin. Ne hewce ye em bi ilhesiyekê sedema nivîskariya roman û çiroka nûjen bi bajarvaniyê ve girê bidin. Qonaxa ku em gihîştinê şert û şîrûtan li ber nivîskar datîne ku ji bêhejmar bîran avan bikişîne û bi şêwevegotineke cuda pêşaniyên xwe lê bike. Naxwe mirov bi tenê nenivîsan-

dina pexşana kurdî bi nebûna bajarva-niya kurdan ve girê bide, dê bi tenê goti-nekê li ezberên heyî zêde bike.

Veçirandina dabaşê jî kêr dimîne. Ji ber ku em hemû jî dizanin qeyd û ben-dên li hemberê kurdî hatine danîn, ne tenê di warekî de, di hemû çeşnên wê-jeyê de pêk hatiye û bûye sedem ku wê-jeya zimanekî ya pêşketî dernekeve ser textebana jiyana wêjeyî.

✚✚✚

Mirov nikare yekser bibêje ku romana kurdî ber bi kîjan astê ve diçe û radeya hatiye gihandin destnîşan bike. Ji ber ku romanivîsîn weke zîncîrekê ye û ji Cer-vantes heta bi Sterne û Dostoyevski, Fa-ulkner, Woolf, Kafka, Kundera, Yaşar Kemal, Mehmed Uzun, Helîm Yûsiv xe-lek li xelesa dîtir zêde dike û ber bi bêda-wîbûnekê ve diherike. Îcar mirov dikare romanên kurdî di nava van xelekên heyî de jî bi cih bike û deyne serê xelesa herî dawîn jî. Çinku rêya her celeb şêwenivî-sîna romana kurdî vekirîye. Hin kes dika-rin ji klasîkan hez bikin û pênûsa xwe di wî warî de bixebitînin, hin kes dikarin bidin ser şopa Kafka û Becket, hin kes di-karin hewldana Alain Robbe-Grillet, Mic-hel Butor û hevalên wan ji xwe re mînak bigirin, hin kes dikarin piştî xwe bidin hemû regezên romanûsiya heta îroj gihîş-tiye û bi şêwaza postmodernîteyê binge-ha romanên xwe deynin; ancax kî/kê bi çi tevgerê diwarê romana xwe bilind bike jî, heta ku bi jiyana netewa xwe re (jiyana ku ew bixwe di nava wê de ne) ne li hev bin û dilsoziya nivîskarên kurdî di ser guhên xwe re bavêjin, jixwe dê ew diwarê wan tu carî ligel diwarê hevalbendên wan bilind nebe.

Heta ku mirin, kuştin, serhildan, berx-wedan, siyaseta, kampanya, pîroziya ziman, daxwazên perwerdehî û hînkirina kurdî û hwd di rojeva kurdan de mijarên binge-hîn û sereke bin, dê nivîsên nazarî (teorîk) û pîrhêl tu carî nekevin rêza du-yemîn a rojeva ciwanên kurd û romanên kurdî di refikên pirtûkxaneyan de rûmeta ku heq dîkin nebînin.

Roman navê guhertinê ye

Medenî FERHO

Pirtûk alava têkiliya civakê û alava têkoşinê ye.

Nivîskar jî çavdêrê demjiyana xwe ye. Xeleka navbera doh û îro, îro û sibehê ye. Di vê çarçoveyê de; pêwîst e nivîskar valahiyên demjiyanên derbasbûyî bibîne û dagire. Valahî, xefk û dahfika mezin a civakan e. Dikare bibe sedema têkçûnê. Dîrok valahiyan qebûl nake. Barekî giran e, lê di jiyana berdewamî ya gelan de girîng e. Ev jî tê wateya ku nivîskar mecbûr e, bibe efendiyê dema xwe. Eger ev serdestî were bidestxistin, hingî nivîskar dibe serdestê dîrokê. Hingî, mîna zanyarekî/ê, berhemên xwe di nava disîplînekê de, bi mîtoloji, folklor, ol, huner, cografya, metafîzîk, serpêhati, tevgera sosyolojîk, biwêj û rastiya demê re dihûne û di giyanê tîpekî de, di beşeke jî yê jiyanê de, estetîze dike û dide. Ev armanca nivîskar e.

Nivîskar çavdêr e, lêkolînêr e, di heman demê de zanyar e. Rastiya îro di neynika mêji de; bûyer û pêhatiyên doh di tevna hest û giyanî de; gelefek û tevgerên îro di guhertinên civakî de dibîne, neqîş dike û parçe bi parçe radestî sibehê dike. Çavdêriya qîr û teşqeleyên komên xelkê, tevger û guhertinên mezin ên cîhanî, di “tîpê nû” yê mirov de, bi nêrîneke “jî jêr ber bi jor” û di çarçoveya “giyaneke gerhok” de diji û dide. Ev demjiyanên girîng ên civakî ne. Ev demjiyan dibin pêlên çemê dîrokê. Dîrok, romana herî mezin (hinek kes jî, dîrokê romanivîsê herî mezin bi nav dîkin) a berhema mirovahiyê ye. Herka jiyana bê rawestandî, di nava bûyerên dramatîk de berdewam dike. Carcaran bi qasî evîneke mezin, an jî evîneke platonîk dibe; carcaran bi qasî rastiyeke civakî dibe; carcaran dibe rêzexekekê dramatîk. Cîhan dizivire. Bi her zivirandinê dem û heyam derdikevin holê. Di nava dem û heyaman de, civak û mirov jî diguherin. Bi vê guhertina berdewamî re, pêdivî jî zêde dibin.

Lêgerînên mirov jî di heman çarçoveyê de, geh li erdê, geh li bin erdê, geh li ezma-

nan dewam dîkin. Çerxa jiyana abadanî her û her digere. Ya girîng, cihgirtina berdewamiya di vê gerê de ye.

Rastiya gelê kurd volkana teqiyayî ye

Ev gotinên di destpêka pirtûka hevbeş de, rastiya erdnîgarî û rastiya gelê kurd tîne ziman. Erdnîgariya Kurdistanê û rastiya gelê kurd, hîna “volkana teqiyayî” ye û kes nikare nêzikî pêtên agirê volkanê bibe. Volkana teqiyayî ku sed sal in hîna agirê wê sar nebûye, jî aliyekî ve xwe, jî aliyê din ve jî derdorên xwe dişewitîne. Ev navê bextreşîya cîhana berjewendîperest e. Ji ber ku hêzên bazîrgan, xaka Kurdistanê kirine holka pîkola hespên xwe. Ev pîkol li ser dilê gelê kurd tê kirin. Mîna di destanên kurdî de tê gotin, ev “şerê reş û spî” ye. Li ser pîra di bin heft qatên erdê de, “beranê reş û spî” şer dîkin. Mîrza Mihe-med jî, divê ku xwe biavêje ser beranê spî. Eger bi şaşî li ser piştê beranê reş siwar bibe, wê bikevê bîra zerzemînî. Gelê kurd îro li devê bîra zerzemînî ye. Mîrzayên gelê kurd jî şer dîkin. Teyrê Sîmur jî bendeyî wan e. Lewra asoyên dahatûya gelê kurd, bi mij û moran e.

Qîr û awaza mîrzayên kurd, mij û moran berteref kirine, lê qelemşorên Kurdistanê, hîna qelemên xwe “reşîd” nekirine. Di nivîskariyê de rûşt, girîng e!

Şûr û gotin û şerê hevpar

Gelê kurd, yek jî gelên feylesof e. Lê hîna feylesofê wejeya xwe dernexistiye holê. Mîrateyeke beyar e. Ev navê şerê şûr û gotinê yê hevpar e.

Magazîna civakên serdestên cîhanê bi van mînan dagirtî ne. Şûr û gotinê şerê hevpar kiriye û îro di magazîna wejeya van gelan de, bi hezaran cildên li ser hev hatine nijinandin hene. Ev hebûna girîşên kulturê ne û nîrxên herî giranbiha yê civakan e. Her kolana bajarên van civakan,

bi navê nivîskar, zanist û feylesofan tên binavkirin. Lewra bê tirs dibêjin: “Bajarên me, ji peykerên cihanê yên herî delal û xweşik, binirxtir in.” Ev qedr û qîmet ê girîşên kultura ku nifşan radestî nifşan kirine û hatine parastin e.

Helbet, duyemîn şer ji, li dijî bexîliya cihanê ye ku ji bo berjewendiyan, nasnameya gelan, alfabeya gelan, dîrok û kultura gelan tê înkarkirin e. Înkarkirin, tê wateya ji holê rakirinê. Ev rakirin, di rengê “qirkirina reş” û “qirkirina spî” de tê kirin. Lewra barê gelê kurd giran e û ev barê giran ne tenê para mîrzayên li serê çîyan e. Ji ber ku “qirkirinê reş û spî”, aliyek şûr e, aliyê din jî gotin e. Cengawerên gotinê, nivîskar in. Nivîskar, berpirsiyarên qedim ên zanist û têgihiştinê ne. Qedim û zanist û têgihiştin mertalê herî bi hêz ya li dijî qirkirinan e û bi hêzkirina hest û mêji ye. Dermanê herî bi bandor ê rehetkirina birîna mûmarî ye.

Li gorî vê rewşê:

Dema ku alfabeya gelan were înkarkirin, jiyana gelan jî tê kilişkîrîn.

Dema ku nasnameya gelan tê înkarkirin, hebûna gelan jî tê kuştin.

Dema ku dîrok û kultura gelan tê înkarkirin, jiyana gelan jî tê kuştin.

Di rewşeke wiha de, binbarî û berpirsiyariya roman û çiroknivîsên kurd, helbet bi qasî vî şerê girîng, bi qasî têkoşîna “man û nemanê” girîng e. Pêdiviya gelê kurd jî, mîna her gelê cihanê bi dîrokê, bi ziman, bi felsefeyê, bi cografya, bi fizîk, bi kimya, bi tib, bi astronomî û hwd. bi her cure zanistê heye. Di magazîna wêjêya ku wek nîrxê giranbiha yên civakan tê hejmartin, beşa romanê, hinekî cudatir û bi bandor e. Roman, navê guhertina karbîdestî û karsaziyê ye. Bi bajarvaniyê re derdikevê pêş û bi hêz dibe. Her çiqas destpêk sedsala 17. bi romana Miguel Cerwantes, “Don Quijote” dest pê kiribe jî, di sedsalên 18 û 19’an de, bi nasnameya serketî derdikeve holê. Sedsalên 18 û 19’an, ruşta romanê ye. Di nava demê de, roman her cure zanistê jî, di nava xwe de radigire û berdevkiya guhertinê dike. Roman, eger navê

dîrokê, felsefeyê, cografya, ziman, folklor, hest, kesayetî, civak, psikolojî, giyan û alfabe, folklor û navê hebûna her cure zanist, tevger û toreya civakî be; dibe ku di bin barê gelê kurd ê giran de jî rabe. Civaka kurd, bi jin û zarok û ciwanên xwe ve, di nava bûyerên dramatîk de dipelixe, tê kuştin. Her bûyer û pêhatî rûpelekî vê romana nehatiye nivîsandin e. Di rewşeke wiha de, pêwîst e beşên wêjeyî tevan, mîna demjiyanên berê; wek destan, çîrok, helbest û darbîmeselên civakî teva, rabin ser lingan û şer bikin. Bûyerên dramatîk ku civaka kurd kirine bin esarê/perçiqandine û di nava diranên çerxa nijadperestî û berjewendiyan de dihêre. Ev navê romana kurdî ye. Lê romana ku hîna nehatiye nivîsandin e. Romanên ku Henry James dibêje; “ji jiyanê rastir in’ an jî, “bûyerên ku rastiya jiyanê derdixin pêşberî mirovahiyê” ne. Eger roman tişteki wiha be, dibe ku di wêjeya kurdî de, hêza xwe destnîşan bike. Atmosfera dramatîk a jiyana gelê kurd bi cihanê bide naskirin. Pêwîst e romanivîsên kurd, nekevin şaşiyên Amîn Maalouf, ku di çarçoveya dîroknivîsîyê de, yan jî nekevin şaşiyên Paulo Coelho ku di çarçoveya olî de, hunera romanê lewaz û şikestî kirine. Hesenê Metê, di Labîrenta Cinan de, dûçarî rexneyên Freud ku li Dostoyewskî kirine dibe. Roman, exlaqê civakê ye. Roman tevna civaka nû ye. Pêwîst e nîrxên civakê jî biparêze. Eger felsefeyê di nava xwe de ragire û “tîpê nû” derxe holê, rastî ev e.

Roman divê ku şoreş be

Roman, eger jiyan be; rewşa dramatîk a gelê kurd, dîroka mirovahiyê ye û mirov dikare bibêje ku mirovahî di qonaxekê de ye. Qonaxeke azmûneyî. Gelê kurd jî mîna her gelê cihanê, demjiyana feodalî derbas kiriye û di nava modernîteya cihanê de, berxwedanê dike. Berxwedan û têkoşîna gelê kurd di çarçoveya “man û neman”ê de be jî, di nava lêgerîn, guhertin, nûjenî û modernîteyê de ye. Di guhertin, nûjenî û lêgerînan de, pêr, doh û îro bi hev û din ve girê dide û ber bi sibê ve diherikîne. Lewra wek sistemekê tê binavkirin. Wek şoreşekê tê nixandin. Eger tevgera civakî ya gelê

kurd şoreş be, pêwîst e wêjeya kurd, di serî de romana kurd jî, şoreş be û di guhertina nû de, bikaribe herka çemê dirokê ji her aliyê ve biguhere. Yan jî bibe pêlên vê her kê. Romana kurd, dikare bê-edaletiya cihanê ya li dijî gelê kurd (mîna Victor Hûgo û Xizan) bîne ziman. Dikare şerê azadiyê, (mîna Margaret Mitchell, Wek Ba Hat û Çû, ya li ser şerê hundirîn ê Emerîka) bîne ziman. Utopya Tomas Mann dikare mîna romanên sedsala 19'an, têkçûna feodalî û guhertina civakî û hwd. realîteya gelê kurd bîne ziman, da ku di hûnandineke hunerî û estetîkî de bangî hest û mêjiyê mirovahiyê bike. Da ku, bibe bingeha çalakîya guhertina nêrîn û dîtina mirovan.

Bê çawa romana Frensa, bû nexşeya tevger û qîr û teşqeleyên civaka frensî; bê çawa romana Rûsyayê bi wêne û rengîniya civaka Rûsyayê; bê çawa romana Latîn Emerîka, bû berdevkê guhertin û berxwedana civakan, pêwîst e romana kurdî jî, bibe berdevkê rewşa dramatîk a gelê kurd û nasnameya paşerojan.

Eger Victor Hûgo, bûbe berdevkê zarokên Parîsê, bûbe navê xizaniya Parîsê, dibe ku romanivîsên kurd jî, wê hêzê di xwe de bibînin ku bibin berdevkê zarokên Amedê, bibin berdevkê gundiyên ku xaniyên wan bi ser serê wan de hatine hêrifandin û li guhê bajaran şerpeze bûne. Eger Dostoyewski bûbe berdevkê civaka xizanên Moskoyê û dîmenê civaka demjiyana Çarîtiyê neqîş kiribe; Sholohov bûbe berdevkê mîrxasî û guhertina demjiyana gelê Rûs û xwe berpirsiyar û binbarê çavdêriya heyama xwe dîtibe; dibe ku nivîskarên kurd jî, bi heman binbarî û berpirsiyariyê, bi heman hest û baweriyê tevbigerin. Dema ku mirov dixwaze diroka Frensayê fêr bibe, dibêjin; "Balzac bixwîne". Balzac wek bavê romanê tê binavkirin û sosyolojiyê kiriye romanê. Dikare bibe mînak ji nivîskarên kurd re.

Ev tê wateya ku roman, dirok û sosyoloji jî di nav de, her cure zanistê di nava xwe de radigire û di nava hûnandina tevna xwe de bi awayekî nerm û bandora li ser hest û mêji datîne ber xwendevan.

Roman, exlaqê civakê diparêze

Mîna ku Freûd dibêje, roman di avakirina exlaqî de jî pêwîst e bi binbarî û berpirsiyarî tevbigerê. Freûd, ji sedema ku Dostoyewski di romaneke xwe de, bav têkildarî keça wî kiriye; yanî bav destdirêjiyan li keça xwe kiriye, bi tundî rexne dike û bi bê exlaqî bi nav dike. Exlaq, bingeha civakê ye. Freûd jî, vî nîrxê giranbiha li ser milê romanivîs datîne. Ji ber vê çendê min Labîrenta Cinan anî ziman. Niheqî ye!.. Romanivîsên kurd, di nava kesayetîya şikestî de, keçên gerîla aşîqê fermanदारên artêşa tirk kirine. Ev balkêş e. Hinek ji romanivîsên kurd, navê xaka kurdan, navê Kurdistanê di romanên xwe de nenivîsîne. Mînak; Mehmed Uzun... Lingên van nivîskaran li hewa ne. Rêbazek heye: Lehengê tu roman bandorê li nivîskar nakin. Nivîskar lehengê romana xwe ye û eger şaşiyên ku me li jor anîne ziman bikin jî, ew nivîskar, di kesayetîya xwe de, ji darbeyên kuştina dijmin a kesayetîya şikestî xelas nebûye. Hîna xwedî giyan û hestên kole ye.

Nexwasim ji bo civakên tertûbela û dibin zext û zora parçebûnan de... Wek mînak: Gelê kurd, di heyamên berê de, li her bajarî xwedî hezar (herî kêr) sazî û dezgehên pişeyî bû û heta salên 1812'an jî, di aliyê xwarin û cil û bergan de pêdiviyên artêşa osmaniyan pêk dianî. Lê piştî ku Komara Tirkîyeyê hat damezrandin, bi siyasetên fermî, ev sazî û dezgehên pişeyî tev hatin kuştin. Bi awayekî zanîn û siyasetên demdirêj û qanûnên li dijî hebûna gelê kurd, aboriya gelê kurd hate pûçkirin. Heta îro jî, yek kurdê xwedî rastmal, nikare li Kurdistanê karsazî û karbidestiyekê bike. Bi zanîn û armanç binesaziya karsaziyê nehatiye avakirin. Ji bilî vê, vekirina karxaneyan jî hatiye astengkirin. Li her bajarê Kurdistanê bedestaneke hebû, ew bedestanên mal û pişeyên cur be cur ku lê dihat firotin bûn. Îro bûne bedestanên qaçaxê. Yanî bedestanên bazara qedîm, bûne cihê tewanbarî û gunehkariya qaçaxê. Polîs, an jî rayedarekî dewletê, her dem dikare listikan di wê bedestanê de bike. Mirovên ku malê qaçax di dikanên xwe de bifiroşe, her dem di bin tîrsê de ye.

Siyaseta dewleta Tirk, ji bo gelê kurd cureyên tirsê afirandine. Yek ji van ayîngeha tirsê, bedestan in. Ev navê Romana Tirsê ye.

Wêjê bi wesayet çênabe

Bêguman, li cîhanê wêjeya Stalînîst û wêjeya Mc Carthy, ku li diji hev ketibûn nava pêşbazîya siyasî; huner û wêje wek alavê siyasî bi kar dianîn jî hene. Helbet, wêje têkildarî siyasî ye. Lê pêwîst e wêje nekeve bin zexta siyasî. Huner û afirgerî bi wijdan ve girêdayî ye. Huner û wêje fermayîna siyasî qebûl nakin. Wêje û desthilatdarî her dem, di nava nakokîyan de ne. Nivîskar, nikare berhema xwe bike “due-toya” pragmatîka “alav û armanca siyasî”. Îro jî, romanên di bin bandora îslamî de tîn nivîsandin û wek xelasiya giyanê mirov tîn binavkirin, ji zihniyeta Stalîn û Mc Carthy ne cudatir in.

Aliyekî din e madalyonê heye: Zihniyeta ku dibêje, siyasî û huner jî hev dîr in. Ev zihniyet çarçoveya huner û wêjeyê teng dike. Piranî li dewletên militarîst, ên weke Tirkîyê, bi vî rengî huner û wêje tê bertekîrîn. Nivîskar û hunermend derî jiyanê, derî civakê tîn hiştin. Huner û wêjeyê, pûç û bê wate dikin. Di rewşeke wiha ya fermî de, wêje û huner dikeve destên mirovên ku “taşarontiyê/emanetiyê” dikin. Hingî huner û wêje li hemberî siyasî û dikevin rewşeke lewaz û têkçûyî. Li dewletên militarîst, gelek caran bi qanûnan, wêje û hunerê dikin tara bêjîngê. Yanî tîkîliya hegemonîk a navbera wêje û siyasî, bi vî rengî tê destnîşankirin.

Lewra li Tirkîyeyê nivîskar, sazîyên nivîskaran, ji bo mafê kulturî, demokratîk, perwerdehî û zîmanê kurdi, dengê xwe derxistin. Yê ku derdixin jî bi hejmar in.

Kurdistan ku bi deşt û newalan, bi çiya û çeman dewlemend e, wargehên çandî û xwedîkirina sewalan dewlemend bûn. Heta salên 1960 û 70'yî, tevrikvan û palevan, cenan û baxçewan ji Derya Reş û Anatolya navîn dihatin Kurdistanê kar dikirin; lê di demên dawîn de, gelê kurd, li herêmên Derya Reş û Egeyê, bûye palevan

û tevrikvanê rojane.


Gelê kurd îro bi birçibûnê re rû bi rû maye.

Ev rewşa kambax berhemên bîrdoziyên aborî ku bi navê “Bîrdoziya Dojehî” û “Bîrdoziya Tevnepirkê” tîn binavkirin in. Baş tê zanîn ku di literatûra aborî de, “Bîrdoziya Gandhî” heye. Ev bîrdozî parastina sazî û dezgehên pişeyî yê biçûk in. Ev pişesazîyên ku me li jor, li her bajarên Kurdistanê bi hejmara hezaran destnîşan kirin, di çarçoveya Bîrdoziya Gandhî de tîn hesibandin. Gandhî, di şerê li dijî dagirkeriya îngilîzan de, ji gel daxwaz kir ku van pişesazîyan biparêzin. Parastina pişesazîyên malbatî dihatin wateya debara rojane. Malbatan, bi van dezgehên pişeyî debara xwe ya rojane dikir. Li Kurdistanê ev pişesazî tev, bi siyasî û fermî hatin kuştin. Ev navê Romana Xizaniyê ye.

Li Kurdistanê tiyatro

Bîngeh û alavên ku dikarin bibin bîngeha romanê, bibin bîngeha çîrok û çavdêriyên rojane, “kultura rojane” pir û pir hene. Erdeke beyar e û li bendeyî cotkirinê ye. Eger nivîskarên kurd, bi rastî cotkar bin û di cotkirinê de gêsî li lingên gadin, wê fîrazeya wan, ji ya hempişeyên cîhanî ne cudatir be. Tê gotin ku roman bi avabûn û sazûna bajarên bi pêş ketiye. Li gorî min ew mijara nîqaşê ye. Ji ber ku bîngeha romanê, çîroka dirêj e û ev çîrokan dirêj, ji bo xanim û xatûnên ji Ewropa diçûn Qutsê (ku bi rê de bixwînin) hatin nivîsandin. Gotina roman jî, ji zîmanê gel hatiye afirandin.

Çîrokbêjiya kurd navdar e. Afirîneriya civaka kurd a çîrokan jî navdar e. Civaka kurd bê çiqas evîndarê folklor û efsaneyan e, ew qas jî evîndarê çîrokan e jî. Feylesofiya gelê kurd, hinekî di çîrokbêjiyê de derdikeve pêş. Ev navê afirîneriyê ye. Di şevên dirêj ên zivistanî de, li odeyên gundan, çîrokbêjiyê heta demên dawîn jî dewam dikir. Çîrokbêjiya civaka kurd, berî çîrokbêjiya gelên Ewropî dest pê dike. Lê balkêş e, romana Ewropayê, piştî bihêziya tiyatroyê derdikeve holê û xwe dide qebûlkirin.



Roman berhema sedsala 18 û 19'an e. Lê tiyatroyê kevin e. Ji ber ku destanbêj cureyekî tiyatroyê ye û li meydana dihatin gotin. Destanbêj, di dema gotinê destanê de, mecbûr bû hinek rolan jî bilize. Em jî çirok û efsaneyên kurd fêm dikin ku di bi-jartina "keya", "serkêş" û lehengan de, teyrê dewletê hebû. Ev toreya bi-jartina serokên civakê, di rengê tiyatroyê de pêk dihat. Serkêş, an jî keyê (qral, siltan) kevn dema derdiket pêşberî serkêş û keyê nû, toreke li meydana û listikeke tiyatrowarî pêk dihat. Ev toreya qedîm, heta salên dawîn ku di zêwan de jî bi rengên cuda de dihatin listin. Li Ewropa bi ola xiristiyanî û ji bo propagandeya olî, tiyatroyê di rewşeke rêkûpêk de derket pêş. Di nava civakên misilman de, kurd û hwd. Di rengê canbazî û zirtekiyê de derket holê. Ev kar, di nava demê de wek karê aborî jî dewam kir. Piştî demekê, mirovên ji malbatên hunermend, di dawetan de ev listik dilistin. Du, sê mirov bûn. Yek jin, ê din mêr û skêçên kin dilistin. Navê kesên ku bi cil û bergê jinê derdikete holê, jine, jenke, jinke bû... Ji sedemên dagirker û zihniyeta bargiran a ola îslamî, ev toreya qedîm wînda bû û jî holê

hilat. Li Ewropa, ev huner bi saya dêrê, kete pêvajoya nivîskî û bi beşên pirtûkên pîroz ket jiyanê. Di sedsala 10'an û sedsala 13'an de, hunerê tiyatroyê wek pişeyekî civakî û li derî dêrê bi pêş ket. Li welatên weke Îngiltêre, bi erebeyên li pey hespan li bajaran digeriyan û li meydana dilistin. Mîna li zêwanê Kurdistanê, komên tiyatroyê peyda bûn. Di sedsala 17'an de jî, li Ewropayê tiyatroyên neteweyî hatin sazîkirin.

Îcar destanbêjî, zêw, listikên di dawetan de, di serê salê de, di serdanan de, di meha remezanê de, heta salên 1960'î, li hinek herêmên Kurdistanê dewam dikirin.

Mirov dikare hunera civaka Kurd, ku temsîliya kulturê dikin, jî yê civakên cihanê dewlemendtir û zêdetir bihejmêre. Lê ola îslamî jî aliyekî ve, siyaseta fermî ya hêzên dagirker jî aliyekî ve, wek teyroka tofanî li çanda kurd da, qersifand, têk bir.

Kuştina kultura kurd

Tiştêkî din; eger zimanê gelê kurd qedexa be û bibe sedema cezakirinan; alfabe qedexa be û gotina kurdî û nixrên kurdî qedexa bin; zarokên kurd di dibistanên

asîmilasyon û dewşîrmetiyê de werin perwerdekirin; zanîngeh li gorî îdeolojiya fermî perwerdehiyê bidin; hiqûqa dewleta dagirker li dijî hebûna gelê kurd werin amadekirin; bêguman wê nivîskarên bi nîfşê xwe kurd, ku bi zimanê dagirkeran dinivîsin, nîrx û pîroziyên gelê xwe jî, bi gotin û hevokan, li ser rûpelên, çîrok û romanên dijmîn binivîsin û bikin malê dagirkeran. Mînak Yaşar Kemal û Bekir Yıldız... Bixwazin nexwazin wê vê bextreşiyê destnîşan bikin. Ji ber ku nivîskar hinekî binyata xwe, jiyana xwe, hişmendiya civaka xwe û hestên ku ji civaka xwe standiye dinivîse û wek malê dagirkeran pêşkêş dike. Dagirker jî wê siyaseta “nîn e, pûç in, bi dûv in, paşketî ne, xeşim in” bimeşîne û her tiştî ji xwe re bike mal. Mînakên vê jî li Tirkiyeyê zêde ne.

Binbariya romana kurd

Di çarçoveya van rastiyan de; pêwîst e romana kurdî di rûpelên xwe de, tevahiya dîroka kurdan, tevgera civakî ya dramatîk bi cih bikin û bidin xwendin. Helbet di nava qîr û teşqeleyên civakî de, qonaxên guhertinî, êş û azarî, coş û xiroşî, tore û şikestikên kesayetî, di hûnandina rengîniya cureyên romantîzmê de, di pêkhatinên sosyolojîk de û bi cewherê estetîkî wê werin dayîn.

Lehengên romana kurdî, dibe ku di çarçoveya dîroka civakî de derkevin pêş. Ji ber ku civaka kurd serûbinî hev bûye, pêdiviya hûnandin û avakirina ji nû ve heye. Civaka kurd di qonaxa îroyîn de, li gorî sistemekê tevgera xwe, rêxistinîya xwe dike. Dibe ku di vê hûnandin û rêxistinîyê de, wêjeya kurdî rola xwe ya stêwîhandina hest û mêjî pêk bîne. Di vê qonaxê de roman wê xwedî giranî be. Ji ber vê çendê, min behsa lehengê romanê kir. Ji ber ku guhertina civaka kurd kolektîf e. Roman, her çi qasî ne karê kolektîf be jî, binyata xwe û naveroka xwe li ser kolektîvîzmê rûdinîne. Li gorî pêşketinên dawî, gelê kurd jî lîberalîzma Ewropayê dîr e. Li ser binyata qedîm, kolektîvîzmeke nû derdikeve meydanê. Nivîskarên kurd jî pêwîst e di vê qonaxê de bikaribin

bersiva vê rewşa kolektîf bidin.

Belkî di destpêkê de xwendevan bibêje ku lehengê romana kurdî nîn in û di çarçoveya romanîvîsê de wek qelsiyekê xuya bike. Lê romana kurd, li gorî rewşa gelê kurd e. Gelê kurd di nava malbata cihanê de cihê xwe neditiye. Hêzên serdestî cihanê, gelê kurd, li derî malbata cihanê hiştine. Ev neheqîya mezin, di destpêka sedsala bîstan de dest pê kir û di sedsala bîst û yekê de jî dewam dike. Eger romana kurdî, vê neheqîyê neyîne ziman û li dijî vê dagirkeriya cihanî, li dijî vê kuştina global dernekeve, wê çawa bikaribe rastiyan gelê kurd bine ziman?

Di nava gelefek, qîr û teşqeleyên hêzên global de, gelê kurd wek mîrowa di nava lingên filê de ye. Lê, di nava bîst û pênc salên dawîn de hat xuyakirin ku rastî ne wilo ye. Lehengên nû yên gelê kurd û pêşengên gelê kurd yên nû, bi degelîyeke destanî derketin pêş û daxuyakirin ku ew, ji filan mezintir û bihêztir in.

Ev noqteya spî ye û di nava xeta reş ya çavkaniya çemê jiyanê de xuya dike. Ev noqteya spî, rastiya gelê kurd e û di nava qatmanên sedsalên dawîn de, winda mabû. Îro di kolanên arkeolojîk ên bi berdêlên mezin, ji nava gora betonkirî hate derxistin û di navenda rojeva cihanê de rûnand. Wek gotina ku dibêjin: “Agir tenê bi destê mirovan tê pêxistin.” Îcar leheng û pêşengên gelê kurd, ev agir pêxistin û wek volkanê bê rawestandî teqandin. Pêtên volkanê, dest û lingê hêzên dagirker dişewitîne. Eger di vê rewşa xêrdinî û têr hêvî de, romanîvîsên kurd, hina ji keçên kurd, keçên gerilayên kurd ku destanan dinivîsin, di hûnandina romanê de aşîqî efser û fermendarên hêzên dagirker bikin, rastiya gelê kurd fêr nekirine. Lingên wan nivîskaran jî li hewa dimînin. Eger romanîvîsên kurd, bûyerên dramatîk di cografyaya Kurdistanê de, bi nav û cih û war nekin, ji rastiya gelê kurd û Kurdistanê dûr in. Eger, romanîvîsên kurd, destan, efsane, folklor, tore û dîroka gelê kurd, kevn û nû, di nava hûnandina romanê de bi nîgarkêşîyeke estetîk û rastiya sosyolojîk rûnenîne, ji cehaletê, yan

jî ji kesayetiya şikestî ya bindest xelas nebûye. Eger roman, navê dîrokê be, yan jî eger dîrok romanivîsa herî mezin a jîyanê be, dibe ku romanivîs dîrokzan be, sosyolog be, feylesof be. Nivîskar, mecbûr e ku ber bi navenda kêşa avakirin û vejîna gelan ve gavan biavêje, da ku cîhanê nas bike; da ku bi naskirina cîhanê re, gelê xwe jî bi nirx û demjiyanên qedim nas bike.

Nivîskarên kurd û lewazî

Mijarên ku min li jor hejmartin, rexneya Freûd ya li Dostoyewskî ye. Lewra romana kurd, di vê hêlê de qelsiyêke bingehîn diji. Hîna paşnavê gelek nivîskaran bi zimanê dagirkeran e, hîna gelek nivîskar li devê dergehê asimilasyona dagirkeran dilikumin. Hîna gelek nivîskarên kurd bi zimanê dagirkeran dinivîsin. Nivîskarên kurd, di vir de qelsiyêke dijîn. Saziyên nivîskarên kurd, hîna xwe xwediyê zimanê kurd, xwe xwediyê kultura kurd neditine.

Baş tê zanîn ku gerdûn, ji devê pîpînka devê deriyê mirov dest pê dike. Baş tê zanîn ku Tewrat pirtûka bûyeran e. Lê baş tê zanîn ku Tewrat, derdorê çil caran hatiye guhertin. Yanî Birahîmê kurd, di bîrûbawerîya xwe ya êzdî de, di nava demjiyanên tîr qîr û teşqele de, li gorî civaka nû ya cihû hatiye guhertin. Wêjeya wan jî di heman temtêlê de hatiye sazîkirin. Li gorî demjiyanan û li gorî guhertinên civakî, cil û bergên wan cuda hatine sazîkirin. Çima, ji ber ku gelê cihû, di dîrokê de bi qasî êrişên mezin ên dramatîk bûye. Bi qasî êrişên tunekirinê bûye. Lewra siyaseta wêjeyê ji hev cuda nekiriye û di çarçoveya eniyên kar û xebatên cuda de û li gorî adabaşên karmendiyê, lê di nava kolektivîzmeke xurt û qewî de afirandine.

Dîroka dramatîk a cihûyan, hinekî dîroka gelê kurd e.

Di demên dawîn de tê xuya kirin ku, romanivîsiya kurd zêde dibe. Belkî ji hêza romanê tê ev yek. Belkî nivîskarên kurd holkê vala dibînin û dest diavêjin zewiyên beyar. Rast e, holk vala ye û zevî jî beyarin. Ev ji aliyekî ve şanazî ye, ji aliyê din ve

ji sedema ku pişeyê rexnegirîya kurd nîn e, mirov dike nav tîrsê jî. Roman, karê herî zor ê wêjeyî ye. Tevnpêjiyêke xurt, hişmendiyêke dûr û kûr, semaxeyêke degelî, naskirîneke berfireh a civaka kurd dive. Wêje bêsêrûber jî çênabe. Rêkûpêkî û disîplîn e. Rêkûpêkî û disîplîn, bi perwerdeya zihnî û bedenî pêk tê. Civaka ku di her warî de qedexekirî ye, di her gava ber bi azadî û nasnameyî de birçiyekî kur e. Destên xwe dipalîne. Lê dem wê werê ku tîr bixwe. Piştî ku civakê tîr xwar, wê tamijandina tunebûna ji sedema qedexeyan ji bîr bike û çavên xwe li nirx û tamûtîkan bigerîne. Wê nişmî bibe. Hingî bêjîngkirina nivîskar û berhemên nivîskaran wê dest pê bike.

Lewra ez dibêjim, pêwîst e nivîskar ne îro, bi qasî Nuh temenekî bide ber xwe, bi qasî Zerdeşt felsefeyekê di serê xwe de rûnîne, bi qasî Birahîm qonaxan li pey xwe bihêle, bi qasî Ehmedê Xanî hêviyan mezin bike; da ku dikariye li ber çerxa felekê û hêrtina ferên aşê jîyanê di ber xwe bide û mayînde bibe.

Xala dawîn; ez û roman

Min di destpêkê de, sê tiştên bingehîn rêz kirin. Yek; pirtûk alava tîkiliya civakê û alava tîkoşînê ye. Du; nivîskar çavdêrê demjiyana xwe ye û sê; xelesa navbera doh û îro, îro û sibe ye.

Mijarên din jî, neynika min in û wek rêbazeke sereke her dem li pêşberî min in. Dema ku ez li ser mijara romaneke nû, li ser plansaziya romanê, li ser nivîsandina dabaşa çîroka romanê; destnîşankirina leheng, cih û war û demê, radiwestim û krokî derdixim holê, bi sê kevirên bingehîn re, van xalan jî li ber çavan digirim. Dekora min her dem cografyaya Kurdistanê ye, malbat û mala kurdan e, xanî û gund û bajar û kolanên Kurdistanê ne. Li cihekî wek cografya Kurdistanê bûyîn, şansek e. Şansê cografya herêmi... Her herêmek ji cografyaya Kurdistanê cihaneke cuda û îronîk e. Her cografya îronîk, bi efsaneyên mîtolojîk û bûyerên dramatîk hûnandî ye.

Di dema ku min, Dora Bacinê Bi Dar e jî nivîsî, min kolanên bajarên Ewropa, ke-

virên kûç û anîşkên xaniyan, kevirên resî-fên kolanan, bi yên Kurdistanê re kirin yek û xemla lehengên xwe û ava kimyewî ya mêjiyê lehengên xwe, ji Kurdistanê qut nekir. Aliyê din, min hest û kesayetîya kurd, di kolanên Ewropa de, di nava rengî-niya hebûna Ewropa de têk nebîr.

Bêguman her dem wêjeya devkî, efsane û gotûbêja epîk, folklor û minakên efsûnîya erd û mirovên Kurdistanê, bi çîrokbêjiya xwe dikim yek. Yanî ez çîrokbêjiya feylesofîk a gel û çîrokbêjiya xwe bi hev re dihûnim.

Ji ber ku ez xewnên xwe li Kurdistanê, dem deman jî di zindanan de, di bin zext û zora polîsan de dibînim. Ez û hestên xwe, ez û mêjiyê xwe ji Kurdistanê û dagirkeriya dijmin xelas nebûne. Dixwazim ku pênuşa min azad bibe.

Ferhenga zimanê kurdî ji bo min girîng e. Di romanên min de, dewlemen-diya zimanê kurdî, di her hêlî de xuya dike. Lewra gotinên min wek afirîneriya “mît”ên herêmî derdikevne pêş, lê rastî ferhenga gelê kurd e ew. Ji ber ku gundiyan Kurdistanê, di şikeftên “baneyî”yan de, navê darikê cildaleqandinê jî lê dikirin. Û gotiyê kêzim... Gundiyan Kurdistanê, do hişmendiya xwe ya feylesofîk de, beresva her tiştî daye. Li hemberî xweza û pêdiviyên cihanê şîlo bûye, bi degelî/bi zirav tevgeriyaye. Fîgurên civaka herî pêşketî, di her cure hunerê de û bi xemla estetîkî afirandine. Folklorê kurd minaka vê çendê ye. Û wêjeya devkî...

Ev, ji bo min girîng e. Ji ber ku hîna ferhenga zimanê kurdî nehatiye nivîsîn, an jî ferhengên ku hatine amadekirin, bersiva zimanê kurdî nadin. Lewra hêza zimanê kurdî û çavkaniya ferhenga kurdî, bendeyî lêgerîneke berfireh e. Û pêwîst e... Ev dewlemendî, di devê lehengên romana min de, wek felsefeya civaka kurd derdikevê pêş.

Ligel min, pêr, doh û îro jî hev nayê qut-kirin. Di her romana min de ev xelekên dîrokî, valahiyên demjiyanên kujerî ku dîrok, kultur û civaka kurd perçe kirine, jî hev dûr kirine, dadigirin. Ji hindikahî ve, ez

hewl didim ku van valahiyan dagirim.

Ez, ji pîşeya rojnamevaniya 37, 38 salan tîm û bûyerên dramatîk ên li ser gelê kurd û hêza dagirker a li ser kesayetîya kurd baş dizanim. Bi qasî civaka xwe, dijmin jî nas dikim. Bi qasî tîkbi-rîna kesayetîya kurd, hêza asimilasyon û bandora neyînî ya dijmin jî nas dikim. Bêguman pîşeya 37, 38 salan, ji aliyê hêza “kultura rojane – cultur de jour” ve ez bi hêz kirime. Eger ez, hêza bikaranîna kultura rojane û wêjeya kûr û bilind a romanê, bi hev û din ve girê bidim û di nava hûnandina estetîk de, bi hêza sosyolojî û bandora dîrokê neqîş bikim, guman dikim ku ez ê bikaribim bersiva demê bidim û wek çavdêrekî dema xwe, mesajên jî radestî paşerojan bikim.

Bijartîneke romana gund û romana bajaran, ligel min nîn e. Di romanên min de lehengên feodal hene. Lê mîna ku dibin pêşengîya Tevgera Azadiya kurd, ku min li jor, navê cengawerên kurd, wek Mîrza aniye ziman; civaka kurd hatiye guhertin û feodalên Kurdistanê (ji bilî tîkildarên dewletê) jî hatine guhertin. Ev mînak di romana min a Çîroka me de, baş xuya dike. Ez gund û gundiyan li derveyî dabaşên romana xwe nahêlim. Ji ber ku gund û bajar hev û din temam dikin. Şoreşa kurd, bi saya gundiyan gihaye qonaxa îro. Şoreşên cihanê jî, bi saya gundî û xizanan serkeftin bi dest xistine. Li aliyê din, nîrxên gundiyan ku di demsalên dûr û dirêj de, wek çîrokbêjî, destan û toreyên ku bîngeha sosyolojî li gel min jî bi nîrx in û girîngiyekê didim wan. Folklor jî, ferhenga kurdî jî li gundan hatiye parastin.

Di destpêka amadekariyên romaneke nû de, herî hindik klasoreke dagirtî ya notan li gel min amade dibe. Ez dabaşên romana xwe, bîyî ku eşkere bikim bi gelek mirovan re nîqaş dikim. Ev nîqaş, min jî gelek şaşîyan dûr dike û gelek rastîyên civakî jî li ser sifra min datîne.

Jiyan her dem li gel min bi efsane ye û mirov jî hinekî efsûnbaz in. Lewra çîrokbêjiya min, di çarçoveya çîrokbêjiya felsefîk a gelê kurd de dimeşe.

Ber bi romana kurdî ve

Hesenê DERWÊŞ

“Edebiyat, rojnivîska neteweyekî ye, çîroka rabirdû, niha û pêşeroja wî ye. Wek yekûnekê, kanona edebiyatê ya ku çîroka neteweyî qiset dike, li ser hîsa hemwelatîyê neteweyekî yekbûyî bawerîya însanan dimêzîne û tecrûbeya piştewaniyê li wan hêsan dike”

Kanon di yewnaniya kevn de tê wateya qanûn, rê û rêbazê. Bi kurtasî di roja îro de “kanona wêjeyî, di nav civakekê-komê de navê nivîskarê/a berhema ku pir pesnê wê tê dayîn e; navê pêvajoya ku ji teref medya, çapxane, antoloji, kovar, nivîskar, malper û hwd. Yê ku bi pesn, şîrove, nasandin û rexneya ku ji bo populerbûna nivîskar/berhemê tê kirin e. Berhem serkeftî dibe qels dibe, bes ku di riya îdeoloji û sekna wê dewletê an wê komê de be, ev bes e ji bo ku hin nivîskar, rewşenbîr, çapemenî û rexnegir wê derxin pêş. Listeya navan helbet ne hew ji teref dezgehan ve tê çêkirin, îdiaya min ne ew e ku kanon di demek kin de bi midaxale-yên îdeolojîk tî avakirin, bi rastî jî mijara avakirin û xerakirina “kanonên wêjeyî” hêjayî lêkolîneke zanistî ye. Em ji ku derê bidin li ber xwe bidin, em ê bibînin ku “kanona wêjeyî” mudexaleya “hezkirinekê çêkirî” ye.

Mijara vê nivîsê çend şax bi hev ve girêdayîn e. Mijara sereke “kanona edebî” ye helbet, lê ji bo ku mesele hebekî ji hev bê veçirandin ez ê hebekî têkevim nav bexçeyên cîranê vê mijarê jî. Wek mijara “Netew û Roman”²ê. “Weke avahiyek siyasî û çandî pênegi-

rêdana neteweyî, bi romana ku qala taybetiyên ku wê ji neteweyên din cuda dikin pir zehmet e.”² Tiştê sereke yê ku wê “cimeata mûxeyyêl”³ tîne ba hev û kesayetên wê li ba hev dihêle ziman e. Bela ku her çand di nav zimanekî de dilive, dipertite, xwe nû dike û bêhnê dide û distîne. Rêya nûjenkirina zimanekî jî, di nivîsa nesrê re derbas dibe. Bela ku roman avakirina cîhanekê ye, bi pêşdexistina zimanekî weke zimanê edebiyatê, bi rêya nesrê mimkûn e. Helbest wî zimanî bi tac dike. Belkî jî yek sedemên pêşdene-ketina zimanên kurdan, kêmbûna nivîsên pexşan (nesr) e. Heya berî niha bi çar pênc salan mirov dikaribû bigota helbest serdestê kurteçîrok û romanê ye di zimanê kurdî de. Lê van salên dawîn weke ku hebekî rewş tê guhertin. Bi rêya rojname, kovar û malparan nesr bi hawayekî ber bi çav bi pêş de dikeve. Kurteçîrok û romanên ku tîne

weşandin derî û îmkanên nû li ber xebatkarên li ser zimanên kurdan vedikin.

Ji sala 1995’an vir ve romana kurdî bi hawayekî ber bi çav di nav tevgereke germ de ye. Mirov

dikare di nav sedemên vê tevgera germ desketînên başûr, xebatên kurdên li diasporayê (taybetî jî ê li

Swêdê), guhertinên li bakur, çêbûna medyayeke kurdî û îmkanên ku bi internetê derketine bihejmêre. Digel hemû neyîniyan di vî bîst salê dawîn de heyfa sedsalan tê hilanîn.

Digel hemû tevgerên di nivîsa kurdî de mirov hîn ji nikare qala “romaneke kurdî” bike. Ji ber vê yekê jî



di şûna “zimanê kurdî”, ez dibêim “zimanên kurdan” û di şûna “romana kurdî” de ez dibêjim “romana kurdan”. Belkî gotina “romana kurdan” jî qesta min derbas bike, ji ber ku kevirên netewetîya “kurd” jî hîn li cihê xwe tam rûneniştine. Her çî qas derûdorên nivîsê di serê nivîsa xwe û dawîya nivîsa xwe de bibêjin “kurdî” jî, ev hêviyek e, daxwazek e yan wek ku Remezan Alan dibêje ev “niyetek” e. Ku em vê hêviya siyasî bincilik bikin, di navlêkirina kurdan ya di nav xwe de, zimanekî bi navê “kurdî” tune ye. Qest jî vî zimanî zimanên kurdan e, heta li bakur gelek caran jî vî zimanî qest kurmancî ye. Mirov binavkirina biyaniyan ya “kurdî” dikare fêhm bike. Lê “kurdiya” kurda, di roja îro de hew hêviyek e. Bi xwendineke di ser re mirov dikare bibêje avanebûna romana kurd, avanebûna zimanê kurdî ye.

Bi mijar û şandeyên xwe gelek roman û kurteçîrokên kurdan, vî birînê di bîra me de tinin û vî hêviyê zindî dihêlin. Di romana Helîm Yûsiv “Gava Ku Masî Tî Dibin” de di nav şervanan de, ji bajarên ku her çar parçeyan temsîl dikin şervan hene. Ev şandeyek ji yekqederî ya mirovên her çar parçeyan e. Mala Masî li

Binxetê û ya apê wî li Serxetê ye. Lehengekî Enwer Karahan, hildikişê serê keleha Mêrdînê û ji wir li Amûdê dinêre, digel ku ew der qet nedîtîye jî xwe wekî şênîyekî wê derê hîs dike. Dîsa di romana Helîm Yûsiv a bi navê “Tîrsa Bê Diran” de “eger rojekê kesek ji we li tîrsê rast hat, jê bipirsin bê li ku ji dayik bûye. Wê ji we re bêje li wê çargoşeya ku di navbera Sûrî, Tirkî, Îran û Iraqê de ye.” tê gotin. Di romanên mîna Janî Gel ya Îbrahîm Ehmed, Rojnivîska Spînoza ya Şener Ozmen, Ronî Mîna Evîne Tarî Mîna Mirîne ya Mehmet Uzun, Gotinên Gunehkar ya Hesenê Metê de ji bînavî yan temsîliyeta wan a bi çend tîp û ciyan şandeyek ji wekheviya rewşa bajarên ku kurd lê dijîn e.

Bi kinayî di romanên kurdan de şîûr, niyet, hêvî û hestên netewetiyê hene. Lê gelo romanek ku hew li nav kurdên bakur yan yeke ku hew li nav kurdên başûr û rojhilat bê xwendin/çapkirin çiqasî dikare bibe romana kurdan? Romanek ku hew bi soranî hatibe çapkirin û xwendin yan yeke ku hew bi kurmancî hatibe çapkirin û xwendin çiqasî dikare bibe romaneke “kurdî”? Romaneke ku



hew bi tîpên erebî xwendina wê mimkun be, ku hew bi tîpên erebî hatibe çapkirin, yan yeke ku hew bi tîpên latînî hatibe çapkirin û bi tîpên latînî xwendina wê mimkûn be çiqasî dikare bibe romaneke “kurdi”. Her wiha yeke ku bi tîpên kirilî hatibe çapkirin, yeke ku bi kirdkî hatibe nivîsandin çiqasî dikare bibe romaneke “kurdi”? Her çiqas di navbera kurdên Binxet û yê Bakur, û di navbera kurdên Başûr û Rojhilat danûstendinek germ a wêjeyî hebe jî, têkiliyên wêjeyî yên di navbera bakur û başûr, ê di navbera bakur û rojhilat hîn jî gelekî sist in.

Di demên dawîn de hin pirtûkên mîna Eroûtika û Çil Çarîn ya Arjen Arî bi du alfebeyan derketine jî hene. Ji bo helbestê belkî ev îmkanek be, lê bo pexşanê ev rê, ne karekî hêsan e, û di pratîkê de jî wê gelek pirsgirêkan derxe hemberî me. Hewla ku televizyonên wek Roj TV, Kurdistan TV û Kurdsat tê dene jî bi vî rengî ye. Di weşanê de bikaranîna du elfabeyan, belkî heta radeyekê me ber bi hev ve bîne, lê di pêvajoya dirêj de wê ev jî pirsgirêkine nû derxe hemberî me û pirsgirêka heyî jî ji holê ranake.

Bi kinayî, weke gelek pirsgirêkên kurdan meseleyên li ser ziman û nivîsê jî mixabin ku bi rewş û sekna siyasî û aborî girêdayine. Û ez bawer im ku wextê me jî tune ku em vana li gor girîngiya wan, wan têxin rêzê û yek bi yek wan çareser bikin. Di pêvajoya îro de em mecbur in ku çend heban ji vanan bi hev re çareser bikin, yan ku em nikaribin bi temamî çareser bikin jî, hin şaxên wan bi rê bikin da ku em hebekî din zûtir ber bi wê cimeata muxeyyê ve biqedimin. Bo hestên netewetiyê geştir bibin, li ber çavan e ku hewceyî bi bîr û baweriyê heveş heye. Belê bi qeysa ku hûn bê bes, êşên me yê heveş hene, lê ez ne di wê baweriyê de me ku bi qeysa têr bike romanên me yên heveş yan nivîskarên me yê heveş, ê ku di “bîra” me de cî girtibin hebin.

Ku em vegerin mijara xweyî sereke “kanona wêjeyî”, ez dikarim bibêjim ku jî ber van sedemên pirsgirêkê ziman û hin pirsgirêkên teknîkî yên wekî belavkirin û

çapkirinê kanoneke wêjeyî, ecibandineke xwendevan tune ye. Em vêya jî ku dizanin? Digel ku îstatistikên berfireh di destê me de tune ne jî, heya roja îro tu pirtûkên ku çend çaran hatine çapkirin min nebihîstine. Hin romanên ku bi kurmancî hatine nivîsandin û jî kurmancî wergerandine tirkî, yan bi soranî hatine nivîsandin û wergerên wanî ên farisî û erebî derketine belkî çend çaran hatibin çapkirin. Lê berhemên bi zimanên kurdan, bi van zimanan gelekî kêmtên xwendin. Romanên kurdan ku atmosfera erdnîgariya kurdan ji xwe re çarçove girtine û di nav wê cihanê lehengên xwe bi rih dikan, gelek çaran nakokiyên di hindurê kesayetan nabinin yan bincilik dikan. Bi çîrok, tema û hestên nas, zordariya ku li kurdan hatiye/têkirin û berxwedana kurdan li dijî van mêtinkariyan weke belgeromanan tînin nivîsandin. Ev rastiyeke nivîsa kurdan e û li gor rewşa milîtanbûna zimanên kurdan e jî. Digel bikaranîna vê atmosferê romanên mîna “Ezê Yekî Bikujim a Firat Cewerî ya ku kûrahiya hestên leheng zevt dikan, nakokeyên hindurên wan, êşên ku ji hebûnê tînin dibînin û bi ziman dikan jî tînin nivîsandin. Yan romanên wek Gotinên Gunehkar a Hesenê Metê ya ku jî vê atmosferê dû lê bi pirsên qedim dadikevin û bi her awayên xwe lehengên xwe bi rih û goşt û hest dikan jî tînin nivîsandin. Mîrov dikare heman tiştî jî bo kurteçîroka kurdan jî bibêje. Çîrokên Hesenê Metê, ên Enwer Karahan, ên Helîm Yûsiv, ên Selehattin Bulut hwd. Hêja ye ku mirov li ser bixebite. Her wiha jî li gor şikl û vegotinê jî romanên mîna Mîrname, Gava Ku Masî Tî Dibin, Ezê Yekî Bikujim, Saturn, Gotinên Gunehkar, Rojnivîska Spînoza, Xadim, Hêvî Herdem Heye, û hin berhemên Mehmet Uzun bi gelek hêlên xwe hêjayî balê ne.

Yanî her çiqas romana kurdan ne xwedî dîrokeke kevn be jî, (yan jî ku destpêka wê kevn be jî jî ber zemanê wînda nû tê hesibandin), mîna wêjeyên din pirreng e.

Şopên gelek cureyên rêbazên edebî tê

de hene. Berhemên serkeftî û yê bi hin endişeyan hatine nivîsandin hene. Lêgerîna riyên vegotinê yên nû li ber çav e. Jîmara romanên kurdan êdî bi sedan tên jimartin, tenê li bakur jimar sedî derbas-kirî ye. Lê mixabin dest ji kanonek li nav kurdan hemûyan berdin, mirov nikare qala kanoneke zaravayî ji bike.

Li ser navê Mehmed Uzun gelek nîqaş hatin kirin. Ji ber hin gotinên wî yên mîna “nivîskarê romana kurdî yê yekem ez im”(1999), ji ber pêvajoya wî ya di dadgehên Tirkîyeyê de û di vê pêvajoyê de piştevaniya navên mîna Nadine Gordimer, Gunter Grass û Elîe Wiesel ku xwediyên xelata nobelê bûn û ji ber têkiliyên wî yî entelektuelî bi biyanîyan re, van nîqaşan gelekî deng dan. Bi vê dengdanê navê Mehmed Uzun li gelek cihan belav bû. Wergerên pirtûkên wî yên bi tirkî bi dehan cara çap bûn. Helbet Uzun jî zanibû ku beriya wî him di kurmancî de him jî di soranî de roman hatibûn nivîsandin. Di sala 1996'an de wî bi xwe spasiya xwe ji Erebê Şemo re dikir û qala Hêlîna Mahmut Baksî dikir. Bi vê rewşa Uzun belkî yekem car bû ku wisa bi berfirehî romana kurdan dihat nîqaş kirin û li ser dihat peyivandin. Hin kesan Mehmed Uzun bi tena serê xwe weke kanonekê dît lê gelek jî, belkî ji ber gotinê wî yên bixwebawer ew gelekî rexne kirin û edebiyata wî gelekî ji rêzê dîtin. Di encamê de sebeb çî dibin bila bibin tu nav yan berhemên din ên ku mîna yên Uzun bî nîqaş kirin çênebûn.

Kanon ne hilberîneke dembîhurî ye, ne qudsiyet û mitlaqkirina hin metnan e. Wek ku min di serî de jî got; kanon tên avakirin jî û tên xera kirin jî. Li ser navê wêjeyê, di pêvajoya avakirin û xerakirina kanonan de; mesafeyên ku tên stendin erdnîgariya wêjeyê bi gulên rengereng dixemilînin, ji wan gulan toven nû dikevin axê, ji wê axê kulîlkên nû şînin, ji wê şîniyê bêhnên nû û xweş difûrin. Lîsteyeke nivîskaran/berheman a her xwendevanî heye, ku ev lîste bi terfîgariyêke pir derkevin hemberî lîsteyên

din, wê gavê em dikarin bibêjin ku atmosferê wêjeyî li nav wê civakê heye. Kanon ne pîvanên pêşhukmî ku di şûna xwendevan de berhemê diwezînin û meyla wî tayîn dikin in. Ji bo dînamîzma edebiyatê û hêskirina xebatên li ser edebiyatê jî kanon tiştêkî ku pêdivî pê heye ye. Wê kanonên wêjeyî, ji wê bûka nazenîn ku çavê kesekî pê nakeve û çav hemû jî li bendebûna wê betilîne, ji rexneyê re jî, rêyek ronî û tê de meşandina wê hêsan e veke. Weke ku Jale Parla dibêje: “Zaten toreya rexneyî jî bi wateyekê jî şerê kanonê, yanî sazkirina kanonan, domandina wan, nîqaşkirina wan, guherandina wan, pê de pê de ji têkoşîna inkarkirina wan ve pêk tê”.

Wek encamê

Mebesta vê nivîsê ne çareserkirina standarkirina ziman e. Ji ber wê jî min tu pêşniyar û rêyên acîl nedan ber xwe û tu kesî. Min xwest ku ez nîqaşên li ser vê mijarê di bîr de binim û wêneyekî rewşa heyî bikşînim. Ji ber ku weke gelek pîrsgirêkên kurdan ku bi hev girêdayî ne, ev jî bi mijara min a sereke girêdayî bû. Her wiha sedemên kêmbûna xwendevanan, pîrsgirêkên weşanxaneyan û belavkirina pirtûkan, sedemên tunebûn an qelsiya rexneyê, bi hev girêdana neteweyetî û romanê, dîroka nivîsa kurd an dîroka romana kurdan, têkiliyên di navbera zaravayan de û hwd. Ku her mijarek jî vana bi serê xwe karibin bibin mijara lêkolîneke berfireh û ku her yek jî vana bi serê xwe hîmekî li ser rêya “kanona wêjeyî” ne, ne hede-fên vê nivîsê ne, belkî bibîranîna vana, hin sebebên çênebûna kanonên wêjeyî min xwest ku binim ziman. Digel vê çênebûnê, hewceyiya bi wê, riya ku wê li ber wêjeyê û bazara wêjeyê veke min xwest ku hebekî nîşan bikim.

(1) Gregory Jusdanis- werger ji Bendname ya Remezan Alan hatiye girtin

(2) Haşîm Ehmedzade- Ulus ve Roman

(3) Benedict Anderson- Hayalî Cemaatler, Gelner dibêje netewe tê çêkirin, neteweperwerî li cîyê ku netewe tune ne, wan îcad dike

(4) Mehmed Uzun- Ziman û Roman

Muzexaneyê kulan û vegotina banî

Yunus EROGLU

Yek ji bermahiyên mîrateya eşbar a sedsala 20'emîn muzexaneyên eş û eşkenceyan in. Tiştên ku hatin serê mirovan bi rengekî ku deng ji wijdana mirovahiye birî rûdan. Hêman û nîşaneyên kul û tehdeyîyan bi çalakvaniyeke ku misêwa şerîta wijdanê me bigerîne û nehêle deng jê bê birî li van cîgehan tîn parastin. Peydakirina bînerê ku tim bêwijdaniya bobelatan bi bîr bîne weke sîgorteya cardin pêknehatina wan qewaman tê dîtîn. Ji hêla din ve, rûdanên çavkorî, bêemanî û helahelayên bêbextiyê hiştin ku hişên vekirî û hişyar ên wê sedsalê ji erk û karîgeriya nivîsê têkevin şik û xişûşiyê. Nîşandan û vejandina dem û halên perîşaniyê yên di bin nalîna xencera bêiman de bi şarezayî û duristiyeke tekûz biçûya serî jî, di kêliya dawîn de, ji rihm û heyfanîna yekî/ê dereke (bîner/xwîner/guhdêr) pê ve, tevli karesatê bûyîn pêk nedihat. Hestiyariya ku encax li berketina bo wan eş û kulan pêkan e, lê têgihîştin û fehmkirina wan ji yên ku jiyayî pê ve ji kesî din re ne destdayî ye guhdêr, bîner û xwîner xist kirasê biyaniyekî/ê. Bi ya min yek ji sedemên guherandin, hedi- mandin, hêvîsarî, têkçûn, tevlihevî, giriftî, vajikirinên bi nîrê piştmoderniyê jî ve kumîşîna di navbera bêjer û wergir de bû. Nepêkaniya pevgihîştinê ya bi riya peyam û wateyê hizra ku "tu çi bibêjî jî ew ê tiştêkî din fehm bike" weke rastiyeke sereke di hişê nivîskaran de tûj kir. Loma, li gor min, nivîskar weke bêhnvedan û vehêsanekê bi yekcar ciyê xwe li dewsa xwîner xweş kir. Dûrahiya di navbera tekst û rasteqîniyê de, ku bi reşbîni û şika ji cîhanê firehtir bû, nivîskar tehn da ku li dora xwîner bizivire û li berhema xwe vegere. Bi vî awayî listikên di navbera nivîskar û xwendekêr de geşe dan. Vê azmûnê gişî di sedsala 20'emîn de tiştêk da xuyakirin: Ku, rastî ne rast e.

Li ba me çi bû?

Piştî daxuyakirina hêlek ji serboriya

nivîsevaniya wêjeyî ya sedsala borî, dibe ku kurd jî vê serencama ramanwerî û tevgera hunerî dervemayî werin hesibandin. Sedsala herî dirêj a cîhanê ji welat û wêjeyên ku bîrewerî û hunerên xwe gihandibûn heta astekê re bû sedema guherîn, veguhezîn, rûxandin û avakirinan. Ji wêjeyên sazûyî re çarçoveya vegotineke din pêwîst bû.

"DI KURDÎ DE cara yekemîn/ yê yekemîn ku..." diyardeya wê yekê ye ku nivîskar xwe hişk bi her du aliyan girtiye. Lê nayê wê wateyê ku bi bestika gerdîşa xwe girtiye û bi pêş de dibe

Lê ji ber ku li ba kurdan, ku sedsala 20'emîn bû şûrekî zirav di binê pehniya wan de, wêjeyeke sazûyî (ne bi wateya dam û dezgehan, bêguman), jiyanêke ramanwerî ya berdewamî û berfireh tune bû, yên hatin jiyîn zêde miqabilî û beramberiyek di jiyana me yî hunerî û bîrewerî de nekir. Tiştêk nerûxand, sererast nekir, eş û kul ji xeynî peritandina rehên qirik û kezebê leqayî şîyan û raperîneke hizrî nebûn di hişê me de. Ramanweriya me yî "hişyar" ji xeynî pSENDKIRINA ramanên Ehmedê Xanî, yên sêsed sal berê, qet veneguhêrî. Behskirina Ehmedê Xanî ya çar hêmanên hebûnê yên ji demên antîk ve weke berzebûna feylesofiyekê hat nîşandan. Heçko gava îro nivîskarek di çîrokeke xwe de behsa "E= mc²" bike, sed dused sal piştê yên wî bixwînin bibêjin rehetî ewqas fizîknasekî zîrek bû ku bi qandî Einstein dizanibû enerjî çi ye. Nehat dîtîn ku heta berhem û ramanweriyek tevayî dîroka hunerê nebe şensê wê yê afirandina pêşerojekê her kême. Xwendevanê zîrek helbet têdigihê ku ez hejahî û mezinahiya Xanî biçûk nakim.

Tenê mesele meseleya ku em bizanibin em ê li ku derê li çi bigerin e. Hingê em ê baş fehmbêr bin ku me ji ku derê çi derxistiye. An na em ê têkevin vê rewşa min û hin hevalên min ku dema em di liseyê de xwendekar bûn, carina me çêrî felek û dinyayê fikir, me digot çawa dibe ku em ew qas gotinên ji “difikirim, nexwe heme,” ya Descartesî xweştir dibêjin, lê weke wî nayên paxavpêkirin, têgihîştin û payepêdan.

Ji aliyekî ve jî parastin û vegeerîna li wêjeya devkî û şairên berê, hinekî jî bi fikir û waswaseya selmandina hebûna wêjeya me, veguherî nepixandineke ku pêdiviya ji bo teqldaneke din nehêle. Me minakên xwe yên ku di berxaneyê hunera afirandin û nivîsînê ya cihanê de hinkûfên wan bi qandî ku me bi carekê tune bikin û ji tuneziyê cardin biafirînin zehf in, weke taybetiyeke xwe yî bê-hempa dît.

Ew qas ku me bi çavên ronesansa Ewropayê ya bi vegeerîna li klasîkên wê yên antik ên greko-romen li vî karê xwe yê berhevkarîyê nihêrî. Me got li gor ku giregirên me yên ku bi qandî yên wan “gotinên xweş gotine” hene, nexwe çandeke me yî ramanweriyê ya geş û xurt û karibe serdema îro pêşwazî bike heye. Loma her kilam, her helbest, her çîrok û romana di kelepura me de weke serberhemekê hat pejirandin.

Me bê gels û gelemşe xwe sipart nihêrîna li cihanê ya bi awirên Cegerxwîn. Lê me neda aqilê xwe ku, dema mirov çand û hunerekê bilind dike mirov wê diparêze, ne dema ku mirov wê deyne ber xwe û wê ji serdema xwe yî îro re bike kiras. Nexwe tişta ku em dikin wê tenê bibe helwesta ku ne ji ber hostehî, buhartin û qevzavêtina wê ya di rêbiwariyeke hunerî û ramanwerî de, lê ji ber ku di destê me de ev tenê heye em berhemekê datinin ser serê xwe.

Vê yekê jî ev tişt edî, bi eşkereyî, da niye ber wêjevanê kurd û jê divê ku bibîne: Her tiştê bi kurdî hatiye nivîsîn dibe ku pîroz be, lê ne baş e.

Tenêtiya nivîskêr

Divê mirov vêya jî qebûl bike ku di cihanê de tenêtiya tu nivîskarî bi qandî ya nivîskarê kurd mezin nabe. Bi biryardana afirandin û nivîsîna bi kurdî re pêvajoya tûj a tenêmaneke giran dide destpêkirin. Ne tenê pirsgerêka zimên, nebûn an lawaziya girseya ku berê xwe bidê, nexşeya terîş terîşî ya parzemîna ku avahiya xwe li ser rûyê wê bilind bike; lê şaşwaziya ku wê çawa çîroka xwe ji nava çîroka me tevan derxe û li hev bigerîne jî weke zincîreke sar û hişk li dora wî/ê digere. Lewra gava berê xwe bide wêjeya xwe, ku gerdîş (ji Dilawer Zeraq jêgireke bêdestûr!) ango kevneşopîyeke bersivdarî dem û heyamên tîn jiyîn xurt nekiriye û pê re têkeve lecê, xetereya ku ji cihanê yan ji lûtkeya xwe yî siruştî bimîne qet ne hindik e. Lê gava berê xwe bide cihanê û saet û salnameya xwe li gor a wan eyar bike, hingê jî xetereya ku di nav koma xwe de bê per û bask bimîne gelekî mezin e. Lewra rastiya ku hingê ew ê bi gavên dûr û dirêj pêvajoya wêjeya xwe li paş hiştibe, dê weke tînegihîştin, bêbersivman, di tariyê de hindabûn, ji xwendekar qutbûn wî/ê berde binê çaleke bêbinî. Ev tê wê wateyê ku ji bo ku weke miriyekî bê gor û kêl be, gava dawîn jî avêtiye.

Ji bo ku nivîskar karibe ji bin vî barê kulên wêjeya xwe yî sava û bê civat rabe vala nesekiniye helbet û ji xwe re starek jî ava kiriye: Yekemîn bûn! Di tengava navbera dema me û cihana ku ligel ku serpêhatiyên me hinekî bişibin hev jî, lê di warê destkeftî û encamên wê de em dûrî hev mane, di gaveke ku me nêzikî qonaxên wê cihanê bike de yekemîn bûn hinekî kerba ser dilê nivîskêr hênik dike, tiştê ku dixuyê. “Di kurdî de cara yekemîn/ yê yekemîn ku...” diyardeya wê yekê ye ku nivîskar xwe hişk bi her du aliyan girtiye. Lê nayê wê wateyê ku bi bestika gerdîşa xwe girtiye û bi pêş de dibe. Bêhtir weke nîşandana tiştêkî “li ba me nîn e” û nûnertiya wê ya yekemîn a xwecihî dixuyê.

Lê li gor min, rêgeza sereta divê ev be: Ne yekemîn bûn; yektabûn!

Ji banî de

Di bernameyeke şahiya sersalê ya qenaleke kurdî de ji kesên li studyoyê tê pirsîn: Hêvî û daxwazên we yên ji sala nû çi ne? Her yekê/a ku mîkrefon tê ber devan dibêje: Aştî! Azadî! Tu kes nabêje bila vê zivistana hişksayî çenebe, yan kurekî min çêbibe, yan mîrê min ji min hez bike, yan ez karibim deynên xwe gişan bidim, an ez dev ji cixarê berdim, an ev şerm ji ser min rabe û ez nema mirovekî/e fediyokî bim, an... Xwene tu derdên şexsî yên van mirovan tune ne, bera? Bêşik tu jiyanêke takekesî bi qandî wejeyeke rût, xav û hişk qeşagirtî, bê liv û bê herka cihêrengiyên jindarî nîn e. Xweseriyên takekesî di jiyana kesê ku herî pir xwe kiriye gewdebûn û dirûşmbûna raman û rêgezê de jî zêde zêde peyda dibin. Dema ku ew kes nikaribin li xweseriyên xwe yên takekesî hay bibin ev dîsa dibe ku weke tişteki asayî dîtin; çinku serpêhatiya kurdan jî, bi rastî, ji xwe re vegotinek saz kiriye. Belê, serpêhatiya me tişteki di hizra me de livand. Ew jî ev bû: kurd gelekî bindest in. Tim

zilm, zordarî, bêdadî û neheqî li wan hatiye kirin. Bêpar, mehrûm û mehkûm in. Û ji bo vê jî bi dijarî li ber xwe dane û didin. Vêya weke vegotineke banî hişê civakî vegirt. Bes ku romanûsê me jî ji heman pîrsgirêk û tengasiya ku nikaribe van xweseriyên takekesî yên ku ava jiyan û jîndariyê tê de herî gur diherike, helbesta jiyanê tê de dike xumexum bibîne û şeweyê vegotina wê saz bike, nexwe hingê serpêhatiya civakî ji qewsbûnê pêvtir tu bandorek li nivîskêr nekiriye.

Di vê geremolê de tiştê ji siyaseta-medar, rewşenbîr, rojnamevanan hat xwestin ji nivîskarên roman û helbestan jî hat payîn: Bila vêya binivîsin! Wisa tê gumankirin ku ji vê serpêhatiya komeleyî pê ve hewceyî bi çîrokeke din nîn e ji me re. Lewra, yekane rastî ev e. Yên din lefzên guzaf in! Loma ne seyr e ku, her tê bangdan ku çima romana vê serboriyê nayê nivîsîn. Çima pêdivî bi qalkirina "tiştên din" hebe? (Wekî M. Kunderayî radigihîne: Li hember rêgezên gewre yên di xetereyê de, huner çi dinimîne?) Piştî vê çarçoveya ku hatiye da-



riştin tê xwestin ku hunermendê/a kurd navê dagire. Kêm zêde nivîskar, nivîskarê ji vê tenêmana mezin bizdiyayî, hewl dide ku berhema vê serpêhatiya ku hemû malzemeyên wê xerpişandine nav destên wî, bîne holê. Loma nivîskar, bi hêbet û şaşwazî, dixwaze hemû tiştî verêje û muzexaneyekê jê re ava bike. Nizane ku daxwazkarên vê daxwazê nizanin ku wê ji weke sertêdanerekî biyanî, dereke, pê ve tu carî nikaribin bi awayekî din gava xwe bavêjin nava vê muzexaneyê. Her çiqas têketin belaş be jî.

Weke ku di minaka jorîn de dixuyê, li ba gelên bindest vê vegotina banî ya ku êdî dibe hişê civakî fikr û ramanan heta tu bibêjî totalîze dike. Werê tê guman kirin ku çîroka gelî were gotin wê çîroka her kesî hatibe vegotin. Lê belê, huner, hunera romanê, dîroka çîroka kesî, takekesî ye. Lewra lehengekî ku aştiyê dixwaze nabe, aşti yan azadî têra afirandina lehengekî nake. An jî lehengekî wisa nayê bîra min. Roman ne cihê derbirîna ramanan e; lê belê cihê nîşandane, têgihandin û liberxistina tiştên ku ancax bi wî awayî dikarin werin vegotin û nasandin e.

Lawaziya cîhana me yî fikirmendî, paşvemana me ya di beşên curbicur ên zanyarî û hunerê de hişt ku em weke yekî ker xwe biperpitînin û qêrînan bidin. Em ji muzîkarên xwe, ji şewekarên xwe, ji rojnamevanên xwe, ji xwendekarên xwe, ji firoşkarên xwe, ji siyasetmedarên xwe, ji xebatkarên xwe dixwazin heman tiştî bikin û heman tiştî bibêjin. Em ji romanekê dixwazin peywira pirtûkeke ceribandî, tezeke master an doktorayê, pirtûkeke ramanê yan bîrdozîyê bi cih bîne. Çima? Ji ber ku kêmanî di van waran de jî heye. Weke ku gelek kes ji ber kêmanîya nivîsîn û xwendina kurdî dest bi wêjekarîya bi kurdî dikin: Heçko bila ew jî xêra wan be.

Hêvî û guman

Sedsala bîstemîn ji kurdan re barek

kul û derd hiştin. Bes sedsala bîst û yekemîn dê sedsala tevayîbûna kurdan a bi cîhanê re be. Çawa ku em bi çîrokên ên din derdê xwe çêtir fehm dikin, nas-kirina romana cîhanê jî wê berê romana me çêtir nîşanî me bide. Bêguman hingê dê cîhan jî kurdan keşf bike. Ji niha de bi gavên li derengmayîna xwe warqilî lez û bezek di nivîskariya me de dixuyê.

Ez bi xwe ji aliyê rastiye yê ku roman-nûs û helbestkar nîşan didin hez dikim. Û hewcedariya civaka me jî gelekî bi heş û şiyana vanan heye. Lewra hunermendên mezin in ên ku bi rastî em çî dijîn, çî tê serê me ji me re dibêjin.

Ha, bera hêvî û daxwaza min a ji sala nû: Berhemên hunerî yên yekta ku bi hêlin ku nivîskar tenêtiya xwe bi şerkirin, parastin, rûxandin, avakirin, veçirandin, wirwirandin û hembêz-kirina wan bişikîne.

(EZ û roman)

Dibe ku peyva mezin, EZ, a ku di vê beşa ku weke kevanekê li dawiyê vedikim de, li xweşiya xwînerên van rêzikan nere. Li hember EM'êke bêxwedî, ji pirtûk û berên din ên hunerê der û hinê negihaştîye derbirîna xwe ya esasî, çî hewce bi vê ezeziyê heye? Kî çî dixwaze bila wê biafirîne, dixwaze qala kê bike bila qala wî bike. EZ ê, di vê dawîkê de, têkildarî mijarê bi kurtî behsa serpêhatiya xwe û nivîsînê bikim hinekî. Lewra, heya ku her kes behsa XWE neke, çîroka XWE nebêje dê tu carî ev EM temam nebe, bi ya min. Çinku, ya axirîn, bergehên hunerî bi hewldanên takekesî, bi qalkirina "yên din", "tiştên din" dixemile. Hunermendê ku giyanê xwe bi reng, deng, babet, kîtekî, bûyer û serpêhatiyên takekesî dewlemend kirî dikare bike ku em, di berhema wî de, di atmosfer û kesayetên berhema wî de arezûyên xwe, kulên xwe, nepeniyên xwe û nakokiyên xwe bibînin, li hember wan derên, wan bihefidînin. Û ji wan hez bikin. Wan fehm bikin. Hunera romanê bi serkeftina xwe yî bêhawe ya xweser digihîje her

kesî; ne bi dariştina rêgezan, bilindkirina dirûşman. Gelek, miletek nabe lehengê romanekê, lê kes dibin. Leheng kes in, çîrok jî vegotineke ji binî, ji odeya tarî ya ku hundirê wê hînê bi temamî ji me ve ne xuya ye, de ye. Vegotineke ku her kes çîrokeke xwe, serpêhatiyeke xwe heye. Roman jî ji bo vê hunereke bilind e. Bo ku her kes di nav çîroka yê/a din keve, ne di muzexaneyê wî/ê û wî/ê bijî û fehm bike. Dîroka hunera romanê vêya nîşanî me dide. Ji bo afirandina van kesan pêwîst e her kes ji xwe, ya xwe dest pê bike.

Belkî weke fikr û boçûn her kes li ser vê qinyadê be, lê feraseta me hînê tam li van hizran negunciye. Di cur be cur romanên kurdî de ez bi gelemperî xwe weke ku bi heman kesan re bim hîs dikim. Nizanim gelo tiştê ji vê hisa ku heçko mirov tim heman çîrokê dixwîne xerabtir heye, yan na. Qereker nahêlin ku em wan nas bikin: Jixwe nas in! Yek jî sedemên ku xwînerên kurdî bi romanê re nakevin têkiliyê jî ev e. Di odeyeke tarî de heger tu êdî jixweber zanibî çi li ku ye, pêxistina lembeyê tenê dibe navgîna dîtineke nelêgerînê.

Min ji bo çi dest bi nivîsandina romanê kir? Tevî ku sedema ewil a ku mirov dest bi karekî dike seranserî maweya wî karî ji mirov re ne ajoyek be jî, êdî sedemên cihêtir dewsa çirûska ewil girtibin jî, ez hînê hest bi sedema xwe yî ewil dikim: Ji ber ku bêhtir ji xwendina romanên hez dikim. Tiştêkî asayî ye ku mirov bixwaze tiştêkî ku zewqê dide mirov, heş û dilê mirov dicefilîne, hîn bibe û li pey sêhr û sineta wê bikeve. Ne tenê ji bo xwe, helbet. Ji bo yên ku çaxa te bixwînin ê wê heman zewq û heyranmayîna ku tu jiyayî hest bikin jî. Têkildariya nivîsînê ya mezin jî di vir de ye jixwe.

Di demên xwendekariya xwe ya lîseyê de min helbest jî nivîsibûn. Bi destpêka salên zanîngehê (û heta niha) nivîsandina rojnivîskan... Berxaneyên tije nîmeyên ku ji bo pratîka nivîsînê min nivîsandibûn. Dosyeyeke helbest-awazkî

ku ji kilam û dûrikan û helbestekê pêk tê... Vana ji bo çi dibêjim? A yekemîn, ji bo ku destnîşan bikim ku tu dikarî tiştêkî bi her cureyî derbibirî, lê karîgerî û qad û bergeha her cureyî cuda ye. Min ji qada romanê ya ku cihan tê de li hev di-hewe hez kir. Xwene tiştên ku min weke feraset li jorê ji nav tevna romanê bi dûr xist nafikirim? Belê, lê wana jî di rojnivîskan û gotaran de dinivîsim. Lewre rêz û hurmeta min ji vê hunera ku pê da-dikevim re heye. Kirasê ku lê nayê dix-wazim jê bişeqitînim. A duyemîn, gelşa ku ez pê re têdikoşiyam ne ew bû ku ez ê çi binivîsim, lê ez ê çawa binivîsim bû. Hûn ê bibêjin ku her kes vêya dizane. Rast e û her kes dibêje jî. Lê mixabin, her kes vêya nake. Pêwîst e em nekevin rewşa xwendekarê debeng ê ku piştî romana wî dixwîne tê hemberî romanûs û jê re dibêje; "Ma çi ye, ez ji dikarim vêya binivîsim?" Xebata ji bo danîna himên vegotinekê, şayikkirin, rengandin, rêzandina rîtmên muzîka wê ya hundirîn, vana hemû ji romanûsekî/ê divê ku gîyanê xwe û tevahiya sehekên xwe bi binbaryeke mezin hesas bike.

Ya sêyemîn, min ji hêza nivîsînê bawer kir. Na, ne ya li ser mirovan û civakan. Ji ya li ser xwe. Min dît ku bi nivîsînê hizr û raman tîr tewilandin, geşepêdan. Bêhtir ji xebardan û kemkema rojane. Min weke yekî li vebûna gulekê temaşe dike bi sermestî li vedan, ajotin, geşbûn û firehbûna hest û raman a bi tîpên li ser kaxetê temaşe kir. Kî dibêje xebardan û nivîsîn eynî ye?! Kî dibêje wêjeya devkî û ya nivîskî heman tişt e?! Min ji disîplîn, bêhnfirehî, bergehvekirîbûn, şewerengîniya nivîsînê hez kir. Tiştên ku min nedikarî bi xebardanê, xebardana ku bi adet û toreya rojane kurnisandî, pêş bixim, di deryaya nivîsînê de weke qeyika li ber pêla bayên hişkîgîn bi firê ketin.

Nexwe, ez bi kîjan zimanî, li kîjan welatî bihatima dinyayê min ê dîsan heman tişt bikira. Lê çima bi kurdî? Wê roja ku min ev biryar da qet ji bîra min nare.

Çîroka zarokî

Charles DICKENS


Ji îngilîzî werger: Evdilayê DEWRÊŞ

Demekê, gelek sal berê, gerokek hebû û wî dest bi rêwîtiyê kir. Ev rêwîtiyeke bi sêhr bû. Di destpêkê de pir dirêj dixuya, lê dema ew gihişt nîveka rê, pir kin dixuya.

Bi tena serê xwe bêtî ku rastî tiştêkî bê demeke kurt di riyeke pir tarî de rêwîti kir, heta ku rastî zarokekî rindik hat. Ji zarok pirsî "Tu li vir çî dikî? Zarok got, "Ez her dem dilîzim. Were û bi min re bilîze!"

Wî ji serê sibehê heta evarê bi vî zarokî re list û her du bi hev re gelekî dilşad bûn. Esman wisa şîn bû, roj wisa dibiriqî, av wisa diçirîsî, pel wisa kesk bûn, gul wisa xweş û şîrîn bûn. Çûcîn wîcîna çivikan bihîstin û gelek pîrpîrik dîtin, her tişt rind û bedew bû. Hewa xweş bû. Dema ku baran dibarî wan ji temaşekirina peşkên baranê û ji bêhna xweş û teze hez dikir. Dema ku ba dihat, guhdarîkirina dengê wî xweş bû û meraqa ka ew çî dibêje, mîna ku bi lez û bez ji mala xwe dihat, (wan digot ka mala wî li ku ye) dikir fikîn û guvîn, ewr li pêşiya wî dibezîya, dar xwar dikirin, di rozinan de dikir guvegûv, xanî dihejand, gurîn û xurîneke bi hêrs û xezeb li deryayê çedikir. Lê belê dema berf dibarî, ev ji hemûyan xweştir bû; wan ji tu tiştî ev qas hez nedikir. Kuliyên berfê ji jor de bi lez û gur dibarîn, te digot qey ji singên bi milyonan çivîkên spî dibariyan; çiças misêva û stûr xwiya dikir; guhdarîkirina bédengiya ser rê û dirban.

Ew xwediyê listokên cihanê yên baştirîn bûn û pirtûkên wan ên bi wêneyên pir balkêş hebûn; derbarê cil û şûr û şimikên rojhilat de û cûce û dêwan, cin û periyan û bluebeard û bean-stalks û derbarê maldarî û şikeft û daristan û Valentines û Orsans de, hemû bera û nû bûn.



Lê belê rojekê ji nişka ve gerokî, zarok winda kir. Li der û dor lê geriya û gazî kirê. Lê tu bersiv nehat. Loma ket ser riya xwe, demeke kurt bêtî leqayî tiştêkî bê berde-wam kir, heta ku rastî xortekî qeşeng hat. Ji xortî pirsî, tu li vir çî dikî? Xortî got: "Ez her tim hîn dibim, were û bi min re hîn bibe."

Ew bi vî xortî re derbarê Jupîter û Juno de hîn bûn û derbarê Grek û Romayê de û nîzanim çî û çî, zêdetirî ku ez dikarim bibêjim hîn bûn. Çimkî wî gelek ji wan zû ji bîr kir. Lê belê ew ne tenê hîn dibûn; listokên wan ên xweştirîn hebûn ku li tu derê pê nedihat listin. Havînê li ser çem bi kelekên digeriyan û zivistanê li ser qeşayê xwe berdidan; dimeşîyan û li hespî siwar dibûn, bi krîkête dilîstin û hemû listokên gogê û gelek werzişên ku ez nikarim bêjim... Tu kesî nikaribû wan têk bibe. Diçûn betlaneyê ji û partyên ku wan heta nivê şevê lê dans dikir û twelfth cakes û cihên ku li serayên ji zêr dîtin û ji binê erdê zîv derdihatin. Hema bibêje hemû niwazeyên cihanê dîtin. Hevalên wan, wisa xoşewîst bûn ku ez dixwazim wan yek bi yek vebêjim. Ew hemû ciwan bûn, mîna xortê qeşeng û tu carî ji hev û din re xerib nedihatin.

Heta, rojekê, di nav vê dilşadiyê de gerokî xort winda kir fena ku zarok ji winda kiribû. Piştî ku demekê bi neçarî bangî wî kir, derket ser riya xwe. Demeke kurt bêtî ku tiştêkî bibêje rêwîtiya xwe domand heta ku di dawiyê de rastî ciwanekî hat. Ji wî pirsî, "Tu li vir çî dikî?" û mîrikê ciwan got, "Ez her dem evîndar im. Were û digel min hez bike."

Bi vî zîlamê ciwan re ket ser rê û piştî demeke kurt rastî keçeke şîrîn hatin ku li tu derî nehatibû dîtin. Heman mîna

Fannya li vî goşeyî. Çavên wê mîna yên Fannyê bûnû porê wê mîna yê Fannyê û xizêma wê mîna ya Fannyê, wekî niha çawan dema ku ez qala wê dikim rûyê Fannyê sorikî dibe, ev qîzik jî dikeniya, rûyê wê sorikî dibû. Loma mêrikê ciwan derhal bû evîndarê wê. Mîna yekî ku cara yekem hat vir, navê wî ne pêwîst e, çawa çavên wî bi Fannyê ket bû evîndarê wê. Baş e! Hinek caran hewes û laqirdî bi wî dihat kirin. Heman mîna ku Fannyê bi yekî dikir û wan carinan şer dikir. Heman mîna ku yekî û Fannyê şer dikir û li hev dihatin û di tariyê de rûdiniştin û her roj name dinivîsin û ew tu carî bêtî hev û din şad nedibûn. Her roj çavên wan li riya hev û din bû û derew jî nebû û di Christ-masê de nîşan çekirin û li teniştê hev li ber agir rûdiniştin û di demeke kurt de zewicîn eynî mîna Fannyê û yekî ku navê wî ne pêwîst e!

Lê belê gerokî rojekê ew wînda kirin, mîna wî hemû hevalên xwe yên berê wînda kiribûn û piştî ku gazî wan jî kir ji bo ku veşerin ku tu car pêk nehat, berde-wamî geştê xwe kir, wiha demeke kin ber-dewam kir bêtî ku tiştê bibêje heta ku rastî mêrikekî navsale hat. Ji mêrik pirsî, “Tu li vir çî dikî?” Got “Ez her tim dixebitim. Were û bi min re tu jî bixebite!”

Bi vî awayî ew jî digel vî mêrikî bi kar û bar bilyabû û ew bi hev re çûn nav daristanê. Giştê gerê di nav daristanê de bû. Daristan, di serî de vekirî û kesk bû, fena daristana biharê û niha dest pê kiribû gur û tarî bûbû, wek daristana havînê; hinek darên ku zû pel dabûn, êdî ber bi rengê qehweyî ve dageriyabûn. Mêrik tenê nebû, jîneke navsale bi wî re bû, ew jîna wî bû û zarokên wan jî hebûn, ew jî digel wan bûn. Ew hemû bi hev re di nava daristanê re çûn, dar birin, qelaptin erdê û di nava guliyên daran û pelên weşiyayî re riyek çekirin û piştê (bar) kişandin û karên giran kirin.

Hinek caran hatin ser riyêke dirêj a kesk a ku diçû hundirê daristaneke kûr. Piştê wan jî dûr ve qêrînek bihistin, “Bavo, bavo, ez hê biçûk im! Li hêviya min rawestin! Wan dîtin ku qertûnekî biçûk, bi nêzîkbûnê re mezintir dibû û

xwe avêt hembêza wan. Dema ku ew dihat, hemû li dora wî kom dibûn ew maç dikirin û bi xêr hatin lê dikirin û paşê ew gişt bi hev re diçûn.

Hinek caran, ew dihatin serê riyekê û piştê hemû bédeng disekinîn, yekî ji zarokan digot, “Bavo, ez diçim deryayê” û yê din digot, “Bavo ez diçim Hindistanê” û yê din digot, “Bavo ez diçim ciyekî ku ez bikaribim qismetê xwe bibînim” û yê din, “Ez diçim bihuştê!” Wiha bi veqetîna digel gelek hêsir û rondikan, ew çûn, bitenê, daketin ser riyên, her yek ji zarokan li ser riya xwe û zarokê ku çû bihuştê, bilind bû hilkişiya di nav he-waya rengzêrîni de wînda bû.

Dema ku ew veqetîna qewimî, gerok li mêrik nihêrî, wî ew li jorê li ser guliyê darê dît, li ciyê ku tirêjên rojê yên dawîn didayê. Wî dît ku porên wî jî cûn bûne. Lê belê wan tu carî nikaribûn zêde bêhna xwe bidin, wan divê rêwîtiya xwe temam bikira, ji ber vê ew mecbûr bûn her dem bilî (karîwer) bin.

Wisa veqetîna çêbûn ku di dawiyê de êdî zarok tunebûn ku veqetîna û tenê gerok û mêrik û xanima mêrik, bi hev re bi riya xwe ve çûn. Û niha dar zer bûn û niha jî qehweyî; û pelên daran dest bi weşînê jî kiribûn.

Wiha, ew hatin ser riyekê ku ji yên din tarîtir bû û wan bêtî ku li ber xwe binihêrin rêwîtiya xwe domandin heta ku xanim rawestiya.

Xanimê got: “Mêrê min, gazî min dike”.

Wan guhdarî kir û ji dereke dûr ji biniya rê dengê bihist, digot, “Dayê, dayê!”

Ev dengê zarokê yekem bû ku digot, “Ez diçim bihuştê!” bavî got, “Li ber te digerin niha meçe. Ro li ber ava ye. Ez rica dikim niha meçe”

Lê deng bilind dibû, “Dayê, dayê!” bêtî ku guh bide wî, porê wî yê niha bi temamî spî bûbû û hêsir li ser çavên wî bûn.

Paşê, dayika ku kişandibûn ber siya riya ku der û dorên wê bi daran girti bû, milên xwe li stûyê wî gerand û ew maç kir û got, “Dilê min, gazî min dîkin, ez diçim!” Û ew mir. Wê, ew û gerok tenê hiştin.

Ew bi hev re çûn û çûn, heta ku gelek nêzî dawîya daristanê bûn: wisa nêz bûn ku wan dikaribû li pêşîya xwe di nav daran re soriya roja ku li ber ava bû bibînin.

Dîsa dema ku wî riya xwe di nav gulîyan re vedikir, wî hevalê xwe winda kir, gazî kir û kir, lê belê tu bersiv nehat û dema ku ji nava daristanê derket, dît ku roj li ser dîmeneke xumrî ya fireh diçe ava, ew hat cem mirovekî kal ê ku li ser dara qelaptî rûniştibû. Wiha, ji mêrik pirsî, "Tu li vir çi dikî?" Merivê kal bi ke-nekî asûde got, "Ez her dem bi bîr tînim. Were û tu ji ligel min bi bîr bîne!"

Bi vî awayî gerok li tenîştî vî mêrikê kal rûnişt. Rûbirû digel roavabûna bi aramî û hemû hevalên wî bi nerm û hêdî bi paş ve vegeyriyan û li dora wî rawestîyan. Zarokê rindik, xortê qeşeng, ciwanê evîndar, bav, dayik û

zarok, giştê
wan li wir
bûn û

tu tişt winda nekiribû. Wisa, wî ji hemûyan hez dikir û dilovan û xweşbîn bû li hemberî giştê wan û her tim ji nêrîna li wan dilşad bû û ew hemû bi wî şanaz bûn û wan ji wî hez dikir. Û bi min gerok tu yî bapîrê xoşewîst, lewra tiştên ku te gotin heman tişt in ku te bi me kirin û heman tiştî em bi te dikin.

1. Karakterekî çîrçîrokê ye ku jinên xwe yek bi yek kuştiye û di jûrek de veşartîye.


2. Çîrçîrokek e.

3. Çîrçîrokek e

4. Xwedayê Romayê, Yewnaniyan ji re digotin Zeûs.

5. Xwedaya zewacê ya Romayê, jina Zeûs.

6. Kekê ku di dozdeh şevên piştî Noelê de tê çêkirin.



Kevoka bi toq

Cemîl KAVÛKÇÛ

Wergera ji tirkî: Tehsîn BARAVÎ

Min li parqê mêrikekî kevoka xwe digerland dît. Di stûyê çûkê de toqekî zirav û çermîn hebû. Tayê bi toqê ve jî, bi qasî ku gava bi hewa ket, karibe xwe li ser milê mêrik deyne dirêj bû. Di rewşeke wek ku gava din belasebeb ketibin qirika hev, hevdu êşandibin û êdî li rûyê hev nanihêrin de bûn. Derketibûn bigerin lê niyeta wan û tişteki bikin ku li hev bên tune bû. Dîmenê wan gelekî bedew bû. Zilamekî bejnzirav û dirêj, porê sîxbozî bi ser milan ve berdayî, di şêst saliya xwe de, bê deng – tu rastiye bixwazî ne bê deng û kevokeke fîrandin jê re derbend an jî sînorkirî bê siûd lê qure û bê tawîz. Gava kevok rawestiya mêrik jî rawestiya. Ew qas bê lebat bûn ku, min cara pêşîn wan werê bidîta, dibû ku min bigota qey peykerek ji wan peykerên şaredariyan ê ku li der û dorên parqan datînin e. Serê xwe da kêlekê û li asoyê nihêrî kevokê, dûre li erdê, dûre dîsa li asoyê. Ku meşiya mêrik jî lebitî. Kevokê mêrik digerland an jî mêrik kevokê; kevok ji stûyê xwe ve bi toq bû yan jî mêrik ji destê xwe ve bi kevokê ve girêdayî bû ne diyar bû. Piştî şapatekê dîsa rawestiyan. Ya biryar dida, ya bi bandor kevok bû. Ka çi di navbera wan de derbas bûbû nizamî, şaşiyên mêrik bêtir bûn. Dişibiya zewaceke ecêb têkiliya wan. Kevokê du gav avêt û pêve baskên xwe li hev xist û rabû. Mêrik jî ji bo ew hêsantir karibe biçe û bê, milê xwe yê ta tê de ber bi jor ve bilind kir. Bi hewa ket û xwe li ser milê mêrik danî kevokê. Hîna gelekî giran bûn. Li hev nehatibûn. Dibû qet li hev nehata jî. Gera sibehê qediyabû. Gava ji parqê derketin kevokê ji ciyê lê lûsiyabû stûyê xwe kişandibû û serê xwe xistibû bin perikên xwe.

Beriya bi salan li nêzî Kîlyosê li Karabûrûnê min yekî gelekî dişibiya vî mêrikî nas kiribû. Terasa havîngeha xwe ya sêtebeq ji kevokên xwe re veqetandibû. Hêwana wê ya ku navber bi dîwaran nedabûnê, wek ku muzexaneyek be, ew jî wek ku rêberekî hunerê be min lê gerandibû. Bi wê nefsbî-çûkiya xwe jî bi karê ku dikir xwe dipesinand. Bi kîsan êmê nicirandî, qafikên avê yên modern, pergaleke ronîkirinê ya ku wan netirsîne. Di mehên

zivistanê de jî tim dawiya hefteyan ji bo wan hati-bûye. Ji bo sermayê negirin ew qat bi sobeyên ceryanê germ hiştiye.

Pêncî kevokên wî hebûn. Giş yek bi yek nas dikir. Gotibû kêfa min a herî mezin jî lîstina “lîstika dilsoziyê” ku dawiya hefteyê me dilîst bû. Ku hewa xweş bûya, sibê zû wê çûbûya Karabûrûnê, kevok giş, deh deh, bikira qefle û di qefesên bi taybet çêkirî de bi cih bikira. Ew û Helîm ê ku li cem wî dixebitî, li dû hemû karên wî dibezîya qefes jî xistin dolmîşê û ji Karabûrûnê berê xwe dan Bolûyê. Wan ew li wir azad berdand. Dûre, bi lez, paş ve vegeriyaye û di şaneşîna malê de li hêviya kevokan maye. Baş zanibûye wê yek ji wan jî neçe ciyekî din, azadiya xwe hilnebijêre.

Şaşî carekê dibe.

Werê gotibû. Ji araqa xwe qurtek vexwaribû. Çûkên wî carekê çûn û venegeriyan. Vîkî vala, weke hîna jî bawer neke, li rûyê min nihêribû. Çi bûye çi hatiye serê wan fêm nekiriye. Ji pêncî çûkî bes yek vegeriyaye. Di wê rewşê de, yê ku ji ber îxanetê dîn û har bûye, ka wê çawa bikaribûya se-daqeta kevokê fêm bikira? De ka wê çawa bibûna. Cezayê hemû fîrariyan li wê biriye û toqa tayê wê yê bi qefesê ve girêdayî xistiye sitûyê wê. Rast e, nizanibû dilê çûkê yê biçûçik şikandiye.

Mêrik gotibû, ev e mirov ku neyê fêmkirin. Ji araqa xwe qurtek vexwaribû.

Ev e ku mirov neyê fêmkirin!

Gava ku xeletiya xwe fêm kiribû hema li wir toq derxistibû. Çûk ew qas dilşikestî bûye ku, ji xwarin û vexwarinê bûye. Nexwestiye bifire jî. Çi dema xistiye destê xwe û avêtiye hewa hema paş ve ziviriye û ketiye qefesa xwe. Gava bê xwarin û vexwarin li hêviya mirinê bûye mêrik jî ber bi kuştinê ve biriye. Çi ceribandibe jî nebûye.

Rojekê toq di nikilê çûkê de dîtiye. Piştî rahiştîyê û xistiye sitûyê wê dîsa dest bi xwarinê kiriye.

Mêrikê ku min ew li parkê dît ew mêrik bû? Yan jî min li parkê mêrikek û kevokek bi toq dîtibû? Gelo tişteki werê nebûye û min ew ji ber xwe ve derxist? Ma şaşî carekê dibe?

Lîngûîstîk

Hîlde DOMIN

Divê tu bi dara fêkiyê re bipeyîvî.
Zimanekî nû bibînî,
zimanê kulîlkên kîrazan,
zimanê kulîlkên sêvan,
peyvên kinûsk û spî,
ku ba bêdeng wan bi xwe re digerîne.

Baweriya xwe bi dara fêkiyê bine,
dema neheqî li te were kirin

Bêdengmayinê hîn bibe,
di zimanê kinûsk û spî de

ji almanî werger: Baran HÎWA

Ji zilamekî mirî re

Carl SANDBURG

Me bang li te kir li ser xeta mirinê
Bi hêviya bersiva bi yek gotinê,
Çend pistepistên şikandî ku çî diqewime
Li ku yî li ser xeta mirinê
Ker û bêdeng î li hember bangên me.

Siyên lerzok bersivê nadin
Û nadin lêven te jî elametekê
Gelo hez diaxive yan mezin dibin gul
Û hiltê roj serê sibehê
Behrê diweşîne bi rengê xwînê

Wergera ji îngilîzî : Lenya DILA

Hîrê birayî û sayêre

Îsmâîl GUVEN

Cayêk beno, cayêk nêbeno. Yew mêrik esto û hîrê heb zî qijî ey ê lajinî estê. Û pêro-pîya yew ban û yew sayêra înan esta. Bê înan cikê xo çin o. Wext yeno-vîyerenî mêrik êdî beno kal, dest û lingan ra keweno. Extîyarîye nişena wicidî ey ser. Hinî fam keno mergî xo nêz o. Rojêk veneno lajanî xo, înan ano pêser, ci rê wasîyetî xo keno. Vano: 'lajî mi. Şima zanî ez êdî biya kal, zaf şoro ewro-siba ez mirena. Mi waşt ke şima rê wasîyetê xo bikî, zereyê xo rehet bikî û wina bimirî. Xora yew banî ma tena esto, senî ma hetanî nika pîya bî, ewro ra pey zî biya bimanêne. Hênê tena sayêrêka ma esta. Ez wazena senî ke hetanê nika ma ewniyayê sayêre, şima nika ra pey zî biewnî aye. Wasîyetî mi şima rê, her şewe şima ra yew verî aye de nobete bigêro hetanî serî sibayî.

Wasîyetî ra çend roj ra pey rehmet keno mêrik. Manenî hîrê birayî bi sayêre û wasîyetî bawî rey de. Şewa verîne dora birayê pîlî ya. Toreyê nanî xo keno de û şino verî sayêre. Hetanî miyanî şewe her çi normal o. La miyanî şewe, wexto ke nanî xo weno û seba rakewtişî ya çendna gilan erzano serî adirî û xo verî adirî de keno derg, destadest piyejnêk yeno ey. Terseno. Ca de xo erzeno peyî sêzyerteleyan û xo nimneno. Goş nano ser, ke piyejn her çend şono ver bi ey yeno. Kalêko kuz vejîyeno miyanî teritî ra. Êrdîşa xo yena rasena ardî. Wina kuz o û wina leze şono rayira ke birayo pîl tersî xo ra nêafteno cayî xo de yez bido xo. Kal rasterast şino serî dare, pêlekî xo vejano û bi sayan keno de. Û senî ke taritî de vejîyabi wina beno vînde û şono. Birayo pîl hetanî serî sibayî nêafteno cayî xo ra bivejîyo. Serî sibayî lezelez xo raseno keye. Birayî ey ewniyenê te de reng nêmendo, persenî, gelo sebiyo? La birayo pîl tewê nêwano. Vano ke tewê çin o. Sey her wextî bê vakayêk derbas biyo. Şewe diyine dora birayî diyin a. Ew zî hetanî nîmeyî şewe nişeno ro. La nîmeyî şewe, wexto ke nanî xo weno û seba rakewtişî ya çendna gilan erzano serî adirî û xo verî adirî de keno derg, destadest piyejnêk yeno ey. Ter-

seno. Ca de xo erzeno peyî sêzyerteleyan û xo nimneno. Goş nano ser, ke piyejn her çend şono ver bi ey yeno. Ters ra nêafteno ke nefes zî biyero. Kalo kuz vejîyeno taritî ra, kalo ke bişo zî amebi. Birayê diyin birayo pîlî ra hîna zaf terseno, tersî ver nêşkêno çik zî bikero vera çinayîşî sayan. Kal pêlekî xo keno de û şino, la ew mira serî sibayî afteno cayî xo ra bivejîyo. Rast şino keye. Birayo qij wexto rewşî ey vînenî ti ra perseno, kekê sebiyo to, qey çiyêk bi? La birayo miyanên tewê nêwano.

Şewe hîrine dora birayê qijî ya. Birayo qij sey birayanî xo hetanî miyanî şewe rastî tewê nêno. La miyanî şewe, wexto ke nanî xo weno û seba rakewtişî ya çendna gilan erzano serî adirî û xo verî adirî de keno derg, destadest piyejnêk yeno ey. Ca de warzeno xo ser. Het-hetê xo de ewniyeno. Kalo kuz dur ra ey ra aseno. Ca de xo peyî sêzyerteleyan de nimneno; la sey birayanî xo nêterseno. Wazeno bivîno ke kalo kuz çî keno. Kal sey her şewe rasterast şino sayêre ser û pêlekî xo bi sayan keno de. La wexto yeno war birayo qij hêriş keno ci. Derbetên keno; la kal destî ey ra xelesiyeno û sey çeçe remeno. Birayo qij nêşkêno biraso ey. Serî sibayî rast şino keye. Seba ke birayî xo nê kalî ra tersayî înan şarmzar keno. Û seba cakerdişî cayî kalî hîre-heme pîya konî rayir. Gonê kalî ra rayir teqîb kenî û rassênî serî yew qulikêk ke şina binî ardî. Birayo pîl vano hêverî mi war bikêne. Layêk bestenî miyaneyî ey ra û kenî war. La hema pancas metre nîşino war ke veneno û vano, mi bi-ancêne dîyar. Birayî pîl ancenî dîyar. Na rey birayo miyanên vano mi war bikêne. Ey kenî war; la ew zî hema pancas metre war nêşino û veneno û vano mi biancêne dîyar, tîya zaf germ o. Ey zî ancenî dîyar. Dora birayê qijî yena. Birayo qij birayanî xo ra vano, mi çend ke vat mi biancêne, şima hîna zaf mi war bikêne. La kê ke mi vat mi war bikêne ew çax mi biancêne. Û birayo qij keweno qulike. Çend ke şino war ard hende beno germine. Yeno pancas metre û zaf beno germ. Bi zor seteriyeno. La veneno bi-

rayanî xo vano mi biancêne, mi biancêne. Yanî vano ke mi war bikêne. Birayî ey, ey hîna kenî war. Çend şîno war germê êdî zor dana ey. La ew ancîya zî vano mi biancêne. La wexto kono nêzî se metre êdî nêseteriyeno. Û veneno birayanî xo û vano, bi war bikêne, mi war bikêne. Yanî vano ke bi êdî biancêne. La birayî ey, ey hîna zaf kenî war. Birayo qij çend ke veneno înan û vano mi war bikêne, yanî mi biancêne; ey birayî qijî kenî war. La hêdî-hêdî êdî beno serd. Cayî ey beno hênîk, çend ke şîno war germîye qediyena.

Mudeyêk ra pey vînenî ke lingî xo rasayî ardî. Her ca wina tarî yo ke birayo qijî ra çik nêaseno. Tay wext şîno çimî ey musenî tarîti. Mîyaneyî xo ra la keno a û veneno birayanî xo û vano, birayîn ez rasaya ard. Paweyî mi bivinêne. Derûdor geyreno, rastî yew koşke yeno; koşkêka rind û girde. Birayo qij şîno zereyî koşke. Koşke de ne nobedarî estî ne zî pawitoxî. Şîno zereyî koşke, zere de hîrê beran vînenî; pêdîma. Hîrê hebî zî sey cêyî. Bero verîn keno a, ke çi bivîno. Kênayêka rind û delale ha serî yew textî de ronîştê. Wina rind a ke birayo qij çîmanî xo kemeşneno. Kêna ey ra vana, ti çiyî, çi kesî yî? Ti tîya de çi geyrenî, eke Kalo Kuz to bivîno to weno. Leze tîya ra dur bikewe. Birayo qij ber geno û şîno berî diyin keno a, ke çi bivîno. Kênayêka rind û delale ha serî yew textî de ronîştê. Wina rind a ke kênaya wedayê verînî ra hîna rind a. Kêna ey ra vana, ti çi yî, çi kesî yî? Ti tîya de çi geyrenî, eke Kalo Kuz to bivîno to weno. Leze tîya ra dur bikewe. Birayo qij ber geno, û şîno berî peyinî keno a, ke çi bivîno. Tay maneno ke ard rê gîno û xo ra şoro. Kênayêka rind û delale ha serî yew textî de ronîştê. Kalî kuzî zî sereyê xo nayo çaqeyê aye û şîyo hewn ra. Birayo qij ca de kerda xo vejeno û seba kiştişî rameno Kalî ser. La kêna ey edelnena û kalmeyê Kalî ke dês a aleqneyo nişanî ey dana û ey ra vana, 'Vinde, kal bê darbê kalmeyê xo nê mireno. Kalmeyî Kalî bigere û tena yew rey piro de. Wexto milî ey ci perra, ew do to ra bivajo, ti camêrdî reyêkna piro de. La ti piro mede. Eke ti piro di beno ganî newe ra û to kişeno. Vaje ke camêrdî yew rey dayka xo ra benî û yew rey danî piro. Ew çax dêw gineno ard rê û mireno. Birayo qij kalmeyî dêwî geno û reyêk de milî dêwî ci perreno. Sereyî dêwî

ard de vano, ti camêrdî yewna rey piro de. Birayo qij vano, camêrdî yew rey dayka xo ra banî û yew rey danî piro. Ew çax wicidî dêw zî gineno ard rê û dêw mireno.

Birayo qij hîrê heme kênayan ke wayî cêyî geno û şîno binî qulike. Hêverî waya pîl ke wedayo verîn de bî, keno rê cor birayî xoyî pîlî rê. Dima ra waya mîyanan ke wedayo diyîn de bî, keno rê birayî xoyî mîyanên rê. Ew û waya tewr qije manenî. Ew vano hêverî ti şo, kêna vana hêverî ti şo. Binî qulik de bi seetan yewbînan çarnenê*. Peynî de kêna qebul kena û kêna keno rê cor. Birayî, kêna finenî cor û serî qulike bi kerayêka girde qefelnenî. Kêna bermena-nê-bermena zî serî qulike ra kerra nêgenî û birayî qijî nêancenî cor û her di birayî û kênayî konî dur weyra ra. Kêna tena manena serî qulike de. Venena birayî qijî û vana, 'rojî yewşemeyî di mêşnayî yenî binî na qulike. yewe şîya ya, a bîn sipî ya. Wexto to ey di ti aye sipî nişe, ti yenî dinya; la eke ti binişî aye şîyaye ti sena metre şînî war.

Birayo qij binî qulike de, kêna serî qolike de paweyî mêşnayan vîndenî hetanî rojî yewşemeyî. Rojî yewşemeyî dîyano, birayo qij ewnîyeno ke senî kêna vato, mêşnayêka şîyaye û mêşnayêka sipî yenî binî qulike. Weyra de kay kenî. Birayo qij paweno ci ke fesal bivîno û mêşnaya sipîye nişo. La wexto xo erzeno leweyî a sipîye, mêşnaya sipî xo dana kişt û mêşnaya şîyaye yena cayî aye. Û birayo qij leweyî a şîyaye de kono. Seba ke niştî şîyaye senî ke kêna vat bi sena metre şîno war.

Birayo qij sena metre war de yewna dinya vînenî. Weyra de rastî dewêka qije yeno. Şîno bano verîn ke banî yew cinîya pîro. Pîre ey kena mêmânî xo. Birayo qij vano, dayê ti eşkena mi rê tasêk awe bîyare. Pîre vana, tamam, helna vinde nika mangaya ma mîza xo kena, ez to rê ana. Birayo qij vano, qey şîma tîya de mîza mangayan wenî. Şîma awe nêwenî. Pîre vana, nê; la na dewe de tena yew hêne esto. Û yew ejder ma rê bîyo bela. Heme awe hêneyî ew weno; tena rojanî çarşemeyan sereyî xo vejeno teber hêne ra û seba dewijan awe vera dano. Rojî çarşemeyî birayo qij kalmeyêk geno û şîno peyî hêneyî de xo nimneno. Cinî û kênayî dewe zî konî rêze. Senî ejder sereyî xo qula hêneyî ra vejeno, birayo qij zît beno û darbêk de sereyî ejderî ci perreno. Heme

gona ejderî bena mîyanî awe, cinî seba awa gonina danî pêro. Birayo qij vano, leze me-
kêrêne. Êdî her roj awe esta. Her kesî rê ve-
jena. La kes goşdarîye nêkeno. Mîyanî cinî
û kênanan de kêneyê axayî zî esta, wexto
cinîyî wina danî pêro aye destî xo dana gonê
ejderî ya û dana paçî birayî qiji ya. Wazena
nişan biko ke ey ejder kişto. Birayo qij înan
weyra de verdeno û şino keyeyî pîre. Paçî xo
vejeno û kincanî neweyan geno pira. Qet
nêvejîyeno teber û nêvano mi ejder kişto, bê
kênayê axayî û pîre kes nêzano ey ejderî
kişto. No mîyan de dewe de zaf kesî vejîyênî
û vanî mi ejder kişto. Her kes goreyê xo
çîyêk vano. Pîre rojo bîn heme camêrdanî
dewe dawet kena keyeyî xo. Nan wedîşî ra
pey pîre vana, gelî dewijan şima zanî na
dewe de yew vejîya û ejder kişt û ey ke ejder
kişt nêvejîya werte; la dewe de zaf kesî vejî-
yayî werte ke vanî mi ejder kişto. Hemeyî
zurî kenî. Înan ra yewî zî ejder nêkişto. Ey
ke ejderî kişto, mêmânî min o ke çend rojî
yo ho keyeyî min de. Û pîre şina birayî qiji
wedayo bîn ra ana. Paçî ey zî ana ke gona
ejderî ha pa. Înan mojnena dewijan. Dewijî
pê bawer kenî û birayî qiji ra vanî, ti kam î
kam kesî yî? To ma no ejder ra qedîna, ti çi
biwazî ma danî to. Vaje ti çi wazenî? Birayo
qij vano, ez şima ra çik nêwazena, tena ez
wazena ke şima mi birasnî dinya. Weda de
her kes ewnîyeno yewbînan ra. Peynî de
yew axtiyarî înan qise keno vano, lawêman na
dinya ke ti vanî ma nê diya nê zî eşnawita.
Ma qet derheq de wayirî fikrêkî niyî. Çi-
yêkna vaje ma seba to bike. Birayo qij vano,
mi rê tena dinya lazim a. Ez sebna çi nêwa-
zena. Mîyanî dewijan ra tewr extîyarî înan
vano, yew teyra zaf pile esta. Bizane, aye
zana. Bê aye kes nêzano. Her serre no
mehal de na teyre lîran vejena; la marêko
gird şino û lîranê aye weno. Eke ti ey marî
bikişî belkî teyre to rê ardim bikero.

Dewijî birayî qiji ra cayî teyre vanî. Bi-
rayo qij şino ew derûdor de xo nimneno.
Gelek wext ser de şino, pîyejnêk yeno ey. Vî-
neno ke marêko gird ho hetî dara ke teyre
ser de halînî xo viraşto, şino. Wexto mar se-
reyî xo keno derg ver bi dare birayo qij bi
darbêkî de sereyî marî ci pernenno û marî
keno wirde-wirde û erzeno verî lîranî teyre.
Û newe ra xo cayêk de nimneno. Ser de tay
wext şino ke vînenno ke veristeyêka girde
bena nêzî halînî. Fam keno ke na veristê ve-

ristêya teyre ya. Mîyanî pancanî teyre de
kerreyêka girde esta seba kiştişî marî.
Wexto durî ra ewnîyena, vînenno ke mar ho
halînî xo de. Leze dana xo, seba ke kerra
serî marî de verado û marî bikişo. La wexto
bena nêz vînenno ke mar wirde-wirde yo û
lîrî xo hê marî wenî. Fam kena ke yewî mar
kişto û ardo halîn de nayo ro. Venena vana,
şima kam ke no mar ke kişto bivejîne mey-
dan. Şima mi ra çi wazêne biwazêne. Çiyêko
ez nêeşkî bidî şima çin o. No vateyî teyre ra
pey birayo qij cayî xo ra vejîyeno û vano mi
mar kişto. Teyre ti ra vana, de vaje ey mer-
dim. Ti mi ra çi wazenî? To mi na mar ra
qedîna ez zî çi ke ti biwazî dana to, birayo
qij vano, ez çik to ra nêwazeno, tena wazeno
ke ti mi biberî dinya. Mi eşnawit ke tena ti
zana dinya ha ça de û ti eşkena mi biberî
dinya. Teyre vana, mi bi çimanî xo dinya
nêdiya, la mi zî pîlanî xo ra eşnawito ke ha
peyî hewt ezmanan de. De şo mi rê hewt
kergan û hewt dueranî awan biyare, ma
siba konî rayir. Birayo qij şino dewe, hewt
kergan û hewt dueranî awan geno. Dewijan
de helaliye keno û roja bîn şino verî teyre.
Teyre vana, ez her qatî ezmanî de fekî xo
keno a, wexto mi fekî xo kerd a kergêk û
duerêk awe bierze mi fek. Û konî rayir.
Teyre her qatî de fekî xo kena a û birayo qij
zî kergêk û duerêk awe erzeno aye fek.
Wexto êdî qatî şeşine zî qedînenî tena ez-
manî hewtin maneno, yanî ezmano peyin.
La wexto teyre ezmanî hewtin de, yanî reye
peyine fekî xo kena a, birayo qij kerge destî
xo ra finano. Lezelez ca de bi kerda xo goştî
linga xo ti ra keno û erzeno fekî teyre. Ez-
manî hewtin zî qedînenî, û dinya durî ra
asena înan ra. Peynî de teyre rasena dinya,
birayo qij ti ra yeno war. Yewbîna ra xatir
wazenî. Teyre birayî qiji ra vana, ti qey nêşî-
nîş, birayo qij vano ti hêverî şo. Teyre vana
nê ti hêverî şo. Peynî de birayo qij kono
rayir, la lengeno. Teyre binî zîwanî xo ra
goştî linga ey vejena û dusnena linga ey a.
Û ti ra vana, wexto to eşt mi fek tamî ey
cîya bi. Mi fam kerd goştî to yo û mi nê-
werd. Newe ra yewbînan ra xatir wazenî û
teyre firena û şina. Birayo qij zî rast şino
serî qulike. Vînanî ke kêna qije hema zî
ha serî qulike de û ha bermena. Şino, aye zî
geno û pîya şinî keye. Birayo qij her di bira-
yanî xo û her di kênanan kişeno. Êdî ew û
kênaya tewr rinde pîya cuyenî hetanî merg.

Têkiliyên helbest û felsefeyê

Kamran Simo HEDILÎ

Helbest û felsefe hevalên rêwîtiya di-rokê ne. Helbest jî weke felsefeyê hemû têgînan bi hev re dibêje. Lê di felsefeyê de pêşî aqil û di helbestê de hest tê. Her du jî, di noqteya giştî de li zanîna tiştan, sedem û mebestan dinihêrin.

Zenîst, beşên pişe û tiştan ji hev cuda dike û dide naskirin. Felyezof û helbestvan giştî digirin destê xwe. Bi hûrlênêrîne li sedeman dinihêrin û pirs mebestan dikin. Bi vê wekheviya wan ve, cudabûna wan jî heye. Helbest strana dil e û felsefe ya aqil e. Helbest, tevgera hestê dide destpêkirin. Felsefe, tiştan dide naskirin, ji hev cuda dike, wan tîne hemberî hev, didarizîne û digihê zanîna dawî. Helbest û felsefe du cureyên têgihîştinê yên cuda ne. Yek navê beşeke hunerî ye, ya din navê fikir-kirina bi pergal û zanista giştî ye. Helbest û felsefe bi xêzikên tûj ji hev ne cuda bin jî û gelek layên wan weke hev bin jî, du beşên cuda ne. Ev mijar, mijareke ku gelek caran tê ber çavên mirov e. Di helbestê de huner li pêş be jî, di gelek helbestên hin helbestvanan de felsefe xwe derdixe pêş. An jî huner û felsefe bi hev re di nav helbestên wan de dimeşin. Helbestvan, pirsan ji yên berî xwe dikin û bersiva yên li paş tînin didin. Afirînerê pêşerojê ne û ji mafê wan e ku rabirdûyê rexne bikin. Mirov her tiştî deyne aliyekî, helbestvan jî temaşevanên dema xwe û yên vê jiyanê ne. Temaşevan qet nebe, mafê wan heye ku leyîstika ku lê dinihêrin bicibînin an neecibînin. Dibe ku leyîstik li xweşa wan biçe an neçe. Dikarin bikin niçenîç û ofeof, an jî ji bo ku kêfxweşiya xwe nîşan bidin li ser piyan çepikan lêxin û biqêrin. An jî bo ku leyîstikvan baş neleyîstine pirsan ji wan bikin û rexneyên xwe bînin ziman. Ev rexne û dadgerî jî mafê wan e. Tê zanîn ku pirs-kirin karê feylezof e. Ew bi pirsan dixwaze bigihîje ar-

mancê. Felsefeya xwe li ser bingeha pirsan ava dike. Lê helbestvan jî, pirsan dikin û dixwazin bersiva pêşerojê bidin. Ez kê me? Ez çi dikim? Di cîhanê de cihê min çi ye? Erkê min çi ye? Ji bo çi têgihîştina me têra têgihîştina gerdûnê nake? Çima temenê mirov wisa kurt e? Di vî temenê kurt de mirov çi ji hev dixwazin? Çima di nav aştiyê de nikarin bijîn? Û weke van pirsan gelek pirsên din jî xwe dike. Li nav pirsan digere û dixwaze bersivê bibîne. Li xwe dinihêre û li civata bêxem dinihêre. Hem pirs û bersivên xwe tîne ziman û hem jî civata bêxem re dibêje: *“Ser-kaniya nexweşiyên di van pirsan de ye, hûn jî bi min re li wan bigerin.”* Carnan pirsên helbestvan nayên fêmkirin. Ji bo ku hem bi dengê bilind dipirsin û hem ser pirsên xwe dinixumînin. Heta ji wan tê bi sembolan pirsên xwe tînin ziman. Lucretius Carus jî bo tîkiliyên felsefeyê û helbestê wisa dibêje, *“Felsefe şerê Tîtan e (Ahrîmanan), helbest jî, di afirandîna de bi yezdanan re pêşbirk e.”*

Di afirandinê de tiştên ku feylezof difikire helbestvan dijî

Tiştên hunermendên mezin li jiyanê dihêlin ji dengê wan pirtir, raman, nêrîn û xweragirtina wan a li pêşberî afirandinê ye. Hin hunermend berî me, bi hezaran salan mirine û me qet dengê wan nebihîstiye. Lê em bi dilxweşî afirandînan wan dixwînin û wana di berhemên xwe de bi bîr tînin.

Helbest ne tenê di nebûnê de kombûna dengên xweş e. Di hebûna afirandinê de rêkûpêkirina raman, hest û nêrînan pêşerojê ye. Li vir nayê wê wateyê ku dibêjim felsefe ye. Lê ne dengên bêwate û vala ne ku bi tenê ji guh re xweş tînin. Berî her tiştî, armanca gotina helbestê, hişyarkirina hest û ramanên

xwendevan e. Ev bi serê xwe felsefeya perwerdê ye û ji felsefeyê ne dûr e.

Di warê afirandinê de tiştên ku feylezof difikire, helbestvan dijî. Tiştên ku helbestvan dijî feylezof di kûrahiya bîra ramanê de difikire. Feylezof, helbestvanê ku bi fikir digihê (pergalê) rêkûpêkiyê ye. Helbestvan jî, feylezofê ku bi kiryarê ji rêkûpêkiya jiyanê dibihure ye. Feylezof yê ku herî xweşik û bi pîvan difikire û fikirên xwe di nav rêkûpêkiyekê de bi cih dike ye. Lê helbestvan ê herî baş dipeyîve û afirînerê ku xweşik dibêje ye. Bi gotineke din, feylezof yekser dikeve nav mijarê û mijara xwe şirove dike.

Bi derbirîneke rasterast bi hêza xeyalê û ramanê felsefeya xwe çêdike. Feylezof jî bo gotina xwe bide pejirandin bi dehan mînak dide. Li derdora mijarê digere, dixwaze wê bide peyitandin (îspatkirin). Xwendevan li gotina feylezof dinihêrin û dixwazin bizanibin feylezof çi gotiye. Lê li ya helbestvan bê çawa gotiye dinihêrin û weke ku difikirin têdigihên.

Helbestvan, hin caran xwe berdide nav coşa herikîna hestan. Hin caran di nav kûrahiya ramanê de xwe winda dike. Bi qolincên ser û dil helbesta wan dizê û mîna teqîna volqanê ji dûr ve deng û rengê wê tê dîtîn. Cihên ku helbest dertê pêş, pirtir bizava rojane ya kesên ku civat ji wan pêk tê ye. Pesnê yezdanan, deşt, çiya, şahî, seyran, derya, keriyên ajalan, refên firindeyan, birûsk, dengên ewran, baran, berf û xunava li ser lûvên kulîlkan e. Ev ji felsefeyê pirtir bi helbestê tîn ziman. Ji van nav û sembolan re lêkolîneke dûr û dirêj divê. Ji bo bikaranîna wan di gotinan de. Bi van sembolan helbestvan xwe berdidin nav herikîna coşa bûyeran.

Li hin cihan helbest bi ramanan, xwe berdide bîra felsefeyê û di bîrê de li çirûska ku mirovahiyê rizgar bike digere. Ji bo vê yekê mirov nikare bêje ku helbest ji felsefeyê cuda ye, an jî felsefe bixwe ye. Lê mirov dikare bibêje ku du hevkarên hev ên jiyanê yên baş in.

Bi dîtina min, helbesta bê felsefe

weke mankêna (*bûkeke lastîkî*) ku di vî-tirînên reklaman de bê giyan e. Man-kêna lastîkî çiqas xweşik be jî, nabe weke mankêneke zindî. Helbest jî çiqas bi gotinên lihevhatî were avakirin û wêneyên xweşik tê de hebin jî, ku felsefeya jiyanê tê de nebe, wisa ye.

Helbestvan bi vê mebestê bi jenîna dilan re helbestê diherikînin. Li ser bas-kên ferîşteyan li welatên nenas digerin. Helbesta xwe dikin qasidê belavkirina dilxweşiyê û ew ji kaniyên nû avê vedixwin. Kulîlkên ku nû dibişki-vin bêhn dikin.

Helbestvan feylezofê hest, xeyal, xewn û ramanên xwe ye

Helbestvanên hest û ramanê, bi hostatî di nav tevna jiyanê de dihûnin digihên felsefeya helbestvaniya xwe. Fridrich Schiller dibêje, *“Aqilê min her bûyerê sembolîze dike. Dikeve riya afirandinê û ez bi tîgîn û rastî, bi prensîp û hestan, bi serekî teknikî di navbera xeyal û hêzê de dudil im...Dema dixwazim felsefeyê bifikirim, helbestvan derdikeve pêşberî min. Dema gotina helbestê pêwîst be, ramanên felyesofî dertên pêşberî min. Bi neberçavbûna hêza xeyalan astengkirina ramanên min an jî aqilsivikiya helbestvanî destdirêjkirina hestên min, bûyereke ku zû bi zû derdikeve pêşberî min e.”*

Yanî helbestvan feylezofê hest, xeyal, xewn û ramanên xwe ye. Feylezof jî, helbestvanê çiroka gerdûna ku em tê de dijîn e. Helbestvan serê xwe li ser hûnandina bûyeran diêşîne. Feylezof jî, serê xwe li ser hebûn û rewşa cihana me diêşîne. Ev her du ji destpêka mirovahiyê ve, bi hev re di riyekê de dimeşin. Li vê rêwîtiyê feylezof dipirse û bi riya pirsan dixwaze bûyerê veke û nîşan bide û li îspatkirinê digere. Helbestvan bi dengê bilind dike qîreqîr, qîrîn geh hawara serhildanê ye, geh gaziya cejn û şahiyê ye, an jî bi girî û gazincan daxwaza xwe tîne ziman. Lê karê her duyan jî felsefeya jiyanê ye.

Victor Hugo dibêje, “*felsefe mikroskopî ramanê ye.*”

Helbestvan hest û ramanê di nav hev de dihûne. Carinan hest li pêş were ditin jî, raman piştîrê tê. Helbestvan jî kûrahiya hestê û bilindiya ramanê, helbestê bi xweşikiya ziman dinivîse. Ji bo helbestvan, raman ne tiştêkî pûç û mirî ye, bi ramanê hestê tîne coşê. Wê jî kûrahiya nav xwe derdixîne, di xeyalê de li jiyana bêdûmahîk dide jiyîn. Lê mirov dikare bibêje ku di helbestê de raman bêtir hest bi tena serê xwe dîn e û hest jî, bêtir ramanê bi tena serê xwe kor e. Helbestvan raman û hestê bi bilindiya jiyane ve hişk girêdide.

Helbestvan raman û hestê jî xwe re dîkin warê jiyane û li vî warê dijîn. Ew ne sînoren dewletan, ne parzemînen cihanê, ne astengkirina ol û îdolojîyan nas dîkin. Weke Alfred de Musset dibêje, “*Welatê hunermendên mezin tune ye.*”

Helbestvanên mezin, erk û hatina mirov a herî pîroz di şikandina çembera teng û bê rûmet de dibînin. Ev çember, çî olî be, çî îdolojîkî be, çî yên sistemen heyî be, yan jî yên ku mirovahiyê li paş dihêlin bin, bi şikandina van çemberan dixwazin bigihên jiyana ku di armanca wan de ye. Bi vî şeweyî raman jî têgîneke bê giyan û mirî derdikeve û dibe amûra pêşxistina mirov û cihanê. Ji helbestvan re dibe pencereya kaniya nêrîna li jiyane.

Helbest ne tenê hest e, bi hestê re têgîna ramanê ye jî. Armanca helbestvan a yekemîn ew e ku bi têgîna xwe re vî jiyane bigihîne civatê. Dixwaze mirovan jî jiyana teng û awirkurt rizgar bike. Wan bigihîne jiyaneke zana û hê xweştir. Schiller dibêje, “*Mirovên azad dirûvên Yezdanan didin û mirovên ku nefsa xwe kuştine azad dibin.*”

Mirovên bi rastî azad ew mirov in ku, ji dilîtiya nefsa xwe rizgar dibin û di riya aqil de dimeşin in. Helbestvan dixwazin vî bêrikirina ku xwe li wan û giyanê wan pêçayî di dilê her kesên ku lê guhdar dîkin an dixwînin de biafirînin û

wan bi daxwaza vî jiyana bilind bînin coşê. Helbestvan jî bo ku bikaribin vî armanca mezin û pîroz bi her kesên ku dibihîzin bide bihistin, nîşanî her çavên ku dibînin bikin, hêza hest û ramanên xwe bi kar tînin. Hest û ramanên xwe bi riya helbestê dertînin derve û digihînin xwendevanan.

Helbestvan bi vî mebestê dixwazin ku ramanên xwe bigihînin civatê û hestên xwe bigihînin xwendevanan, da ku hestên wan jî bilivînin. Bala wan bikişînin ser peyama ku dixwazin bidin û ew peyama ku li ser baskên helbesta xwe dinivîsin, dixwazin diyarî civatê bikin. Helbestvan amûrên hunerî dipelînin û derbirînen xwe li wan amûran siwar dîkin. Ji ber ku bi tenê ev amûr dikarin hestên civatê şiyar bikin û wan bînin meydana peyama ku helbestvan pê hestdar in. Helbestvan hestên xwe nas dîkin, bi hestan re didin û distînin. Bi tevna hunerî van hestan dihûnin û bi zîmanê ku tevde wêneyên hunerî ne, derdixin ber çavên xwendevanên xwe.

Helbestvan, helbestê jî xwe re dîkin pencereya ku ji ber xwe jî we re vedibe. Li ber pencereyê rûdinên, dinihêrin, stranan distrên, diqîrin, digirîn û dike-nin. Deng, hest û ramanên xwe dîkin nav tirs û şadiyên çaxên xwe. Dizanin ku ji pencereyê û wê de yek dê li we guhdar bike. Dibe ev yek paşî pêncsed salî bibe. Lê tiştê xweş ew e ku dema helbestvan dibêje, “ez jî heme, an ez jî hebûm” û zanibe vî bibêje. Ji derveyî vî riyê, rîyeke din ku karibe bibêje, ez heme an ez jî hebûm, nîn e.

Ev rêzika helbesta Yannîs Rîtsos her tiştî eşkere dibêje. “*Ji helbest, evîn û mirînê bawer dikim, ji ber vî yeke jî bêmîrînê jî bawer dikim. Rêzikê dinivîsim, cihanê dinivîsim, ez heme, dinya heye, dibêjim...*”

Helbestvan, bi nivîsandina helbestê digihê sadetiya jiyane. Ji xêzika rojê derdikeve û henasa dema xwe hîs dike. Bi helbestê jî xemgînî û janên xwe rizgar dibe û digihê şadiye.

Rondikên qerisî

Mistefa TÛNCYUZLU

Berf dibariya, bayê dîn û har bûyî berfîn dida ber xwe, hûrhûrî û belav dikir. Bayê sar û seqem girtibû nava xwe; xwe li wan dipêça û ew ji halekî dixistin halekî din. Ba û berf bûbûn yek û ew bi erda berfbeleki re kiribûn yek. Berfinên hûrbûyî bi bayê re dibûn yek, dibûn mîna xencerên devbirekî. Û li ser û çavên wan diketin. Hemû bi rengên xwe yê ji berfê girtî ve bi şevê re bûbûn yek. Bayê xwewindakirî her ku diçû diwartir dibû, li nava çavên wan diket, bijangên wan ji çavan re nobedarî dikirin. Li hev dida, ew didan girtin û sîbera reş çêdikirin di şeva spî de li ber çavên wan.

Çavên Ceng ên hûrik tijî bûbûn; li hember êş û azarên emrê ciwan ku bi coş û şadi bihuribû, li ber herikandinê bûn. Destek di kurikê de, destê din jî li ser sîleha BKS'yê tevizibû. Destê wî yê çepê li ser sîlehê bi zincîra fişekan re bûbû yek; kurika şalwar û tîna canê wî jî destê din jî tevizandinê xilas nekiribû. Berfa sar sîleh girtibû û bi rengê xwe yê reş ve bûbû reşbelek. Bayê bi hemû diywariya xwe, li nav rûyê wî dida; hinarikên sorbûyî û terikî hê bêtir sor dikirin. Terkên wan diqelişand û kûrtir dikir. Her cara ku serê xwe radikir, jî bo li pêş xwe binihêre bayê, xwe li rûyê wî yê esmer dida û dibû xwê jî terkên hinarik û lêvên çilmisokî re.

Ceng aciz bûbû; jî ber tevizandina destên xwe nikaribû dest biavêta doxîna xwe û destava xwe bike. Xirûra wî jî li ber riyeke din jî dibû asteng. Her cara ku li Rizgar dinihêrî agir bi hinava wî diket; axîn û keserên kûr dikişand û di ber xwe de digot "Ez ji Rizgar re bibêjim bila alikariya min bike. Ma alikariya min bike dê dinya xera bibe?" Di heman demê de poşman dibû û daxwaza şikestinbar di qirika ziwa de dadiqurtand kezêbê. Di navbera daxwaza alikariya Rizgar û xirûra li pêş wî dibû asteng de diçû û dihat. Mîna mabe di nava dewisandinekê de, bêhn lê diçikiya. Yek, dudu, sisê xwest deng li Rizgar bike. Lê fikir ne-

dikir peyv jî qirika ziwa dernediketin. Her cara ku zor dida xwe, peyvên janbar jî qirikê dernediketin, dibûn kêreke ko. Û qirika ziwa diqelişandin

Ba û berf, sar û seqem û tevizandina destên wî, tîbûn û birçibûn, bêxewî û westî jî bîra wî biribûn. Ji derveyî xwrehetkirinê tu tiştê dinê nedihatîn hişê wî. Êşa şevan bûbû gerînekek û ew di nav xwe de digerland û dikişand kûrahiya xwe. Ji ber êşa nerihetiyê nikaribû xwe pê bide hiskirin. Meş, şev, xwîn, xwêdana li ser can cemidî û mirin jî jî bîra wî çûbûn. Ceng ketibû halekî ne hal. Fîşekek biteqiya dest û tiliyên wî nedigirtin ku pêl têtikê bike. Tili bi destan ve, dest bi tiving û can ve bûbû yek perçe. Melevaniya di nava hestên neçariyê de bêhna wî çikandibû. Bêhna tengbûyî mîna dûmana sobeya darê berûyan di firnikên pozê wî de derdiket û li ber bayê belav dibû.

Şev dirêj, meş dirêj, ba û berf ne yên sekinandinê; êş û azarên şeva spî ne yên qedînê bûn.

Ceng bi dengêkî melûl û şikestî, mîna nexwaze yê bang lê dike banga wî bibihîze, got "Hevalê Rizgar" û ma sekinî. Di ber xwe de got "Xwezî nebihîstibe". Hê Ceng bi xwe re diaxivî, Rizgar lê zivirî û got: "Ha hevalê Ceng"

Ceng kûr kûr li Rizgar nihêrî û xwest çavên wî bibîne. Lê çavên Rizgar jî kefi û bijangên nîvgirtî xwe nedidan dest. Westîna Rizgar û jihalketina wî xwe jî pêçandina wî dida dest. Birûyên wî jî jî berfê reşbelek bûbûn. Berfa li ser birûyan jî bo Ceng bes bû. Ceng sekinî sekinî û bi carekê re mîna tiştêkî nû hatibe bîra wî, bi dengê xwe yê qels û şikestî got

-Hevalê Rizgar ma em ê kîngê navberê bidinê? Ez pir westiyame êdî dest û tiliyên min nagirin

Rizgar çavên xwe vekirin û xwest li Ceng binihêre. Çawa bijangên xwe vekir

çend kuliyên berfê mîna ji ser çiqlên daran biweşin ji ser birûyan weşiyên û bi teyisîna çavan re bûn yek. Rizgar bi dengêkî tijî jan got

-Hinekî din sebir bike Heval. Em xwe bigihînin dolê em ê rawestin û berê xwe zivirand.

Ceng şerm kiribû ku bibêje “Ez aciz bûme, destên min nagirin ku ez destava xwe bikim” Şerma wî rûyê wî yê sorbûyî hê bêtir sor dikir. Cemidandina destên wî axîn û nalinên Xelatê, qêrîn û xeberên Hogir ên di bin naylon de, li ser darbestê û li ser pişta hêstirê nedibihîstin. Êş û kulên Xelat û Hogir ku her cara dibihîst agir bi hinava wî diket. Jê re xerîb bûbû. Û tu bandor êdî lê nedikirin. Xelatê xwe berdabû nava nermahiya xwe ya jiyane û tu deng nedibihîst. Hogir jî her cara ku hêstir diterpili pê re jî lingê wî yên nivqutbûyî dihejiya. Jana wî kûrtir dibû. Dest bi xeberan dikir; ne dê, ne bav, ne jin, ne bira û ne jî xwişk dihişt.

Çavên Ceng ên bi kûr de çûyî li ber fûrandinê bû. Dema aciz bû xwe şidand. Bi şidandinê re du rondikên gir, ji nav bibi-

kên wî dest bi herikîna kiribûn. Her du rondikên mîna du gulokên berfê, her ku digindirîn girantir dibûn; dewsa xwe çêdikirin û di terkên tê de diherikîn didan teyisandin. Sar û seqemê her du rondikên tijî êş û azar cemidandibûn, ew kiribûn du dilopên qeşayê. Ji binê hinarikan heta bi çavên di kûrahiya xwe de winda bûbûn ji qeşaya xwe nexşê terkan çêkiribû. Rondik bi nexşê terkên qeşayî, bi birû û bijangên ji berfê şilbûyî de dityisî, Ceng bi sîleha xwe ya giran (12.5 kilo) ku bûbû parçeyek ji canê wî û bi êşa du rondikên li ser rûyê wî qerisî ve xwe gihand newalê. Bi gihîştinê re berfa cihekî rast paqij kirin, dema erda reş aşkera bû, çend mîtro naylon mîna konekî biçûk li ser axa reş vedan. Her du birîndar tevî darbestên wan danîn. Ji her du yên din re jî ji çiloyê ter nivîn çêkirin. Çawa bi-cihkirina birîndaran qediya Ceng bi cilên xwe yên şil ve xwe li ser berfê dirêj kir, çavên nivgirtî girt; xwe berda nav xewn û xeyalên germ. Êdî berfê ew nedicemidand. Berf jê re bûbû nivîneke germ û xwe bê întizar berdabû nava wê.



De rabe

Omer FÎDAN

Bêxewiyeke kor im ku
Di xewan de nahewim
Tirsa birçîbûnê me
Nema ji çavên Te têr dixwim
Kulîlkeke çiyayî me
Bi rondikên xwe xwe av didim
Her ku bêriya te dikim mezintir dibim
Bêhna jînê ji axa min tê
Bêhna mirinê tê
Ji dûrbûna ji Te
De bes e lo!
Çi tu diçilmisî
Rabe de lo!
Şiyar bibe ji vê bêxewiya giran
Rabe dîlo!
Dengê xwe bi ser taristanê xe
Rabe dilo!
Helbestan bixwîne
Kilaman bibêje
Ji biharê re
Ji şefaqê re
Ji jiyanê re
Ji Wê re

Belê
Dem ew dem e!
Ku mirov şevê têke xewê
Bibe hevalê bayê
Bimeşe ber bi stêran
Rûnê li diwana stranan
Ezmanan bine xwarê
Zeryayan derxe qeraxan
Çiyayan raxe li deştan
Bike heval neyaran
Bîne nik hev her duyan
Li hev werîne roj û stêran
Ji wan re bibêje lorîkan
Destûrê nede rondikan
Xunava ewran biguvêşe
Ber bi Wê bimeşe
De rabe!
Felek oxir e



Ahmet BİLGE